

# NÛDEM

No 17 1996



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

# NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

\*

Xwedî û berpirsiyarê giştî

*Chief Editor*

## Firat Cewerî

\*

Hejmar 17, Sal: 5

Bihar: 1996

\*

Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 190 Sek

Welatên din: 50 \$

Institution 260 Sek

\*

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

\*

Wêneya bergê: Karani Jamil

\*

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

\*

NÛDEM kovareke ser-  
bixwe û Kurdistanî ye,  
ferqiyetê naxe navbera  
nêrîn û îdeolojiyên kur-  
dan, ji dijminatîya kes û  
rêxistinan dûr e, rûpe-  
lên wê ji hemû nivîska-  
rên kurd re vekirî ne.

Adres:

Termov. 52 2tr.

175 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

# NAVEROK

- 4 ŞÎRA KURDÎ ♦ **Firat Cewerî**
- 6 HEREKOL ♦ **Arjen Arî**
- 7 ŞÎRA KURDÎ LI YEKÎTIYA SOVYETÊ ♦ **Tosinê Reşîd**
- 10 HELBESTA KURDÎ LI SÛRIYÊ ♦ **Heyderê Omer**
- 16 BEHDÎNA HÊLÎNA HELBESTA KURDÎ YE ♦ **Mehfûz mayî**
- 22 GOTIN Û PEYIVÎNA BEDEW, ŞÎR ♦ **Rojen Barnas**
- 27 HELBEST ÇI YE, HELBESTVAN KÎ YE? ♦ **A. Balî**
- 30 KEÇIK ♦ **N. Hikmet** Wergêr: **B. Epözdemir**
- 31 SÊ STÊRÊN GEŞ ♦ **Xelîl Duhokî**
- 36 TU ÇAWA YÎ ♦ **Î. Omerî**
- 37 HELBEST Û HELBESTVAN ♦ **Can Gülşenoğlu**
- 40 MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVÎSÎNE ♦ **Mayakovskî**  
Wergêr: **Suleyman Demir**
- 60 HEVPEYVÎN BI **Şêrko Bâkes** re
- 71 HEVPEYVÎN BI **Kemal Burkay** re
- 76 SÎNORÊ GIRTÎ ♦ **Haviz Qazî**
- 78 METODEDEKE ZANYARÎ YA EDEBIYATÊ **Şerefxan Cizîrî**
- 83 AVAKIRÊ KURDISH ROCK **Ciwan Haco**
- 87 LI AZADIYÊ BIGERE ♦ **Sharock Kamyab**
- 87 WERGER Û WERGERVANÎ ♦ **Derwêş M. Ferho**
- 92 DU HELBEST JI **Alî Biçer** Wergêr: **M. Uzun**
- 94 TIRS ♦ **Kekê Xêlit**
- 98 HÊ DÊRSIM ♦ **H. Sefkan**
- 100 YILMAZ GÜNEY II ♦ **Mihemed Dehsiwar**
- 110 CÎHANA YÊ MEKSÎKÎ ♦ **Şefik Kaya**
- 113 CÎHANA WEŞANAN

# Şiîra Kurdî



**Firat Cewerî**

Rola şairan li hin welatan mîna rola Rêxemberan e. Gotinên wan yên bi mane, bi tesîr in; carinan mîna bombeyan diteqin. Şiîrên wan carinan miletan radikin ser lîngan, serkêş in, dûrbîn in. Ew carinan mîstîk in, filozofane ne. Carinan jî kindir di stûyên wan de ne û laşên wan yên pak di sêpiyên serdestan de dihejin.

Erê, şair di her deman de di navenda edebiyata bedew de ne. Îro, li gelek welatan hêkelên şairan ji yên siyasetvan û qiralan bêtir in. Ew li gelek welatan jî wan bi qîmettir in. Li gelek welatan jî ew jî edebitavanên şaxên edebiyatê yên din bêtir di navenda edebiyatê de ne. Herçiqas îro li Ewrûpayê şîr hindik were xwendin jî, dîsan qîmeta şîrê bilind e, mirov mîna di-

yariyên herî bi qîmet pirtûkên şîran jî hevdu re diyarî dikin. Lê li rohilat û li gelek welatên Emerîka Latînî şîr hê jî jîndar e, hê jî germahiya xwe diparêze. Dibe ku jî ev ji tradisyona şîrê ya xurt tê. Li gorî *Kjell A. Johanssonê* swêdî, di sedsala 19'an de li hin welatên Emerîka Latînî, şair belaş li otobusan siwar dibûn, xelkê jî qîmetekî bêhempa dida wan.

Di civata kurdan de jî şîr xwediyê cihekî taybetî ye. Digel ku kurd di dîroka nêzik de nebûne dewlet, nebûne xwediyên sazgeh û mueseseyên neteweyî, dîsan jî şîra kurdî bûye navgîna jiyandina ziman û edebiyata kurdî. Ew jî nivşan gihîştîye nivşan û îro di jiyana kurdan ya siyasî û întelektuelî de bûne navend. Herçiqas em kurd zêde li ser berhem û afirandinên şairên kurd yên klasîk ranawestî jî, li gorî lêkolîner û zanayên xelkê ew ne bi tenê şair, lê filozof bûn jî. Em jî ji vê bi rê ketin, me perçebûna Kurdistanê ji li ber çavan girt û me xwest em di vê hejmarê de hem tevger û rewşa şîra kurdî ya li

Sovyeta kevin, ya li Sûriyê, ya li başûr û bakurê Kurdistanê nas bikin, hem jî ji rewşa şîra kurdî ya îro haydar bibin. Ji ber perçebûna welêt û bikaranîna alfabe-yên cihê, îmkanên me çênebûne ku em bigihîjin xebatên hevdu yê nîntelektuelî. Mîna tê zanîn, di dema Sovyeta kevin de, digel zilm û zora li ser kurdan û kêmasiyên rêzimanî, dîsan kurdên kevnesovyetê jî bo avakirina edebiyata kurdî û vejandina zimanê kurdî xebatên baş kirine. *Tosinê Reşîd*, demên cûda yê nîntelektuelî radixe ber çavan; jarî, sloganî, nûyîtî û guhertinên şîra kevnesovyetê bi me dide naskirin.

Ji ber tesîrên derketina **Hawarê** li Sûriyê, kurdên Sûriyê li gorî taqet û îmkanên xwe bi ziman û edebiyata kurdî dadikevin û berhemên xwe jî bi kurdiya latînî dinivîsînin. Di van demên dawî de bi dehan berhemên edebî li Sûriyê derketine. Di nava van berheman de şîr cihekî mezin digire. *Heyderê Omer* ku bi xwe li Sûriyê dimîne, li ser rewşa şîra kurdî ya li Sûriyê rawestiyaye, biserketin û kêmasiyên şîra kurdî ya li Sûriyê tîne ziman û mînakan jî şairên kurd pêşkêş dike. *Can Gülsenoglu* di nivîsa xwe de bi awireke rexnegirî nêzikî şîra kurdî ya îro dibe û şîreke hê xurttir dixwaze.

Herçiqas li nav kurmancên başûr nesîr bi pêş neketibe jî, gelek şîr hatine nivîsandin û zimanê kurdî di şîrê de jîndar maye. *Mehfûz Mayî* şîra Behdînan ji despêka sedsala 19'an ve digire û şairan bi kronolojîkî radixe. *Rojen Barnas* "bedewiya şîrê" bi bedewiya "gotinê" ve girê dide.

Ev demek e li ser şîra kurdî têtê munaqesekirin. Şîra kurdî çi ye? Li ku ye? Şairê kurd kî ye? Şîra ku ji aliyê kurdan ve bi zimanin din tîne nivîsandin dikare bibe şîra kurdî? Taybetiyên şîra kurdî çi ne? Ji bo zelalkirina van pirsgerêkan, me serî li nêrîn û ramanên hin şairên kurd dan. *A. Balî* ku bi xwe hin antolojiyên şîra kurdî amade kirine, di nivîsa xwe de, dixwaze girrikiya li ser şîra kurdî zelal bike. Xelatgirê xelata Toxoloskî, kevnewezîrê çandê *Şêrko Bêkes* di hevpeyvîna xwe de pêvajoyên şîra kurdî, têkiliyên şîr û siyasetê, şîra milîtan û taybetiyên şîra kurdî tîne ziman. Herweha *Kemal Burkay* ku zêdeyî nivê jiyana xwe daye siyasetê û herweha qet jî şîrê qut nebûye, bûye mêvanê me yê vê hejmarê. Siyasetvanekî profesyonel çawa dikare şairiyeke profesyonel bike, cûdahiyên şairiya lîderekî ji yê nîntelektuelî din çi ne? *Kemal Burkay* digel pîr pîrsgerêkên din, têkiliyên siyaset û edebiyatê jî zelal dike.

*Ferhad Shakely* jî mêvanê me yê vê hejmarê bû, lê ji ber pirsin teknîkî hevpeyvîna bi wî re negihîşte ser vê hejmarê. Em ê nêrînen wî yê nîntelektuelî di hejmara bê de biweşînin.

Bi hêviya şîreke kurdî ya xurt, ez Newroza we pîroz dikim! ✍

## HEREKOL

Arjen Arî

li dengê nalan min dikir guhdarî  
bin min re diçûn bi tîr û kevan peya, suwarî  
ji artêşa talankeran bûn  
bi dû qeranan de hêzên çekdarî

Şahîşah bûn, Siltan bûn,  
di alên wan de teyrên nikilxwîn  
şêrên devhêtûn di alên wan de  
di bin min re diçûn  
bi xerc û bêş fermanên tacîdarî

min serî netewand li ber rîman tu carî  
bi ar-atara rohnî  
parastî bi mertalên Medî  
Naram-Sîn min dî  
Sargon  
û Îskender...  
û di tahtan de navek kolayî  
yekî Ecem bû Darayê dîlber!

di şop û şivîlên sedsalan re, di çîyan re wer,  
mîna teyrekî baz bajen, mîna ber  
di ber Gebarî re her  
û Cûdî bibîn, dûra li min biner;

Herekol im ez, ez Herekol im!  
li jor im,  
eniya xwe rak, hîn jî li jor im!  
li ser axekê -ku îro bindest-  
ji do ve kefteleft;  
îro pîkol im...

# Şiîra kurdî li Yekîtiya Sovyetê

**B**i baweriya min em hê jî nikarin şîra kurdî bi giştî mîna kategoriyeke edebiyatnasiyê bibînin. Ez hela di derheqa şîrên bi kurmanciya jêrîn, zazakî û hewramî de nabêjim, gotina min tenê di derheqa şîra bi kurmanciya jorîn de ye.


Divê em tu caran ji bîra nekin, ku nivîskarên me jî wek welatê me perçekirî ne û pêwendiyên di navbera wan de berê qet tune bûn, niha jî ne wek xwestina rojê ne.

Ji alîkî din ve, em bixwazin-nexwazin, divê em li xwe mukur bîn, ku edebiyata kurdî ya îroyîn têra xwestinên edebiyathezên ku edebiyata cîhanê dixwînin, nake.

Vê carê ew valahiya heyî em berî gişkî bi edebiyata gelên serdestên kurdan tijî dikin. Em pirr caran edebiyata cîhanê jî bi wan zimanan nas dikin.

Ji ber vê jî her yek ji me bi çand û edebiyata mêtropolên xwe ve girêdayîye û em di bin bandûra ziman, edebiyat û çanda mêtropolên xwe de ne. Ev bandûra ji hasêgehên heyî ya sereke ye, ku nahêle em ber bi şîra kurdî ya giştî herin.

Gelek nivîskarên me bi zimanên tirkî, erebî, farisî, ermenî, rûsî û zimanên mayîn dest bi afirandinê kirine, êdî ji me re ronî dibe, ku ew nivîskar, wisan zû bi zû nikarin ji bandûra ziman û edebiyata gelên serdest rizgar bibin. Bi vê re tevayî em îro xwesteka nêzîkbûnê di navbera nivîskarên



Tosinê Reşîd

me de dibînin. Kovar û rojnamên ku rûpelên xwe ji nivîskarên hemû perçên welêt re vekirine, wê nêzîkbûnê bi lez dêxin. Bi saya wan kovar û rojnaman, bi saya peywendiyên ku roj bi roj xurt dibin, em ber bi edebiyata kudî ya giştî diçin. Lê ji bo gihîştina wê armanca pîroz, hê jî riyeke dirêj li pêş me ye.

Em niha werin ser edebiyata kurdên Yekîtiya Sovyeta berê. Edebiyata kurdî li wê derê, ji salên 30-î dest pê dibe û mirov dikare bêje, ku ew yek bi biryar, bi xwestina partiya komunîst û karbidestên dewletê pêkhat. Bi baweriya serokên hîngê eger gel heye, ziman heye, divê bi wî zimanê edebiyat jî hebe. Bi vê xwestina qenc binaxa edebiyata kurdî li Yekîtiya Sovyetê, hê rast li Ermenîstanê hat danîn.

Destpêka edebiyata kurdî li Yekîtiya Sovyetê wisa jî bi çapkirina rojnama *Rîya Teze* re tê girêdan, ku ji adara sala 1930-î li Erêvanê çap dibû. Hema li rûpelên wê rojnama kurdî nivîskarên me berhemên xwe yê yekemîn belav dikirin, bi xêra rojnamê jî xwe re mirovên xwendevan peyda kirin.

Lê di nav kurdên wê demê de, xwende kê mîn, xwendeyên heyî jî bêtirî wan di cenga cîhanê ya yekemîn de, dê û bavên xwe winda kiribûn û di sêwîxana de mezin bibûn. Jiber vê jî kurdiya wan kê mîn û lawaz bû, zimanê wan şikestî bû. Wekî şîra kurdî li Yekîtiya Sovyetê di destpêka xwe de tam di bin bandûra ziman û edebiyata ermeniyan de bû. Bi kurdiyeke seqet û herneremendiyeke nizim bû. Pîr caran mirov bawer dike ku şîrên wan salan ji zimanên biyanî dihatin wergerandin.

Wan salan *Hacıyê Cindî*, *Emînê Evdal*, *Casimê Celîl*, *Ahmedê Mîrazî*, *Wezîrê Naderî*, *Qaçaxê Mirad* û çendekên mayîn ber-

hemên xwe yê şairiyê çap dikirin.

Şîra kurdên Yekîtiya Sovyetê ya salên 1930-î, 40-î û nîveka salên 50-î ya yekemîn kê mîn tiştên hêja li pey xwe hiştin. Ew tiştên hinekî baş jî, yan ji folklorê hildabûn, yan jî mîna folklorê nivîstî bûn. Berhemên şairên me yê wan salan bi pirranî pesnê sistema sosyalîzmê, welatê Sovyetê, partiya komunîst û serokên wê yê mezin û biçûk bû; pesnê kolxozan û jîna "şa û bextewer" bû. Ew edebiyat bi giştî ji pirsên netewî, ji derd û kulên rojane û hesînên zêndî dūr bû. Tu peywendiyên edebiyata kurdên Sovyetê ya wan salan bi edebiyata kurdî ya welat re tunebû û nikarîbû hebûya jî. Ji bo ku *Hacıyê Cindî* jî xwediyê **Hawarê**, *Celadet Bedirxan* re nameyek nivîsandibû, ew avêtin zîndanê.

Nîveka salên 50-î ya duyemîn, piştî mirina *Stalîn*, zilm û zora dîktatoriyê hinekî sivik bû, tîrsa ku seraser welat hingavtî bû, hinekî kê mîn bû, bêhna xelkê hate ber wan. Girtiyên siyasî hatin berdan, nivîskar û hernermendên ku hatibûn girtin û kuştin, hatin efû kirin.

Li welêt guhartinên mezin dibûn, wan guhartinan bandûra xwe li ser jiyan û çanda kurdên Sovyetê jî hişt. Radyoya Erêvanê dest bi programên kurdî kir, ji nû ve dest bi çapkirina rojnama *Rîya Teze* û pirtûkên bi zimanê kurdî bû.

Wî bayê xweşiyê guhaztin kirine nav şîra kurdî jî. Celebên şîrên nû hatin nav edebiyata kurdî. Şairên kurdan xwestin şîra kurdî jî pesin û gotinên vala rizgar bikin û derd û kulên mirovan, hîsên wan yê zindî bikin naveroka berhemên xwe.

Hinek ji wan şairan ev bûn: *Usivê Beko*, *Mîkayêlê Reşîd*, *Simoyê Şemo*, *Sehîdê Îbo*, *Ferîkê Usif*, *Şkoyê Hesên* û *Karlênê Çaçan*.

Salên 60-î *Şerefê Esir, Rizaliyê Reşîd, Ezîzê Îsko, Cerdoyê Esed, Eskerê Boyîk û Tosinê Reşît* jî gihîştne destê şairên jorgotî. Di wan salan de şairên mîna *Emînê Evdal, Casimê Celîl, Qaçaxê Mirad û Eliyê Evdilrehman* jî ku berî hingê peşan dinivîsîn dest bi nivîsandina şîran kirin. Dawiya salên 70-ê *Çerkezê Reş, Ezîzê Gerdenzer û Kodra Mad* ketine nav refê şairên kurdên Sovyetê. Di salên cihê de *Mîroyê Esed, Semend Siyabendov û Xelîl Mûradov* jî berhemên xwe yê şairiyê çap kirin, lê wan nivîsandina şîran ji xwe re nekirin karê herdemî.

Çawa ji bo jiyana kurdên Yekîtiya Sovyetê bi giştî, wisa jî bi ew edebiyatê bi taybetî sala 1963-an dewraneke nû dest pê dîke. Havîna sala 1963-an, gava rejîma Îraqê li dijî gelê kurd dest bi şerekî giran kir, Yekîtiya Sovyetê bi şeweyekî vekirî piştgiriya şoreşa Kurdistana başûr kir. Radyo, televîzyon, kovar û rojnaman bi dilgermî di derheqê kurdan de nivîsîn. Perda hesinî ku berî hingê di navbera me û Kurdistanê de bû, hinekî hat bilind kirin. Xwendekarên kurd li Erêvanê komela xwe ava kirin. Komelê berê bi dizî, lê paşê bi şewekî vekirî karê xwe dikir. Kurdên Sovyetê bi dîrok, edebiyat û çanda kurdî re dikire nas, di nav gel de hesinên welatperwariyê hişyar dikirin, baweriya yekîtiya gelê kurd derdixiste holê. Ev tiştêkî nû û girîng bû, ji ber ku li gor propoganda fermî û baweriya pîrriyê "ronakbîrên" me yê tirsîyayî, kurdên Sovyetê û kurdên "welatê dereke" hema hema wek du gelên cihê dihatin dîtin. Wan salan wêneyên *Barzanî* û şorişvanên mayîn di malên kurdan de diyar bûn, bi saya komela xwendekaran şîrên *Cegerxwîn* di nav xelkê de belav bûn.

Kurdnasiya Yekîtiya Sovyetê xwe girt,

çend pirtûkên hêja li ser dîrok û edebiyata kurdî çap bûn. Herçiqas ew bi zimanê rûsî bûn jî, em cara yekemîn bi berhemên klasîkên xwe, *Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Xarîs Bîlîsî* û mayîn re bûne nas.


Vê hişyarbûnê hîsên netewî xurttir kir, wisa jî li ser edebiyata kurdî bandûra xwe ya baş hiştin. Têma kurdî û Kurdistanê di nav edebiyata me de bi merdane ciyê xwe girt. Vê temayê valahiya ku di edebiyata kurdî de hebû, tijî kir, jîneke nû da edebiyata kurdî. Eger berî hingê şîra kurdî pesnê jiyana "şa û bextewar" bû, mîna welatekî tikû tenê, pesnê Yekîtiya Sovyetê bû; vê carê efrandinên xerîbiyê derketin holê, hisreta welatê bav û kalan, hisreta Kurdistanê şûna xwe ya hêja di edebiyata kurdî de girt.

Van salan di hêla hostatiya hunermendiyê û teherê nivîsandinê de jî guhastin bûn, şairên me xwestin ji bandûra edebiyata ermeniyan û rûsan rizgar bibin, xwestin ji bo ku xwe ronî bikin, qet nebe di çarçeva edebiyata kurdên Sovyetê de, şîra kurdî nas bikin. *Qaçaxê Mirad, Fêrikê Usîf, Şikoyê Hesên* ber bi şîra klasîk çûn, xwestin ser wê binax bibin. *Mîkayêlê Reşîd* xwest form û ramanên şîra Ewrûpî bîne nav edebiyata kurdî û pîr tişt ji wî re li hev hat. Hinek şairan xwestin koka xwe ya destpêkê di folklorê me ya dewlemend de bibînin. Şîra nûjen ya azad bi dijwarî, lê cihê xwe di nav edebiyata me de girt.

Şairên me yê wan salan bi giştî xwestin bandûra edebiyata biyanî ji ser xwe kêmbikin û bêtir nêzikî edebiyata kurdî bibin. Tiştêkî şabûnê jî ew bû, ku her yek bi riya xwe de çû, her yekî xwest dengê xwe bibînin. Ji çend şairên me yê baş re ew yek li hev hat. ■



# Helbesta kurdî li Sûriyê



Heyderê Omer

Şêrko Bêkes di penava helbesta kurdî de, bejneke bilind Şe. Ew hê jî li ezmanê helbestê bilind dibe. Peyv li ber destên wî stûxwar e, bendewara wî ye ku di hevokê de cih bigere û wêneyekî helbestî yê qeşeng pêk bîne, da hestê wî yê mirovatî (insanî), yê nermik û tenik hilgire. Tu helbestê dixwînî, tevî ku belkî wî nav li bin tunebe jî, tu dizanî ku ew helbest perçek ji wî ye. Ji ber ku Şêrko tenêtiyeke bê hevling û taybetiyeke derbirina wêneyan û avakirinê heye. Peyvan bi jîrbûnî ji wateyên xwe re dibijêre û dûrtirîn û kûrtirîn goşeyên derûna mirovatîyê bi jêhatî ronî dîke. Ji bo van pêkarînan, em dikarin peyv û wêneyên wî bi “Şêrkoyî” yê bi nav bikin.

Em di vê gotarê de bizav nakin têkevin cîhana wî ya helbestî, ya ku rewabêjiyeke ciwan, li gel dengêkî şîrîn û stiraneke şîn tê de hene; ya ku xem û kovanên mirovatîyê tê de hene, ya ku çelengiya kenê zaroktiyê tê de heye, ya ku bîna gulên ji bin xaliya gewdên hatine sotin, bilind dibin, jê tê, ya ku hêza jiyana ji gorên tevan dipijiqe, jê tê û tê. Em bizav nakin têkevin vê cîhana wî. Lê em dixwazin goşeyê ku hevpeyvîneke li gel Şêrko, tarî biribû ser, ronî bikin.

Di hevpeyvîneke li gel Şêrko Bêkes, ku Brahîm Yûsif pê re di hejmara 418'an, ya kovara Kiwêtî El'erebî, 1993, de

kiribû, gelek zor û sitem çûbû ser helbest û helbestvanên kurd li Sûriyê. Mebesta me jî, ji vê gotarê ew e, ku em bikaribin hinek ronahî bidin ser vê helbesta kurdî li Sûriyê, da em bikaribin hêza wê sitemê piçekî bidin alî.

Gava Ş. Bêkes bersiva pirsra ku nêrîna wî li ser helbesta kurdî ya nû, li Sûriyê çiyê, dibêje: “*Em dibêjin helbesta kurdî, ya bi zimanê erebî hatiye nivîsandin. Ev jî rastiyeke ku rev jê nabe*”. Û ti tiştê dîtir, ku penava helbesta kurdî li Sûriyê jê mişt bûye, çî helbestên ku di kovarên wek Gelawêj, Zanîn, Stêr, Aso, Pirs, û Xunav, yên ku bi zimanê kurdî têne weşandin û çî jî berhevokên helbestî yên ku rûyên pirtûkxanan pê xemilîne, nayîne holê.

Helbesta kurdî, ya bi zimanê kurdî li Sûriyê hatiye nivîsandin, ne keça îro ye, jidayikbûna wê digihîje destpêkên vê çerxa bîstan. Gava hin nav û dengên helbestî, li Qamîşloyê, Kobanê, Efrînê, Helebê û Şamê bilind bûn û herdu kovarên Hawar û Ronahî ji sihiyên vî çerxê bîstan de ew nav hembêz kirin, rûpelên xwe bi afirandinê wan xemilandin û dewlemend kirin.

“Hawarê” helbestvanek pêşkêşî kurdan kiribû, ger helbestên wî di destên helbestvanên îro de peyda bibana, helbesta kurdî wê karîba, di bin bandûra wî de pêşveçûneke berçav bidîta. Ew helbestvan jî Qedîrî Can e ku şopa xwe bi dîwaneke xweser kûr nekiriye. Qedîrî Can ji yekemînên ku di bendên helbesta kevneşopî gihîştibûn, têtê jimartin û zanîbû ev cure rist hêza xwe di de ser helbestvan û wî bêgav dike da hêrsê xwe li gor çarçeweke hunerî sert rêxe. Çimkê pêşengên helbesta kurdî ya nûjen, li gel

wî, ji salên sihî de numa bûn. Lê mixabin ew mirov ta îro nirx wenda maye û helbestên wî piştî mirina wî, di sala 1972’an de di hejmarên Hawarê de razayî man û tiştê ku bandûra wî li helbestvanên îro tuneyî dike ew e, ku hejmarên Hawara, ku ji sala 1943’an de rawestiye, di destan de peyda nabin.

Dr. Kamiran Alî Bedirxan jî, tevî ku helbesta nû ji salên sihî de nivîsandiye, li helbestvanên îro ne xwedî bandûreke berçav e. Sedemên vê yekê jî, wek em dibînin, çûyin û mayîna wî li Feransa û hindikbûna helbestên wî ye. Çimkî xemên lêkolîn û zîmankariyê ew ji helbestê bi dûr xistin, lewre jî helbest jê re nebû xem û bar, heya ku berhevoka xwe “Dilê Kurên Min” a ku di sala 1932’an de li Şamê çap bûye jî, careke dîtir çap nekir.

Hawarê, di navbera herdu cengên cîhanê de, hin helbestvanên dîtir jî, wek Celadet Alî Bedirxan, xwedî û berpirsyarê giştî yê kovarê, tevî ku helbestên wî ne ewqas pirrin, lê ji warê hunerî ve, wî didine kêleka Kamiran û Qedîrî Can û didine xuyakirin ku ew xwedî dîtinek helbestî ya nû ye û ji dîtina kevneşopî cuda ye. Helbesta kurdî gavine pêşve dikîşîne. Lê mixabin xemên lêkolînên zimên û ramanê ew jî ji helbestê bi dûr xistibûn û nebûna hejmarên HAWARÊ û dîwaneke wî di nav destan de, bendên qelew li pêş bandûra wî danîne û nehiştin ew bigihîne helbestvanên îro. Lê tevî vê yekê, bandûra her sê pêşengan li hin helbestvanên pêncî û şêstan, nemaze li Şewket Nee’san numa ye.

Şewket Nee’san di destpêka şêstî de wek helbestvanekî berz derket penava hunerê.

Helbestên wî yên di kovara Çiya de, bi navê Ebû Rahîb û bi hin navên dîtir di kovara Gelawêj de weşîne, wî wek helbestvanekî rûmetdar û xwedî karînen hêja û bi hêz didine xuyakirin. Û teqê didin ku ne ji bo xemên politîkê û avûkatiyê ba, wê ji her sê pêşengan re, nemaze ji Qedrî Can re biba berdewamiyêke hunerî. Lê mixabin helbestên wî di kovaran de, an jî destnivîs man, lewre jî bandûra wî li helbestvanên heştêyan xuya nekir.

Tunebûna dîwanên van helbestvanan, cîgehê wan di penava helbestê de teng kir û bandûra wan li helbestvanên îro tenik, an tune kir. Lê dengê duduyên dîtir; hemdemên wan, bilindtir çû û sînor derbas kir, heya gîha hemî cîgehên ku kurd lê cîwardibin; çî li beşên Kurditanê û çî li derveyê wê. Yek ji wan Cegerxwîn e ku bi rastî ew ji warê hejmara dîwanên çapkirî de, ji hemî helbestvanên kurdên Sûriyê dewlemendtir e. Ji ber ku wî heşt dîwan hene, digel hindê jî, wî çîrokek helbestî û dudiyên pexşanê hene. Helbestvanê dîtir jî Osman Sebrî ye, ku sê berhemên wî "Derdên me, Bahoz, Apo" hene.

Her yek ji van herdu helbestvanan, di helbestên xwe de, bi şeweyê klasîk re gelekî dilsoz bû. Eger mirov li afirandinên wan vegere, wê vê dilsoziyê sayî û zelal bibîne. Peyvên wan bijartine, hevokên wan bi hêz in, tirazûya helbestên wan dervayîye, şeweyê helbestên wan, bi gelemperî bi hêz û sert e, lê Cegerxwîn di hin helbestên xwe de ji şeweyê gelêrî ve gelekî nîzîk dibe, heya ku mirov wan helbestan ji pexşanê ve nîzîktir dibîne. Lewre rewşa axaftinên normal li wan bi hêz numa dibe. Di vê tengê re, Os-

man Sebrî peyvên bijarte û hevokên lihevhatî bi hêsanî li hev dirêse. Melayê Cizîrî yê Kurdî, Hafîzê Şîrazî yê Farîsî û M. Mehdî Cewahirî yê Ereb, bi me bîr tîne.

Eger em li wateyên wan mêze bikin, em ê bibînin ku ew herdu jî wateyên xwe ji çanda vî çerxê me, nemaze nivê wî yê yekem werdigrin. Wek azadî, serxwebûn, wekhevî, aşîtî û hwd. Ev wate jî, wek em dizanin, di navbera herdu cengên cihanê de li tevayê rojhelatê belav bûn û li nav gelên bindest bi cî bûn. Ev xalek dide xuyakirin ku helbest û mirovên kurd li gel dema xwe û mirovatîyê zor girêdayî ne. Lê xem û kovanên kurdan, cîgehê herî fireh û dirêj, di helbestên wan de girtine. Bê ku ev yeka wan di kesîtî û tenêtiya kurdayetiyê de dîl bike. Belê... çimkî herduyan êş û şînen hemî gelên bindest lorandin û şahiyên wan stiran û bê dudilî şerê sitemê, zorê û kedxwariyê tûj kirin û ta dawîya jiyana xwe domandin. Di vî warî de, helbestên Cegerxwîn ji bo Felestîn, Cezayîr û gelên reşîk, li nav kurdan bi nav û deng in.

Ev nav û dengê van herdu helbestvanan, bandûra wan li pirê helbestvanên salên şêstî û heftêyan kûr kir. Bê guman bandûra Cegerxwîn gelekî beloq û bi hêz bû. Ji ber ku berhem û afirandinên wî gelek bûn. Lê tevî vê yekê jî helbestên O. Sebrî cîgehekî pêşketî û rûmetdar jê re teqez dikin. Her kesê ku li helbestên Tîrêj, Keleş, Bêbihar, salihê Heydo, Omerê Lalê û Dilawerê Zengî bizîvire, wê vê bandûra ku em dibêjin, berz bibîne. Nemaze di warê şewê û nêrinên van hemî helbestvanan de, heya ku pirîcar kesîtiya van, di ya Cegerxwîn, yan jî di ya Osman Sebrî de wenda dibe. Ji ber vê em

dikarin bibêjin ku hinekan ji van helbestvanan nikaribûn ji wan herduyan derbas bana û çarçewê numûneyê Cegerxwîn de, çi ji warê avakirinê û çi jî ji warê çareserkinê de, dîl mane. Vêca eger mirov navên wan ji dawiya pirê helbestên hinekan rake, wê karibe bi hêsanî wan helbestan li Cegerxwîn vegeîne.

Lê helbesta kurdî li Sûriyê ne her û her li derdora şeweyê Cegerxwîn digere, ne jî her û her bêhna xwe ji ya wî dikêşîne. Belê... hin dengên dîtir, di van panzdeh salên dawî de derketin, mizgîna pêşerojê ronahî bi xwe re ji bo helbesta kurdî li Sûriyê anîne. Bi rastî jî eger ev dengan li xwe û li kelepûra kurdî vegeirin, wê karibin birêveçûna helbesta kurdî li Sûriyê geş û dewlemend bikin.

Ji nivê salên heftêyan de, hin navên nû li ser rûpelên kovara Gelawêj derketin vê penavê. Yek ji wan Bextreş bû... Bi rastî helbestên wî balkêş in û didine xuyakirin ku wî kar û bar û avakirina helbestê baş naskirî ye. Çimkê di wan helbestan de numaye ew dizane ku nema helbest li derdora bûyaran bigere, kela dilê helbestvan bi ser de birêje, an jî hin wêneyên hêrsdar û bê germîya hulm û derûnê, bê hevpariya helbestvan di çêkirina bûyeran de pêşkêş bike. Lê mixabin nizanîm nîrên derdora wî helbestvanê hêja çi ne, ku heya îro di goşeyên kovaran de maye û di berhevokeke çapkîrî de numa nebû ye?!

Ji nivê salên heftêyan û vir de, gelek navên xurt numa bûn û gelek dengên nû li helbesta kurdî ya li Sûriyê zêde bû. Bi rastî hin zêdebûnên ronak û sozdar li nik hinekan peyda bûne, wek Dehham Ebdilfetah,

di berhevoka *Ber Dergehên Lalez* de, ku di sala 1990'î de li Şamê çap kiriye û Rûxweşê Zîvar di berhevoka *Goristana Bê Gor* de ku li Bêrûdê çapbûye.

D. Ebdilfetah di vê berhevokê de, pêkarînek gewre di tenga danûstandineke nû li gel peyva kurdî û bidestxistina wê peyvê, pêkaniye. Û hin wêneyên nû ku li gel jiyanê kurdî girêdayî afrandine û xuya dibe ku wî têgihîştineke servekirî di tenga karmendiya helbesta nû re û danûstandina wê li gel bûyeran, bi dest xwe xistîye û ji axaftinê yekser bi dûr ketî ye:

*Min tu dîtî*

*Te li ber êşa birînê*

*Xewnên faşîst û sitemkaran*

*dihêran.*

*Te li ber bayê evînê*

*bêderên derdên evîndaran dihêran*

*Min tu dîtî,*

*Tu birîn bû...ar û xwîn bû..*

*Tu di jîna her evîndarî de Nûrozek evîn bû..!*<sup>(1)</sup>

Ev rewşên jorîn li nik Rûxweşê Zîvar jî, di hin helbestên *Goristana Bê Gor* de numa dibin. Lê mixabin hin helbestên vê berhevokê, di bin axaftineke yekser de hê milxarin û Rûxweş jî, di wan de, hê di destên wê yekseriyê de dîl e. Ev yek wê bandûra vê berhevokê di rêveçûna helbesta kurdî de qels û tenik bike. Lê tiştê berçav û ciyê pesnê ew e ku helbestên Rûxweş, yên di pey vê berhevokê re diafirîne, didine xuyakirin ku ew dê karibe vê kêmasiyê derbas bike. Çimkê ew helbestan mizgîna deng û dîtinek xweser didin:

*Dîsa...  
 Erê dîsa...  
 Evîndarên vemirandîna navê min,  
 Bi bîhma sorgula min de direyin.  
 Xwe dajon siha dengê min.  
 Şerê zimanê hevîyên min dikin.  
 Dixwazin bayê evîna min  
 serjêkin...  
 Nizanim çima,  
 Ev hestên min şiyar nabin,  
 Û nimra solên tawanên wan  
 Riswa nakin?!... (2)*

Roj bi roj ev helbestvanên nû li Sûrîyê pir dibin û dengên nû têne guhdarkirin. Nemaze jî di van pênc salên dawî de, wek R. Amedî, Tengezarê Marînî, Awazê Kalo, Hoşeng, Xemgînê Remo, Fethela Huseynî û hwd. Singên pirtûkxanan bi berhemên nû mişt dibin, rûpelên kovarên wek Xunav, Zanîn, Pirs, Stêr û Aso, bi nav û dengên nû rengîn dibin. Lê mixabin, hinek ji wan, ji warê hunerî ve, negihîştine astayekî payebilind. Belê hinek jî mizgîna jidayikbûna helbestvanên hêja didin. Ger em bibêjin Tengezarê Marînî yek ji van dengên sozdar e, wê ne çewt be. T. Marînî, cara yekem di navbera rûpelên kovaran de numa bû û di dût re jî şûna nigên xwe bi berhevoka Kilit, ya sala 1991'ê çapkirî, dût kir.

T. Marînî di helbestên xwe de penav û bergehêk fireh ji xwêner re dihêle, da biponije û di wê helbestê de bibe hevparê afirandinê:

*Min sê çirûsk  
 Bi dest xwe girtin*

*Yek za  
 Bû çem û çikiya  
 Ya dîn  
 Hehecîkek penaber,  
 Ya dawî  
 Helbestek kelogirî.  
 Her sê gîhan hev  
 Li ser...  
 Welatekî jibîrkirî  
 Girîn.<sup>(3)</sup>*

Lê xuyaye T. Marînî di karmendiya xalekan negîştîye. Çimkî van xalekên ku li dût hev rêzdibin, nemaze jî di helbesta nûjen de karmendiyek heye. Ji ber ku ew xalek, xwêner ber bi hevpariya afirandinê dikşînin. Ji bo vê jî em cihê van xalekan rast nabînin, çimkê xwêner nikare hîç tiştekî li şûna wan texmîn bike. Ya rast ew bû ku ev xalekan li vir tunebin, an jî bigota: (Û welatekî).

Gava mirov berhemên van helbestvanan dixwîne, bandûra helbesta erebî ya nûjen bi gelemperî û ya Sûrî bi taybetî, dibîne. Ev yek jî, di nêrîna me de tiştekî gelekî xwerîstîye. Çimkê helbestvanên kurd hemî, bi zimanê erebî baş hîn bûne û gelekî jî bi wî zimanî dixwînin û ji ber ku hîç tiştekî ji zimanên biyanî wernegeriye zimanê kurdî. Ev zimanê erebî wêca bûye deriyê serek ku helbestvanê kurd bala xwe tê re dide çanda erebî û hemî çandeyên biyanî yên dîtir. Ji bo vê jî zimanê erebî bûye alava yekemîn ku helbestvanên kurdên Sûrîyê dighîne kelepûra erebî û ya mirovatî jî. Ji lewre em tu ziyane ji vê bandûrê nabînin; çimkê ev bandûr, helbesta kurdî ya nûjen dewlemendtir dike, helbestvanê kurd pêş ve dibe

û karîna helbesta kurdî di danûstandinê de, li gel hemî dîtînên ramanî û helbestî yên cuda cuda û pê re jî karînên vê helbestê di tenga parastina kesîtiya xwe re teqez dike. T. Marînî di vê xalekê de nimûnekê berz e, ji ber mirov pêjna bendûra helbestvanê erebî sûrê Edonîs, di helbestên wî de dike.

Em naxwazin gotinên xwe dirêj bikin, navên nû gelekî, hinên wan mizgîna jidayikbûna hin helbestvanên rûmetdar didin, wek Keça Kurd, ya ku pirîcar afirandina wê, bi hulmeke helbestî ya payebilind di kovaran de têne weşandin û tîrêjên pêşerojê geş, ku bendewarê wê ye, numa dikin. Em hêvî dikin mijûlên wê yên wergerandinê û lêkolînên zimên wê pêşerojê bi birîn nekin.. Û wek Diya Ciwan, ya ku berhevoka wê *Pêlek Ji Deriya Kovanên Min*, ku sala 1992'an çap bûye û mizgîna dengê jinan sazdar, di penava helbesta kurdî ya nûjen de, li ser Sûriyê, bi xwe re aniye.

Em tenê dixwazin bibêjin ku em Şêrko Bêkes, bi jibîrkirina helbesta kurdî ya nû, li Sûriyê, gunehkar nakin û ne jî ev yek mebesta vê gotarê bû. Lê merem ew bû ku em çirûskeke li ser tevgera helbesta kurdî, li Sûriyê pêxin û ger sêcê ji ber kêmasiya hevpeyvînê hebe jî, wê gunehê Birahîm Yûsif be. Çimkê wî ev hevpeyvîn li gel Ş. Bêkes kiribû û ew li Sûriyê dijî û di tevgera toreya kurdî de, çi bi helbestên xwe û çi jî bi pêşgotinên ku ji berhevokan re dinisîne, hevpa û hevpişk e. Vêca ew rewşa helbesta kurdî ya li Sûriyê ji Şêrko Bêkes çêtir dizane. Ji bo vê yekê, em çareserkirina vê kêmasiya wê hevpeyvînê li ser milên wî û yên Ebdilbaqî Husynî datînin. Ji ber ku ew jî di hevpeyvînê de hevpişk bû û deqê wê yê

kurdî, di hejmara Zanîne ya 7'an de weşandibû.

Eger li vê dawiyê em bipirsin çima agahdariyên Ş. Bêkes bi tevgera toreya kurdî li Sûriyê kême? Du sedem wê xwe bidin pêş: Yek, nebûn, an qelsbûna pêwendiyên navbera wî û helbestvanên kurdên Sûrê ye. Du; nebûna tevgera rexneyî ye, ku van berhemên helbestî, li Sûriyê, bide ber xwe.

Nebûna vê tevgera helbesta kurdên Sûriyê, li Sûriyê dihêle û deriyên derketina derwayî Sûriyê li pêş wê digire. Ev sedem jî vê helbestê paş ve dikîşîne. Çimkê, çendî wergirtina toreyê bê deng be, ew qas ew bêdengî dibe kuştare ramanê û afirandinê. Lê danûstandin, rexnekirin, lêkolîn, verşandin, erêkirin, naskirin, deriyên pêşveçûnê li pêş afirandinê vedikin. Ev berdestî jî hê jî helbesta kurdên Sûriyê re nebûye. ■


1-Dehham Abdulfetah: *Li ber dergêhên Laleş*, Şam, 1990, rûpel 15.

2-Pîrs, hejmar 3, sal 1, Çiriya Pêşî 1993, rûpel 20.

3-T. Marînî: *Çirûskên xeumeke bazdayî*, Weşanên Aso, Bêrût., sal?, Rûpel 29.

# Behdîna hêlîna helbesta kurdî ye

L  
Ê  
K  
O  
L  
Î  
N



Mehîz Mayî

Wêjeya kurdî dengdana jiyana gelê kurd e, ku ew jî girêdayî welat û cihê wî yê bi deşt, çiya, gelî û bi daristan e. Dengvedana jiyana kurdan ya bi hezaran salan e. Kesê ku bixwaze edebiyata kurdî bi giştî û helbesta kurdî nas bike, divê berî her tiştî ew li ser welat û civata kurdî haydar bibe.

Lêkolînên ku heta niha hatine kirin ne ew lêkolînên dibxwaz in yên ku karibin bi firehî û heralî li ser edebiyata kurdî kar û encam berçav kirine, piraniya wan lêkolînên ji serve û ne fireh in, egera wê çendê jî em dikarin di van xalan de diyar bikin:

Yek: Parçebûna gelê kurd û jihevqetandina wî di serdemêke dirêj de.

Du: Mana Kurdistanê her tim di bin barê şeran de her ji serdema berî musulmanetiye û heta îro, ku ew jê bûye egera paşdemayîna gelê kurd û wendabûn û ji alê dijminan ve wendakirina berhemên wêjeyî û şaristanî.

Sê: Piranî, yan jî em dikarin bêjin hema hemû lêkolînanên ku lêkolîn li ser kurdan û civata wan çêkirene ne Kurd in, ew jî aliyê kesên biyanî ve hatine nivîsandin, ew jî dema ku bi karê xwe hatine devera Kurdistanê û demek

lê mane, wan xwe mijûlî lêkolînên li ser xelkê wê deverê çêkirine.

### Awirek li destpêkê

Destpêka edebiyata kurdî çawa û ji kîjan serdemê dest pê dike, bawer û boçûnên cuda-cuda li ser vê çendê hene. Hin dibêjin ji Eliyê Termokî, hin dibêjin ji serdema Baba Raxê Rawendî ku di sedsaliya dehan de jiya bû, xelkê devera Hekarê bû, paşî wî jî Baba Tahîrê Hemedanî bûye ku di sala 1123'an de wefat kiriye. Lê hin lêkolînvanên din jî mîna nemir Enwerê Mayî di pirtûka xwe ya bi zimanê Erebi "El-Ekrad Fî Behdînan" de, ku sala 1963'an li bajarê Mûsilê çap bûye, dibêje: Di bîranînên Şêrko Bîlec de hatiye, ku zanayê Sovyeta berê bi navê N. Filyamînov gotiye ku kevîrek li bakûrê Îranê (dibe ku mebest pê bakûrê rojavayê Îranê be ku ew jî devera Kurdistanê ye di bin destê Îranê de - nivîskar) hatiye dîtîn, li ser wî kevîrî çend malikên helbesteke kurdî ya bi kirmanciya jorî, navê xwediyê helbestê Boraboz bûye, ku ew helbest di sala 320 b.z. de hatiye nivîsandin.

Ew çend malikên helbestê jî weha dest pê dike:

Xwazdî ez tu bi hev re bin bi hev re herin xorîne  
Wer de bihêrin kotra bin bang dîn bi hev re narîne  
Dwînî kotra hêra bûm awaz ji cir dixwîne  
Fîrabil û beyaban hawar ji dest evîne  
Ez tu watu yek dil wîn hêzan cwadî wîne  
Vêkra pêkra hîfne wîn bicîrîne ya binvîne

Sed sal berê jî, parçeke çerm li devera Şarezûrê hatiye dîtîn, helbestek li ser nivîsiye, behsa wê dike, dema ku leşkerê ereban, yê musulmanan, hatibû ser devera Şarezorê û gundên wê dagîr kiribûn. Ev çende jî diyar dike ku berî hatina musulmanetiye jî helbest di nava kurdan de bernas û her hebû. Dîsa diyar dibe ku ola kurdan berî musulmanetiye ola Zerdeştî bû. Ev jî beytên wê helbestê ne:

Horezgan rîman, atran kujan  
wêşan şardewe gewrey gewrekan  
Zorkar Erebi kirdine xapor  
Gina û Paleyî heta Şarezor  
Şin û keikan wedil be şîna  
Mêrd aza tili we roy hiwîna  
Rewîşt Zertotşre manewe bêdes  
Be zêka nêka Hormiz we hîç kes

Her çawa be, diyar dibe ku edebiyata kurdî di destpêka xwe de bi helbestê dest pê kiriye û helbest stûna herî girîng û mezin e di edebiyata kurdî de Ehmedê Xanî derd û kulên Kurd û Kurdistanê, hebûn û daxwaziye gelê kurd di Mem û Zînê de, bi awazê helbestê vehunîn û anîn zimên.

Helbet dema ku meriv li dîmenên delal yê Kurdistanê dinêre, li xemla çîyan, gelî û baniyan; li av û derav, çem û berçemên Kurdistanê dinêre û bala xwe didê, meriv dizane ka çima her ji zû de kurdên helbestvan peyda bûne û çima evîna helbestê di dilê kurdan de şîn bûye. Ew hemê xeml û xweşiya Kurdistanê ye ku hêvênê helbestan di dilê helbestvanan de çêdike.



## **Dilê helbesta kurdî li Behdînan lêdixe**

Wek me berê jî behs kir; ji ber ku Kurdistan her ji serdemên gelek zû de ketiye bin barê şerên giran û wêrankar, talan û kimbaxiyên mezin bi ser Kurdistanê û xweci-hên wê de hatine, lewma jî gelek bi zehmet e ku mirov bikare destpêka helbesta kurdî bêxe ber çavan. Tiştê ku heye û maye jî piranî ew e yê ku dev ji dev hatiye parastin, lê berhemên nivîskî gelek wenda bûne.

Li gor ew lêkolînên ku Enwer Mayî kiri-bûn, diyar e ku helbesta kirmancî berî her derê li devera Behdînan dest pêkiriye. Ew behsa helbestvanên Behdîna dike, ji Şêx Mehemedê Mexribî dest pê dike ku ew di sedsala 900'an de jiya ye. Ez bixwe jî nabînim ku yek hebît li seranserê Kurdistanê berî wî helbest vehandibin, eger hebin jî navê wan ne diyar e. Paşî wî jî, nemir Enwer Mayî behsa Mele Mensorê Girgaşî dike, ku di nîva paşî ya sedsaliya çardê de jiya ye.

Ew helbestvanên li Behdîna, yên ku heta destpêka sedsaliya 1900'î, yên ku nav û dengê xwe hebûne, em dikarin wan bi ser van refan de parve bikin:

## **Helbestvanên berî sedsala 1800'î**

### **1- Şêx Mehemedê Mexribî:**

Navê wî Mehemed, xelkê gundê Mexribya ye. Mexribya gundek e, dikevîte ser ava Zê-yê mezin li rojhelatê devera Berwarî, li qeza Amêdiyê, li başûrê Kurdistanê. Ew di serdema 900'an de jiyaye. Wî diwanek bi fari-sî û çend helbestên bi erebî û kurdî jî hene.

Ew ji xelîfeyên mewlana Şêxul-Îslam Elî El-Hekarî bû. Mixabin ku me nikaribû berhemeke wî bibînin.

### **2- Mela Mensûrê Girgaşî:**

Xelkê gundê Girgaşê ye, ku dikevîte başûrê rojhilatê bajarê Amêdiyê. Ew di dawiya sedsala çardê de jiyaye. Hemdemê Bateyî bûye yê ku di salên 1417-1495'an de jiyaye, berhemên wî yên bi nav û deng Beyta Bi-harê ye û ew hevirikiya helbestê ku wî bi Melayê Bateyî re çêkiribû.

### **3- Heme Kûr, sedsala 1700:**

Navê wî Mehemed, paşnavê wî Kûr e. Wek bi paşnavê xwe diyar e, ku ew ji her-du çavên xwe ve kûr bû. Ew şairê nexwan-devan bû. Wî helbestên xwe weke stranan, bi selîqe û awaz çêdikirin. Ew stran û helbestên wî heta nihe jî di nava xelkê me de têne gotin.

Ew bi xwe jî gundekî devera Hekarê ye, ji bêçareyîya xwe ji wir revyaye, hatiye bajarê Amêdiyê ba mîrê Amêdiyê yê wê demê melik Qubad Beg, kurê Sultan Husên begê mîrê Behdînan. Mîrê Amêdiyê ew kire mutirb, ew bû stranbêjê nav mala mîr.

Diyar e ku di nav mala mîr de, ew dibê evîndarê xwuşka mîr Sînem-Xanê. Yek ji stranên wî yên xweş strana Sînem, yan Sî-nemok e, ku ew li ser evîna xwe û Sînemê gotiye, heta nihe jî ew stran di nava xelkê Behdînan de, di nava şahî û dawetan de têne gotin. Eger îmkan û derfet bûn, em dê careke din, di gotareke din de li ser Heme Kûr nivîseke taybetî binivîsin.

#### 4- Bekir Begê Erizî, (1767- ...)

Navê wî Bekir- Beg e, navê bavê wî Behdir-beg, xelkê gundê Erizê ye ku dikevîte ser çiyayê Metîna, li rojavayê bajarokê Bamernê, li devera Behdîna.

Ji berhemên wî yên bi nav û deng: Beyta Kewî, Beyta Biharê, Beyta Tergê, dastana Çolî Begê û çend beytên dî.

Dibêjin ku, Bekir Begê Erizî ji bilî şafîriya xwe, ew dartaşekî gelek zîrek û wênekêşekî hêja bû. Dibêjin ku wî peykerên gelek hêja ji darî çêdikirin, ne dûr e, eger ne ji dîne îslamê bûya, ku wênekêşan û peykerçêkirin heram kirine, da ew bibûya hunermendekî cihanî yê pir bi nav û deng.

Ew helbestvanekî dî helbesta xwe de azad bû. Wî nêzbûnek bi Smayil Paşa re hebû, lewma wî helbestek ji zardevê wî, li ser dutmama wî çêkiribû, ku Smayil Paşa evîndarê dutmama xwe Naîle- Xatûnê bû. Destpêka wê helbestê weha ye:

Bi der keftim, temaşa kem tiyê rojê li dinê dabû  
Xeyala dilberê nakem, me dîtina dî ku peyda bû

#### Helbestvanên sedsala 1800î...

##### 1-Şêx Noreddînê Birîfkî, (1791-1854)

Navê wî Noreddîn, kurê Seyid Ebdulcebar, kurê Seyid Babekir e. Ew zanayekî gelekî navdar û xwedî zanist bû. Helbestvan û zanayê navdar Şêx Rizayê Talebanî di helbesteke xwe ya bi farisî de behsa zanebûna Şêx Noreddînê Birîfkanî dike, ku ew bi sefer hatibû Birîfkan, wek dibêje:

“Ezimê diyar rewem çû kerdem zi Şehrezor  
Aftad der diyarê (Birîfkan) mera ubor.  
Kohî bulend payê der an rehguhaz bûd  
Biguxtê zi tabê tecellî bisanê tûr  
Heyran şudem zi nişte an kohê pur şikoh  
Perwaz kerd ez serê men taîrî şuîor  
Ava kerd nagîham ez hatefî zi xeyb  
Kê in raz ber to lehzeyê dîger kuned zuhorî  
.....  
Heta dibêjît:

În merqedê hebîbê xuda (Şêx Norî st)  
Cismeş bi xak xefê ve can refî der huzor

Wî gelek pirtûk bi zimanê erebî nivîsandine, herwesa helbest bi kurdî, farisî û erebî vehandine, dîwaneke bi erebî û yek jî bi kurdî heye. Gelek pirtûk bi zimanê erebî nivîsandine, ji wan:

- 1- Behcetulsalkîn.
- 2- Adab al xulwe.
- 3- Îbraz deqayîq al heqayîq.
- 4- Al- Bedir al celiye.
- 5- Meram al Îslam.
- 6- Al- fetih al arhem.
- 7- Telxis al hukum
- 8- Nameyên wî yên ji murîdên wî re.

##### 2- Mela Xalidê Sernî

Sala bûn û wefata wî ne diyar e, ne jî hatiye zanîn ka dîwaneke wî hebû yan ne. Enwer Mayî dibêje ku; wî hindek helbestên wî dîtine gelek xweş û nazik bûne.

##### 3- Şêx Tahayê Mayî (1843-1919)

Navê wî Taha ye, kurê mele Ebdulrehman,

qaziyê Berwariyan e, ji malbatek zane û dîndar bû, ji kesên meşhor bû di serdema xwe bi zanîna xwe. Wî gelek helbest bi hersê zimanên kurdî, farisî û erebî vehunîne. Diyar e ku wî gelek nivîsînên corbecor hebûn, lê mixabin di şerên Inglîzan de û hêrişên Tiyariyan bo ser gundê Mayê, hemû nivîsînên wê hatine talankirin û şewitandin. Ew di helbesteke xwe ya bi kurdî ku li ser derzîkê çêkiriye weha dest pê dike:

Me derziyek hebû emma çî derzî nebû asin ji wî rengî, wî terzî

Kesê carek werarek pê dirûba dibû bê xêrî xwe xeyat û terzî

#### **4- Şêx Tahirê Mayî (...-1915)**

Ew birayê Şêx Taha Mayî ye, mirovekî zana û di hersê zimanên kurdî, farisî û erebî de edîb bû. Mixabin, berhemên wî, ji wan jî dîwana wî ya bi kurdî, mîna yê birayê wî, di hêrişên Tiyariyan de bo ser gundê Mayê hatin şewitandin û talankirin, bitenê nivîsîneke wî bi nvê (Mîrقات el tullab) ji şewatê felitiye.

#### **5- Hesênê Bamernî (1868-1940)**

Navê wî Hesên, kurê mela Ehmed Babik e, xelkê gundê Bamernê ye, ji malbateke zana û navdar e.

#### **6- Xiyaseddînê Neqşebendî (1890-1944)**

Kurê Şêx Behaiddînê Neqşebendî ye, nûnerê bakûrê Îraqê di perlemana Îraqê de bû heta sala wefata wî 1944'an.

Ew mirovekî gelek zana bû di zanistên zimanî û dînî de. Wefadar û evîndarê welatê xwe bû. Di dema şerê cîhanî yê duwem de, wî helbesteke dirêj li ser bûyerên şer çêkiribû. Wî gelek helbestên li ser welatparêziyê hene. Ew di helbesteke xwe de bangî xurtên kurd dike, herwesa helbesteke wî li ser medihkirina zanayên kurd Mîr Celadet û Dr. Kamuran Bedixan heye. Şundestê wî li ser hemû devera Behdîna heye di warê roşenbîrî û zanistê de.

#### **7- Nadirê Kanîsarkî (...- 1948)**

Xelkê gundê Kanîsarkê ye li devera Berwarî. Mirovekî nexanevan bû, çî ca ew têkelî edeb û edîban nebibû, hemû jiyana xwe wî bi şivantî derbas kiribû, hemû xwendina wî soreta fathe bû, hejar û bîrsî bû, lê di ser wî halî jî re, wî helbestên xweş û nazik vehunî bûn. Li ser wî nemir Enwer Mayî dibêje; ku wî ew dîtiye û guhdariya du helbestên wî kiriye, yek ji helbestên wî yê navdar bi navê (Kulind) e. Ew helbest wî li ser bexîlî û qelsiya mirovekî zengîn ji gundê Edin ye.

#### **8- Ehmedê Nalbend (1890-1963)**

Navê wî Ehmed, kurê Emîn Nalbendê Amêdî ye, Babê wî hatibû Bamernê, li wir nalbendî dikir, her lewma jî wî paşnavê - Nalbend- li xwe kir. Ehmed li Bamernê ji dayik bûye, paştî ku mezin bûye dest daye xwendinê, çûye gundê Mayê li ba herdu zanayên mayî, Şêx Taha û birayê wî şêx Tahir ders xwendine. Wê her ji jiyê gencîniya xwe dest daye helbestvehandinê, dibe jî egera wê ew bû ku, kesê wî ders li ba dix-

wend, çî li Mayê, çî li Bamernê, helbestvan jî bûn.

Ehmed dibe evîndarê keçekê ji gundê deştanê, ku nihe ser bi qeza Çelê ye û Tirkan wêran kiriye. Agirê wê evînê li dilê Ehmed dixwe û wî dike helbestvanekî gelek hêja û navdar. Helbestên wî dibin gotin û dikevin ser devê civatê. Di nav deryaya helbestên wî de, pêlên evîna keçan, evîna Xudê û pêyamber û evîna Kurdistanê heye. Ew helê hatibû ku êdî axiftina wî jî di nav civatê de bi seng serwa û awaz bû, anku, axiftina wî jî helbesteke dariştî bû. Ew melavan bibû di hersê zimanên kurdî, farişî û erebî de.

Wî gelek mereq dikir ku dîwaneke xwe ya çapkirî bibîne, lê mixabin, heta wî wefat kir tiştek nedît.

Heta nihe, paşî mirina wî çend dîwan ji helbestên wî hatine çapkirin, lê piranî ji alê Taha Mezher Mayî ve hatine topkirin, lê hîn rêya çapkirinê nedîtine. Eger hemû helbestê wî bêne çapkirin, dê bibin çar cild, her cildek pitir ji 100 helbestan. Wî helbestên dirêj jî hene, ku her yek bi serê xwe dibe pirtûkek, yek li ser çar demsalan, yek jî li ser nesîhetan.

Kul, derd û kovanên di dilê Ehmedê Nalbend de wekir ku, ew li ser hiş û mejiyê xwe nema, mîna mirovekî dîn, hero li direkê bû, heta di meha îlona sala 1963îan de, ew ji jiyana bêzar bû, kêrek li zikê xwe da, wî bi xwe xwe kuşt, hêvî, xwezî, derd û kovanên xwe bi xwe re birin.

Em dikarin Ehmedê Nalbend weke mamosteyekî di helbesta klasîka kurdî da bidin naskirin, ji ber ku wî dibistana xwe ya taybetî di helbesta kurdî -nemaze li Behdînan- vekir

û heta nihe jî şagirdên wê dibistanê hene û berdeham in.

Bi wê hîviyê, ku careke din bikarin li ser helbestên wî tiştekî ji xwendevanên hêja re pêşkêş bikin, herweha divê ku em ji bîr nekin, ku paşî wefata Nalbendî, di destpêka 1970'î de helbesta nû li Behdîna serî hilda, bi wê hêviyê jî, ku em karibin di nivîseke din de, li ser helbesta nû li Behdîna ji xwendevanên hêja re pêşkêş bikin. ■

#### Çavkanî:

- 1- El-Ekrad fil-Behdînan, Enwer Mayî, Mûsil, 1961.
- 2- Dîwana Şêx Noreddînê Birîfkî, amadekirina Şêx Wehîdiddînê Birîfkî, Hewlêr, 1991.
- 3- Dîwana Ehmedê Nalbend, Xalid Hisên Zaxoyî, 1989.
- 4- Hozanvanê Kurd, çapa latînî, Jîna nû, Stokholm, 1988.

# Gotin û peyvîna bedew, şî'r

Rojen Barnas

Gotin di destpêkê de hebû, û Gotin li cem Xwedê bû, û Gotin Xweda bû.” Încîla li gora Yûhanna bi vê ayetê dest pê dike. (Binêre li Încîlê ya li gora Yûhanna, Bab 1, ayet 1).

Li gora hîlbijartina te ye, te divê bêje Xweda an te divê bêje xweza (surişt/tebî'et), Wî an wê hertişt ji bo me berdest kiriye. Her tiştên ku hewcedariya me pê hene, li hawîrê me, li gerdûnê; di axê, di avê, di hewayê û di agir de vehewandî ne.

Lê ew hewcedarê destkariyê ne. Divê bi destên mirovan ew ji hovîtî, kûvîtî an ji xamîtiyê bêne derxistin û ew li gora mebesta bikaranînê bêne kedîkirin û edilandin. Dexl û tene wisa bûn, pez û dewar jî bi wî awayî.

Gewherê zêr bi xwe di sînga erdê de ye, lê wek kevîr e; kevîrêkî bê teşe. Yê aqût jî wisa ye, yê almas jî. Ku meriv rake perçekî

ji wî gewherê kevîrîn bîne bi çembil û bi ben veke, û bike stûyê delala xwe, wê çi bedewiyê bidê gelo?

Lê mirov, karkerên tevrûbêrê wî ji binê axê derdixin, karkerên metalurjiyê wî gewherê nesafi dihêlinin, zêr ji tebayê din saft dikin û berdidin qaliban, dikin kulînce. Kulînceya zêr wek kerpîçekî pehtî yê, çargoşe ye. Ji bilî çirisîn û bihayiya wê tu bedewiyek wê nîne. Çi maldar, çi belengaz tu kes nîne ku bifikire, ji dêlva xemlûxişir ve rabe kulînceke zêr bi gerdana hezkiriya xwe veke.

Lê gava kulînce tê digihê ber destên hostayê destkariyê, zêrînger (zîvkîr); ew bi zîravî, bi tenîkî, bi hûrîkî wî zêrî li hev badide, dirihoje, diqewêre, dineqîşîne. Zêr hê dibe xemlûxişir. Û ew berhemên vê destkariya edilandinê, dibin xemla bejn û gerdênê delalan.

“Gotin di destpêkê de hebû, û Gotin li cem Xwedê bû...”

Lê gotin - bi çi awayî dibe, dilê wî ye - kete nav mirovan. Mirov ew kedî kirin, bi kar anîn, kirin peyivîn. Hosta derketin, rahiştin peyivînê bi destkariyê edilandin: Ew bû nutiq, bû xîtabet, bû xutbe. Û ev gihîşte ber destên hunermendê dîtir; zêrîngê peyivînê: Ew rabû kulînceya qirase ya peyivînê rihot, qewart, li hev honand, maneyê kûr û zirav, vegotinê kurt û gurr kir, muzîkê da ber hevîrê wê, bi xewn, xwezî û hevîyê neqîşand, di hêtûna hîsan de bi ardûyên hêrs, bêrî, kerb û lavayiyê peht. Û jê şî'r çêbû, afirî.

Şî'r çi ye? Li gora mîtolojiya Yewnan a kevin, şî'r qasidiya di navbera xwedeyan û mirovan e.

Li gora vê mîtolojiyê, piştî şerê bi dêwan re ku Zeus bi ser ket, bi bi xwedeya Titan (Dêwîn) Mnemosyneyê re zewicî û ji herdiwan neh keç çêbûn, ji wan re bi gîştî “musa” tê gotin. Her “musa”kê herêma xwe ya kulturî dinimand (temsîl dikir): Klio tarîxnivîstî, Thalia komedî, Erato stranên evînê, Euterpe blûrvanî û koroya trajîk, Polyhymnia lawijên dîndarî, Kalliope şî'rên mêrxasî û stranên şîn û xemgîniyê, Terpsichore lîrîka koroyê û reqsê, Urania astronomî û Melpomene trajedî.

Kalliope û Terpsichore du musa, ya pêşiyê periya nezmê, ya duduya periya şî'rê, du keçên Zeus bi vî karî bilî bûn.

Lê zemanê pirxwedeyî û mîtolojiyê çû, yê dînen “semawî” hat.

“Û Xwedê got: Di navbera avan de bila gunbed hebe û avan ji avan veqetîne. Û Xwedê gunbedê afirand, û avên di bin gunbedê ji avên li ser gunbedê veqetand; û wisa bû. Û Xwedê ji gunbedê re got esman. Û êvar bû û sibe bû, roja didiwan.” (Tewrat: Tekwîn, Bab 1, ayat 6 - 8).

“1 Esmen rûmeta Xwedê beyan dikin,  
û gumbet destkariya Wî radigihîne  
2 Roj ji rojê re dibêje,  
şev ji şevê re zanînê dide nîşandan.  
3 Gotin jî tune, peyv jî tune, dengê wan nayê bihîstin.

4 Ahenga wan gihîştîye hemû dinyayê,  
û gotinên wan heta kujê erdê,  
û ji bona Rojê, Wî li wê derê çadir vegirt.  
5 Ew Roj ku wekî zavakî ji menzela zavatiyê derdikeve,

Û wek mêrxasek kêfxweş dibe ku bikeve ser riya xwe .

6 Hilhatina wê ji koşê asîmanan,  
û çerxa wê heta dawîya wan,  
û tu tişteke veşartî namîne ji germa wê.” (Zebûr, mezmûra 19.)

\* \* \*

“Weddûha, welleylî îza seca, Ma wedde'êke rebbûke we ma qela, We lel axîretu xeyrun leke mînel-ûla, We lesewfe yu'tike rebbûke feterda...” (Bi danê sibê, bi şeva ku tariya wê hedirî û tebitî, Xwedayê te te ne hêla û nexeyidî, Helbet axret ji te re bi xêrtir e ji dinê, helbet Xwedayê te dê wê bexşî te bike û tê jê dilxweş bibî.) (Qur'an,

sûreya Weddûha)

An jî “Wel fecrî, welleyalîn ‘eşrîn, weşş-efî welwetrî, welleylî îza yesrî”. (Bi spêdê, bi dehşevan, bi fer û zo, bi şeva hatî û çû...)” (Qur’an: Sûreya Fecr).

Bala xwe bidin zimanê van perçeyên ji sê kitêbên “semawî”: çi vegotineke kurt û bedew, maneyek kûr û gurr, honandineke ahengdar, û geşkirina hîsên di canê mirovan: Şêweya peyivîna Xwedê... Ma şî’r ne ev e?

“Qasidiya xwedeyî”, “dayina Xwedê” an “şêweya peyivîna Xwedê” bila gişt bimînin li wê, heryek li gora xwe dikare manekê bidê.

Lêbelê gotina ku emê pê bigihên derekê ev e, ku şî’r zimanê bilind a ragihandina daxwaziyan e, ku ev ragihandin ji aliyê hîsê ve dagirtî, ji aliyê gotinê ve kurt, ji aliyê manê ve kûr û zirav, ji aliyê vegotinê ve bedew û ahengdar e. Armanca vê ragihandinê ber bi dil û hîsan ve ye, ku şî’ra xurt bi pêlên xwe yê elektrîkî tafilê li ser dil û hîsan tesîrê dîkin, û pê re muhakemeya hiş û mêjî yanî mentiqê dixewînin. Nemaze ji ber vê taybetiya wê ya dawîn e, ku di têkoşin an propagandayên civakî, dînî û siyasî de ji bona lêgeşkirinê (ajîrasyonê), zimanê şî’rê di ser zimanê berhemên edebî yê dîtir de tê girtin. Û şairên van cereyanan ji aliyê pêgîran ve zûtir û bêtir tên nasîn û hezkirin. ■

## PERIYA XEWNAN LI ME HAT REHMÊ

Periya xewnan li me hat rehmê  
Perda dûrîtiyê ji nav me rakir  
Qasekê, bîskeke an jî weşekê  
Dilê min bi dîtina te şa kir:

Tu gulek sor û geş, mîna wê dema  
Me hevdû dîtibû cara pêşiyê  
Dilê min noq dibû li derya xema  
Dilê te difirî j’ kêf û xweşiyê.

Devê te tişteki nedigot, heywax!  
Ji hêla dayina hêvî û mefer  
Dilê min yê bi xem bi sosret û xax  
Dibû parî parî, dibû ker bi ker

Diljar û dilhêsîr, dilşkestî bûm  
Wek laşekî mirî di xatirxwazî  
Hêviya mezin a ku te dida min  
Ew bişirandinên te yê bi nazî.

Lê şabaş! dîsa jî periya xewnan  
Em anîn cem hev, li me hat rehmê  
Bextê me jî wilo rojek nişka va  
Bida me çi dibû destê keremê.

Rojen Barnas

## ESMANÊ MIN CÛNÊ GULERENGÎN BÛ

Esman cûnê gulerengîn bû  
Qûntarên çiyê keskê kevwînî  
Dilê min ji dojeha xemê, bêtir xemgîn bû  
Bêçare bû, aware bû, bi tenê.

Şîrqîn bi gaza dêna min ve ket  
Brûskek lê ket, Rojek jê hîlbû  
Ronahî belavbû li bergeha min  
Fereh bû, hilkişî li bilindayî  
Dil avêt û jenî ji pêlên xwînê  
Ji bo min Sedefa bextewarî  
Tu zayî  
Li qerexa derya evînê

Bi xweşî hatî li spêda min  
Gula min a herdem, nazik, perîza  
Te asoyê min ronî kir  
Û dilê min geş...  
Bextê min î şevlêgerî  
te xweş kir, Roza!

Dilber hene bi her zmanî  
Dilber hene li her welatî  
Lê,  
Ne wek Te ne.  
Dilber hene ne perî  
Dilber hene ne ferîştah  
Dilber hene ku ne xwede ne  
Tu ji vana yekoyek bêrî

Tu ji xasîyetên vana -haşa!- aza yî  
Tu ya yekta  
Tu ya her tişt  
û ya hîç  
Tu ya xwezayî.

Hemanên jîyanê çar:  
Av, ax, hewa û agir  
Lê kes bîr pê nebîr  
Ku Tu ya tiqûtenya  
Çarên din têk  
Di nihêrîna Te ya awirda  
Di bişîrîna Te ya soj  
şîrîn  
û jîyan jêza...

Rojen Barnas



## HÊMANA MIN A XWESER DÎLBERA MIN ROZA

Esmanê min niha jî wek xwe  
Ne cûnê gulerengîn e, lêbelê  
Reşê gurretarî yê herî mat  
Ne stêrkek xuyanî dike  
Ne ji rojê serat û berat  
Û kes nizane  
Dê bi çi rengî ye xweza

Lê brûsk li derekê du car naxîne  
Firset li pey xwe nazvire car dî  
Pê zanim lê belê dil fam nake ku  
Strana umîdê dixwîne peve  
Zanim ku firset bi destê m' nakeve  
Lê dîsa hêviyê nabirim ji te.

Esmanê m' niha jî ne tu esman e  
Ku m' hêviyê ji te birîbiya.


Rojen Barnas

# Helbest çî ye, helbestvan kî ye?

Helbest (er, şî'îr, fr. poésie, îng. poem, al. poesie, ge-diht) tewreke wêjeyî ya herî kevin e. Naveroka di ziman de, bi deng û rîtman, bûyer û baweriyekê, an jî dilînekê bi gotinên taybetî bikaranîna pîşeyî re helbest tê gotin. Ji sedsalan vir de endaze û wekhev dengiyê di hevok û gotinên helbestan de heyî girîngiya babetê helbest e. Heya îro tarîfeke helbestê, ku hemî lê bibin yek hîn nehatiye gotin.

Gelo ma helbestvan kî ye? Bê guman helbestvan ji kesê ku helbestan dinivîsîne û dibêje re tê gotin. Li gor tarîfa Platon "Helbestvan xulkek bi bas û pîroz e. Dema mirov sirûş (îlham) nebe, ji xwe neçe û dengê heşên xwe hindik neke nikare biafirîne." Li gor Arîsto helbest "Beşek ji sine-tê teqlîtê ye. Çavkaniya xwe ji dîtin û jiyana mirov dijît û tiştên jê hez dike teqlîtîkirinê tê. Helbestê dîrokê yê herî kevin berî Îsa bi 2000 salan bi zimanê sîmêriyan li navça Mezopotamyayê destana çîroka Gilgamiş e. Destan serboriya Gilgamiş, ku dû nemirtiyê (bêdawîtî) ketî pêşanî dide. Navê "Sîmêr" gotinek kurdî ye. Lê belê destanê kurdan bi navê "Memê Alan" jî bûyerek berî Îsa borî ye û gelekî bi nav û deng e.

Di dîrokê de, ji destpêkê û heya îro helbest bi toreyî dî-



A. Balî

L  
Ê  
K  
O  
L  
Î  
N

daktîk, epîk, lîrîk û pastoral tèn bi navkirin.

Di van salên dawî de di kovar û rojnameyên kurdan de bi zimanê kurdî û tirkî lecek li ser "Kî şairê kurd e?" an jî "Ji kê re şairê kurd tê gotin?" heye. Ev leca lecek ne di cihê xwe de ye. Ji bo çî ne di cihê xwe de ye, em ê hinekî li ser vê pirsê rawestin. Bê guman her şair bi zimanê dayika xwe dinivîsîne. Lê belê ziman çî ye? Ziman, di pêwendiyên di navbera mirovan de bi kar tê, dilîn raman û nîşanên daxwaziyên me ji hemiyar re ziman tê gotin. Schiller ji bo ziman dibêje: "*Ziman neynika netewê ye. Gava mirov li vê neynikê mêze bike, mirov di wir de bejna xwe ya rasteqîn dibîne.*" Ji bo welatekî serbixwe, azad û demokratîk rewş wilo ye. Îro welatê kurdan bi darê zorê ji aliyê mêtinkaran ve hatiye dabeşkirin. Heke ziman û çanda gel qedexa be, ma wê bi çî zimanî fêr biba? Li dibistanan zarok bi çî zimanî perwerde bibin, wê bi wî zimanî jî hîn bibin. Di mercên weha de mirov nikare helbestvan awarte bigire. Helbestvan di mercên heyî de xwe dibîne û dinivîsîne. Îro em nikarin mercên Kurdistanê jêr heyî bi mercên Kurdistanê jor ve berhev bînin. Li Kurdistanê jêr ji dibistanên seretayî heta zanîngehê bi salan e zimanê kurdî dixwînin. Ger di van mercan de helbestvanên kurd bi erebî binivîsînin pir şerm e. Loma hemû helbestvanên kurd bi kurdî dinivîsînin û hemû kurd jî jê fahm dikin. Tu kes di vê derheqê de gengeşe nake. Herkes wek hev difikire.

Îro leca heyî li ser şairên Kurdistanê jor e. Li Kurdistanê jor çend şairên kurd hene

hîn îro ew jî baş ne diyar e. Di nava yên heyî de yê bi zimanê tirkî bîr û bawerî û jiyana kurdan nivîsandiye Ahmed Arif e. Pîr mirov Ahmed Arif şairê kurd nahesibînin û wî dikin şairê tirk. Ji wan kesan yek jê Yalçın Küçük e. Yalçın Küçük miroveki zana û dostekî kurdan tê nasîn û di derbarê Ahmed Arif de weha dibêje: "Ahmed Arif şairekî kurd hesibandin û Yılmaz Güney jî sînemavaneke kurd hesibandin ne mumkun e." Li gora Yalçın Küçük "Şair bi ziman ve girêdayî ye. Şairekî ku bi kurdî ne nivîsîne, ne di cih de ye ku ew mîna şairê kurd were hesibandin." Paşê dibêje: "Hewcedariya kurdan jî bi Ahmed Arif nîn e."

Bi rastî gava ku Ahmed Arif helbest nivîsandin, ger weke niha zimanê kurdî ne qedexa bûya, bê guman wî ê bi kurdî binivîsanda. Îro jî jimara kurdên ku bi kurdî dixwînin û dinivîsînin ne zêde ye. Ji bo kesên kurd, ku nikaribin bi zimanê xwe yê zikmakî, bixwînin û binivîsînin, an jî bi gotîneke din ku tenê bi zimanê gelê serdest perwerde bûye, ma em ê wana hemiyar tirk bihesibînin? Îro di dibistanên Kurdistanê jor de bes zimanê tirkî zimanê perwerdeyî ye. Kurd bi zimanê tirkî xwe dînasin û têkoşînê didin. Şairên kurd wek rêheval Kemal Burkay hem bi zimanê tirkî hem jî bi zimanê kurdî helbestên hemdemî û nûjen dinivîsînin. Bi van şairên heyî kurd xwe pê dipesînînin û bi hebûna wan serbilind dibin. Helbest û helbestvan pesinandin û rexne kirin tişteki din e. An jî helbestvanek kurd be, lê belê xwe kurd nehesibîne bi zimanê tirkî ji bo tirkan û çanda wan kar bike, tu kurd naxwazin kesê wilo xwefiro

kurd jî bihejmêrin.

Ji bo van sedeman şairên kurd mirov dikare wilo ji hev derîne, ji bo Kurdistanê Bakur:

a) Şairên kurd ku bi zimanê kurdî dinivîsin.

b) Şairên kurd ku ji bo kurdan bi zimanê tirkî dinivîsin.

c) Kurdên ku şair in, xwe kurd nahesibînin û di xizmeta gelê serdest de winda bûye.

Mirov dikare vê analîzê kêmtir û zêdetir bike. Bi zorê ne nivîskar û ne jî şair çêdibin. Di aliyê çand û hunerê de li hebûna xwe xwedî derneketin ne rast e. Carekê di sinet de "Her tişt bi min dest pê dike" ne

baweriyêke di cî de ye. Ger sinet ji bo gel be û di xizmeta gel de be wê çaxê ew rola xwe ya pêwîst dilîze. Ji bo vê yekê jî divê huner bi serê xwe be û di ser rêxistinan re di xizmeta gel de be...

Heya ku şair û huner xizmeta gel bike ew hebûna xwe diparêzin. Zimanê ku şair bi kar tîne ji bo şair bes pergala baweriyên wan diafirîne. Tiştê herî girîng ji bo şairên kurd ew e, ku di têkoşîna rizgariya gelê kurd de beşdarî û serzêdekirina bîrûbaweriyên wî an jî wê di kar û bar de ye. Rola şairan di jiyana gelan de pir girîng e. Ji bo vê sedemê jî dibêjin: "Gelên ku şairên wan tune ne, ew wek zarokên sêwî ne!" ■

A. Balî di sala 1946'an de li bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Wî li universîteya Ankarayê beşê zimannasî (lînguîstîk) û edebiyat xelas kiriye û deh-duwanzdeh salan li Tirkîyeyê karmendî kiriye. A. Balî di salên 70'an de dest bi xwendin û nivîsandina bi kurdî kiriye. Piştî ku derdikeve derveyî welêt, li Unîversîteya Azad ya Berlinê, beşê siyasî dixwîne. Paşê dîsan di vê unîversîteyê de înstîtuya Îranîstîk di beşê Kurdolojî de digel Jemal Nebez dixwîne. Wî heta niha di warên cihê cihê de ev pirtûkên han çap kirine. Alfabeya Kurdî (1980), Kurdisch Deutsch Fibel (1985), Berevoka Helbestvanên Kurd (1982) Gurê Har û Heft Kar (Çîrok, 1983), Hawar (helbestên kurdî, 1983), Sebra Di Zûlayê de (helbestên bi tirkî, 1984), Navên kurdî, Rêzimana Kurdî, Kîne Em (helbestên Cegerxwîn yê bi jarte bi wergerandina zimanê tirkî, li Stembolê 1991 û 1992 du çap), Antolojiya Helbestvanên Kurd (1992) Gotinên Pêşyan-Metelokên Kurdan (1993)

A. Balî niha li Almaniyayê dijî û bi nivîsandina kurdî mijûl e.

## KEÇİK

Nazim Hîkmet

Ez li deriyan dixim  
Yeko-yek li deriyan  
Hûn min nabînin  
Meriv nabîne miriyan.

Ez li Hîroşîma mirime  
bûye deh salek,  
Keçikeke heft salî me  
Mezin nabin zarokên mirî.

Agir ewil porê min girt  
Çavên min şewitîn, pijiyân.  
Bûme çengek xwelî,  
belav bû xweliya min li ezman.

Ez ji we, ji bo xwe  
Qet tiştêkî naxwazim.  
Şekrokan jî dixwin  
Ew zarokê ku weke kaxizê dişewitin.

Ez li deriyên we dixim  
Xaltî, apo înzayekê bidin.  
Bila zarok neyêne kuştin  
Bikaribin şekroka jî bixwin.


Wergera ji tirkî: Bedîrxan Epözdemir

## Sê stêrên geş di esmanê helbesta nû ya kurdî de


Di civata me ya paşketî de, asteng û kospên di riya jina kurd de gelek in. Di rewşek weha xirab de, helbet, ew nikare rola xwe jî bilîze. Nemaze di karên hunerî de. Lê digel hindê jî, wê xwe havêtiye qada xebatê û kaniye astengan bişkê-ne û ber bi pêş de here.

Belê; di van salên dawiyê de, çend xwişkên jêhatî bi germî dest bi nivîsîna helbestan (Bi zaravê kurmanciya jêrî-soranî) kirine û hindekan dîwan jî çap kirine. Di vê gotarê de, em dê ji-yan û berhemên sisiyan, ji ûpên erebî wergerînin yên latînî û hêviya me ew e bi dilê we bin.

Ji xwe ji helbestên wan xuyaye ku, ji aliyê form û naverokê ve bi serketî ne. Bi zimanekî xweş û sivik hatine nivîsandin û bi wênên ciwan û hevokên dagirtî xemlandî ne. Her wesa bi babetên siyasî, civatî û xemên mirovî ve vehandîne. Di helbestên xwe de, berevaniyê ji doza pîroz a gelê xwe dikin û li dijî adet û rewîştên kevin dirawestî. Daxwaza guherîn û pêşketinê dikin û hewul didin ku, qeyd û zincîrên di dest û piyên jina kurd de bişkênin û wê di bajarvaniyê de bigehînin pileyên bilindtir. Mirov dikare bêje ku, ev helbestvanan cihê şanazî û serbilindiyê ne û pêşeroja geş li benda wan e. Em dê wan li gorî jiyê wan bi rêz bikin, ji ber ku bi baweriya min, ew, di esmanê helbesta nû ya kurdî de, sê stêrên geş in...



Xelil Duhokî



*Jîla Husênî*

## JÎLA HUSÊNÎ

Ew dibêje: “ Ez di sala 1964-an de, li bajarê Seqiz, Kurdistanê pişka Îranê de ji dayik bûme. Di binemaleke olperest û edebdost de jiyame. Min di pazdeh saliyê de mêt kiriye! Lê piştî çar salan, em ji hev cuda bûn. Her ji zaroktiyê min dest bi helbestxwendinê kir. Bavê min, çîrok û serpêhatî ji min re dixwendin, nemaze yên Hafîzî. Hîngê wan helbestan karekî mezin li ser mejî û derûna min dikirin. Bi hizra min, helbest zimanê hest, şadî û xweştiviyê ye.

Ez bawer dikim ku, tevaya jinên kurd helbestvanin û her bi şairî ji dayik dibin. Çînkû her ji zaroktiyê, digel xem, derd, kosp û rondikan dijîn û mezin dibin. Her ji zaroktiyê, wan dinêrin ber çêkirina fers, mafûr û tevinkirinê. Ew bi wê rewşê dibine

hunermend. Jina kurd ji ber giriftariyên jiyane û kosp û astengên civatê, nikare peywendiyê gerim bi edebiyatê ve bike. Helbesta jinê ji ya zela mî cuda ye, çînkû helbesta wê, hewareke xeniqandiye. Ez jî, wek jin dixazim riyekê ji bo derbirîna vê hewarê bibînim. Ew rê jî, bi baweriya min, helbest e...”<sup>(1)</sup>

Ji vê jiyana pirr derd û xemên mîna çiya xuyaye ku, rewşa wê kembax e. Ev e rewşa jina kurd jî destnîşan dike. Helbet di jiyaneke wilo wêran û serûbin de, riya rizgarbûn, berhingarî û xweragirtinê, di riya edebî de ye. Ew helbest û kurteçîrokan jî dinivîse. Em bi dilxweşî dê çend helbestên wê, ji tîpên erebî wergerînîn yên latîni û pêşkêşî xwendevanan bikin.

## AMOJGARÎ<sup>(2)</sup>

Lew kate da şoxe kiçêkî nazdarit,  
Kird be bûkî naw jûreket  
Dexlîlit bim  
Agat lê bê, bûnî pencey min ne bîsê  
Le incan û le ser taq û pencereket  
Eger witû:  
“ Bûnî gulêkî helweriw dête lûtîm”  
Bilê:  
“ Giyane dilniyabe, cige le tu,  
Gulêk niye lem çihane.”  
Nekey nawî min bihênî  
Bextewerî le jûreket bi torênî.

Dilniyabe lew kate da, dilî tasem  
Wek awêney ewîneket  
Wurd... Wurd... wurd şikawe  
Cige le tu, le naw dilma hîç şitêkîtir nemawe

Eger hat û jinêkit dî,  
 Bejni be xem dapoşîwe  
 Çawekanî kiz kiz, kizkiz helgerrîwe  
 Lêwekanî wuşkewe bû  
 Elên beharî nedîwe...  
 Eger hat û be şêwe da, le pîrr minit hate yad  
 Daneçlekê,  
 Nelêy rojê em hejare  
 Le elbûmî yadgarîşma buwe

### MEHABAD QEREDAXÎ<sup>(3)</sup>

Di sala 1966-an de, li bajarê Kifrî, nêzîkî bajarê Kerkûkê, Kurdistanê pişka Îraqê, ji dayik bûye. Ew mîna tevaya zarokên kurd, digel karesat, derdeserî û rûdanan mezin bûye. Nemaze di devera Germiyan de ku, hemî rojê, bi çekên leşkerê faşîstan, dihare wêran û talankirin. Her ji destpêka xwendîngê, eşqa helbestê kete dilî. Yekem helbesta xwe di sala 1979-an de, nivîstî û li sala 1980 ê, di rojnama Hawkarî de, belav kir. Lê her di wî demî de, ew kete zîndanên faşîyan û hîngê jiyê wê çarde sal bû. Di sala 1987-an de, peymangêh bi dawî aniye. Ew kurteçîrok û gotarên edebî jî dinivîse û carcaran wergerandinê ji zimanê erebî jî dike. Di sala 1992-an de, digel hevalê jiyana xwe, hatiye welatê Swêd.

Mehabad Qeredaxî, helbesvaneka jîr, hişyar, xwedan taqet û şîyanên bilind e. Zîrekane, babetên nivîsên xwe ji cergê civata kurdî ya paşdemayî dertîne. Mişe babetên edebî, siyasî û civatî li ser rewşa jina kurd nivîsîne û di rojname û kovarên kurdî de, belav kirîne. Di van salên dawiyê de, bi germî hatiye qada nivîsînê û heta niha ev pirtûkên jêrî jî, gehandîne çapê.

1. Nexşey diwarojî kirêkar, helbest, Hewlêr 1992.
2. Panorama, helbest, Swêd 1993.
3. Koç, kurteçîrok, Swêd 1994.
4. Şax kêlgey genmeşamiye, helbest, Swêd 1994.
5. Danpiyananêkî piyawane, wergerandina 13 kurteçîrokên DR. Newal El Seidawî, ji zimanê erebî bo yê kurdî, Swêd 1994.
6. Rînanî jehrawî, wergerandina şanoyeke Bulgarî ya Vîsîlîn Hançêv, ji zimanê erebî bo yê kurdî, Swêd 1994.
7. Şiir henasey gerdûn e, wegerandina



*Mehabad Qeredaxî*

- çend helbestên cîhanîyên nû. Swêd 1994.
8. Mîdalya, helbest, Swêd 1995.
9. Le pênavî jiyanevey afret da, vekolîn, Swêd 1995.



Em dê çend helbestên wê ji tîpên erebî wergerînîn yên latînî û hêviya me ew e ku, li cihê dilxweşiya xwendevanan bin.

#### NIZA <sup>(4)</sup>

Mergim pêş mergit nekewê  
Dezanîm ger pêş to bimirim  
Nek her eşk  
Herdû gilênay çawîşit heldewerê

Mergim pêş mergit nekewê  
Pêş min bimirî  
Rohî spîm le çawmewe dête derê

Qet be yekîşewe nemirîn!  
Le diway ême...  
Kê cawîdane heyranî  
Xoşewîstî pîroz bilê?

#### GULDAN <sup>(5)</sup>

Ke destewaney asinyan  
Kirde destim  
Pencekanîm bûn be deçle nêrgiz û  
Pênusekem bû be  
Guldân  
Ke şîrekanyan serbirrîm  
Wişekanîm her yekeyan bûn be wulatêkî  
gewre û  
Tênusekem  
Bû be gewretîrîn cihan

#### KEJAL EHMED <sup>(6)</sup>

Di sala 1967-an de, li bajarê Kerkûkê, pişka Îraqê, ji dayik bûye. Peymangeha Saxlemi-



*Kejal Ehmed*

yê li bajarê Sulêmaniyê bi dawî aniye. Her ji sala 1983 ê û vir de dest daye nivîsîna helbestan. Lê di sala 1986-an de, berhem û nivîsên xwe di rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Mişe vekolîn û gotarên edebî, civatî û siyasî belav kirîne. Heta niha nekarîye berhemên xwe çap bike, lê sê diwanên helbestan û vekolînek bi navê (Nêrayetî dinyay kurd û edebî kurdî) ji bo çapê amadekirîne. Her wesa helbestên wê yên hatîne wergerandin bo zimanên farisî, erebî û tirkî jî.

Kejal Ehmed helbestvaneka bi nav û deng e û wê bi nivîsên xwe yên serketî, kariye cihê xwe di nexşa edebiyata kurdî de bike. Her wesa di semînerên taybet de, helbest digel musîkê xwendîne û ev e hunerekê nû ye li Kurdistanê. Wê bi dehan vekolîn û gotarên biha giran li ser rewşa jina

kurd nivîsîne û di rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Ew yek ji helbestvan û roj-namevanên jêhatî û bi hêz e. Em dê helbesteka wê ji tîpên erebî wergerînin yên latînî û me hêviye dilê xwendevanan xweş bike.

## WITEKAN WITIN

Şoreş û gel  
Le sereta da, wek kurr û kiçêk wehan  
Le spêdey rojanî dezgîranî da  
Kurre diroy gewre gewre rêz dekat û  
Kiçeş xewnî rengaleyî bew qisanewe debînê  
Le diway da şoreş û gel; heman kurr û kiç in belam

Debin be jin û mêrdî yek  
Îdî lêrewê dirokî  
Xiyamet û hera û telaq destpê dekat  
( Hizbêk way wit )

Reşeba witî: kilêşey em dinyayem be dil niye  
Hewil edem be wêran kirdin bigorrim  
Pêw wit: Minîş weku to be dilim niye  
Belam demewê be evîn biguncênim  
( Şemal way wit )

Diway şew; şew dêr  
Rojîş şew e  
Belam fanosî xorêkî ciwankîlaney tiya desûtêr  
( Em e qisey şaire, nek şîrnûs )

Rêga nebû  
Wişekanim be qaçaxe rê da hêna  
Teçeyan lê kirdim  
Espêkem berkewt û sebete gulekem rija  
Hawaryan lê kirdim: To kêyt ?

Na... Welamim nedanewe  
Çunke demzanî çek be dest  
Qet le qelem be dest naga  
( Witin way wit )

Çare nebû  
Jenerral xoşewistî xoy  
Bo pepûleyek xwendewe  
Tenanet witi nazanim, min çon detwanim bikujim?!

Lew rojewe; Pepûle natwanê bifrê  
Natwanê bixwat; bixewêt  
Leber ewey dezanê qederî eşq  
Yan Jenerral degorrê be pepûleyekî biçkole  
Yan pepûle; dekat be Jenerralêkî êçgar gewre  
A bem coreş  
Kotayî be yekêkyan dêr  
( Em e qisey Şehrezade )

Le nêwan rêga nebûn û  
Çare nebûn da, pirdêkî dêrin heye  
Ke em serî dinyakeman  
Bew seriyewe debestêr  
Eşqî aza; hemîşe deperrêtewe  
Ke çî aşiqî tirsinok; berdeyam be cê demînêr  
( Nazanim kê bû emey wit )

## ÇAVKANÎ:

1. Kovara Mamostayê kurd, hejmar 13, rûp 35-36, zivistan 1991-1992 Swêd. Gotara Ehmed Şerîfî.
2. Her ew çavkanî, rûp 36.
3. Mehabad Qeredaxî, berhem û jiyana xwe ji me re hinartiye.
4. Mehabad Qeredaxî. Panorama, dîwana helbestan, rûp 178. Swêd 1993.
5. Her ew çavkanî, Rûp 83.
6. Kejal Ehmedê, berhem û jiyana xwe ji me re hinartiye.

## TU ÇAWA YÎ?

Î. Omerî

Di nav ar û pêt de dijîm  
Hevala min tu çawa yî?  
Bi kul û derdên xwe digrîm  
Delala min tu çawa yî?

Hezar sal in li ser te ceng  
Hatî kuştin mêrxas, leheng  
Cejn û newroz diçin bê deng  
Sersala min tu çawa yî?

Şêr û şepal in li çolê  
Li Serhedê li Torê  
Sed seg berdane dorê  
Şepala min tu çawa yî?

Şar û gund giş wêran kirin  
Jiyan li me zîndan kirin  
Der û hundir talan kirin  
Bermala min tu çawa yî?

Dema ku ez te nabînim  
Hêsrên çavan dibarînim  
Bi qerpalan dimalînim  
Destmala min tu çawa yî?

Lê pêş çavê Bro Omerî  
Agir berdan rêl û devî  
Teba, tilûr jê direvî  
Xezala min tu çawa yî?


Xwezî bi roja te bikim bûk  
Hine bikin dest û neynûk  
Bigerînim li şar û sûk  
Bêmalala min tu çawa yî?

# Helbest û helbestvan

Sernivîsa vê nivîsê kanîbû "pîrsên edebîyata kurdî" ba. Lewra em ê qala edebiyata kurdî bikin. Pîrsên helbesta kurdî û pîrsên edebiyata kurdî kêm zêde weke hev in. Lê wê çaxê hewceyî xebateke firehtir dikir. Ew jî ne armanca vê nivîsê ye. Ji wê yekê em ê di vê nivîsa xwe de helbest û helbestvan bikin mêvan.

Bêgûman mirov ji bo tarîfa helbestê nikare reçeteyekê bide. Lê belê ev nayê maneya ku mirov nikare helbestê tarîf bike. Di dema modern de, di warê zanistî de ji bo mirov tiştekî tarîf bike, hîn bêtir, alim, ji dêvla pîrsa "ev çiyê?", "ev ne çiyê?" dipîrsin. Em ê jî di vê nivîsa xwe de vê metodê bi kar bînin û em ê pîrsa helbest ne çiyê bikin.

Berî her teşî; divê mirov çar hevokan li dû hev binivîse, mirov li bin hev binivîse, wî tiştî nake helbest. Tê bîra min, wexta ku em zarok bûn, me şekirê pêçayî dikirî, me şekir ji hundirê kaxezê derdixist, dixwar û ew kaxiza ku çarînen "ecêb" lê bû, dixwend û davêt çopê. Bi rastî îro hinek ji me kurdan hene di bin navê helbestê de çarînen wilo "ecêb" dinivîsin û bi wê nasekine, dikin pirtûk û diweşînin. Li ser kaxezên wan şekirên me yên zaroktî de, weke mînak tiştên wilo dihatin nivîsandin: "*Hela were yara min. Ez bi qurbanê cana min*". Îro gelek kurdên xwedî pirtûk,



Can Gülşenoğlu

L  
Ê  
K  
O  
L  
Î  
N

helbestên wan, ji wan hevokên li ser kaxizên şekir ne pêşdetir in.

Mumkun e destpekek wisa hinekan "nerêhet" bike. Mumkun e hinek xwendevan jî bêjin "ma hewce ye mirov qala van tiştan bike. Ji xwe herkes bi van tiştan dizane". Lê belê ez bi xwe ne di wê baweriyê de me. Ger wisa ba, ji bo çî hîn tiştên weha tîrê nivîsandin.

Niqtaq din; mirov dikane bêje, hinek gotin hene ji dîroka mirovayetiye vir da, di warê edebiyat û huner de û bi taybetî di warê helbestê de weke gotinên "joker" tîrê bikaranîn. Vana, weke minak: Roj, çiya, heyv, ceng, şer, aşitî, gul, bilbil, yar, şev, tîrêj, xewn, tarî, ronî û wd.

Gava mirov helbestan binivîse, îro jî mirov kane wan bi kar bîne. Lê mirov nikare bi alîkariya van gotinên "joker" helbestan ava bike û weke mirovekî qels û bêçare xwe bavêje dava van gotinan.

Dîsa hinek berhem hene ku di her sedsala mirovayetiye de li gor dema xwe berhemên bi rûmet bûye û hagisa gel ya kolektîv teşkîl kiriye. Ev berhem wilo li qada şer, li ser mîrxasiye hatine afirandin; carna bangeke evîne ye ku evîndarekî ji yara xwe re pêşkêş kiriye û carna tiştên tasawufî ne, evîna qûl ku ji bo Xwede tîne ziman e. Ev berhem carna him ji hêla naverok û him jî ji hêla estetîk gelekî hêja ye. Lê carna jî qels e. Lê çawa dibe bila bibe, li gor dema ku tê de hatina afirandin mirov kare wan berhemên edebî û hunerî bihesibîne. Îro ducar kirina van berheman an jî teqlîdên wan ne helbest e...

Hinek berhemên ji hêla naverokê bi ma-

ne û ji hêla estetîk de bê şikil tê afirandin û weke çukolata pêşkêş bazarê dibe û ev gotinên bi mane ji teref hozanan dibin musîk û li xelkê belav dibin...

Baş e... Ez naxwazim serê we hîn bêtir biêşînim. Madem ku em helbestan dinivîsin helbestvanî, mirov kare bi alîkariya helbestvan, helbestê jî tarif bike. Em bi helbestvan dest pê bikin.

Niqta yekem û ya herî girîng, bi xwendineke pir, bi xebateke zêde mirov nikare bibe helbestvan. Bi xwendinê, bi xebatê, bi kedeke bê sînor, mirov kane bibe, doktor, muhendîs, mamoste, profesor û her tiştê ku mirov dixwaze. Lê mirov nikare bibe helbestvan. Helbestvan jî, weke muzîsyen, weke wênevan hinek qabiliyet, hinek xisûsiyet bi xwe re tîne. Mirovekî ev qabiliyet bi wî re tunebe, ew çiqas bixebite bila bixebite, ew nikare bibe helbestvan.

Niqta dudan; dibe ku ev qabiliyet, ev xisûsiyet hebe jî dîsa mirov nebe helbestvan. Çawa ku bi (yetenek) mirov nikare bibe helbestvan; qabiliyet, bi tenê, bi serê xwe mirov nake helbestvan. Divê ev potansiyela naturel bi tiştin din bîrê temamkirin. Lewra dibe heşgirtiya (duyarîbûn) helbestvanî bi mirov re hebe, lê mirov li ser vê bingehe zanabûnek kûr û fireh ava neke. Ger mirov nebe xwedî filosofi; xwedî nerînek sistematîk ya dinê mirov dîsa nikare bibe helbestvan...

Niqta sêyemîn, helbestvan; evîndarê spehîtiyê ye û her tim ji spehîtiyê hîn spehîtir heye. Anê, ger kesê din berhemên wî bicebîne jî ew zû bi zû berhemên xwe nacebîne... Ew zêrkerê gotinan e, bi ferqekî,

zêrker tenê li ser zêr dixebite, li dinya helbestavan firehtir e. Gava helbestvan ji berhemên xwe razî be ewê di paşda here, bi vê manê, helbestvan ji her kesî bêtir birçiyê spehîti û başbûnê ye...

Helbestvan weke herkesî nabîne, weke herkesî nabêje... Ji xwe weke herkesî bibîne û bibêje, nabe helbestvan. Helbestvan zimankî xwe yê taybetî heye ku ji zimanê rûyê erdê giştî cihêtir e, ev ziman: bi helbestvanî ye... Helbestvan xwediyê qudreta bi tiştan re (bi daran re, bi avê re, bi tavê re) bipeyive û tiştan bipeyivîne jî... Weke mînak gelek mirov di zîndanên de mane, lê pîrr, kêman weke Ahmet Arif bîr birine bi tiştan re bipeyive û waha bêje: "*Haya te jê heye diwarêji kevir, deriyê hesinî, pencera kor...*"

Baş e... Em bi tarîfa helbestvan, gihîştin tarîfa helbestê jî. Ne hewce ye mirov dubare bike; gava ku ev xusûsiyetên helbestvan tene ziman, helbest derdikeve holê... An, helbest, tiştên dixwaze bêje dûz nabêje, an "imge" bi kar tîne an jî gotinên wî ji hêla semantîk ve gelekî kûr e.. Lê belê ez naxwazim bêjim ku helbestvan tiştên fahm nabe dibêje, an jî naxwaze kes wî fahm bike. Ji xwe her tiştê fahm nebe jî ne helbest e... Ne helbest e û ne jî helbestvan xizmetkariya tu kesî û tu tiştî nake... Hebest ne pergale û ne jî armanc e. An, him pergale, him jî armanc e. Bi kurtayî helbest ewqas bi esle ku; nikare xizmetê bike. Tenê dikane rêhevaltiyê bike; hevalbendiyê ji peveçûnê re, ji têkoşîna mirovayetiye re bike. Ji wê re jî ne xizmetkariyê lê rêhevaltiyê bike. Pêşveçûna mirovayetiye rê li wê vedike, ew

jî rê li pêşveçûna mirovayetiye vedike. Helbest; ew hewa ku tekoşînê dide wê estetîze dike û bi şûnda dide civatê û dixwaze wê bike malê hemû mirovayetiye. Helbestvaneke fonksiyon û karê xwe dizane; di nava welatê xwe û dinê de weke pireke ye, weke qasidekî çandî ye...

Armanca vê nivîsê ne ew eku şîretan li kesî bike, ne jî mamostetiye bike... Lê ji bo ku van rojan gelekî qala ronesansê dibe, me nivîsandina vê nivîsê ji xwe re mîna berpirsiyariyekê dît. Çawa şer hostatiyekê dixwaze, zanebûna estetîka şer pêwîst e, di warê edebiyatê de jî hostebûn û estetîk pêwîst e. Çawa mirov di warê çekan de çiqas xurt be jî mirov nikare bi ser bikeve; di warê edebiyatê de jî, mirov xwediyê çandekê çiqas dewlemend be jî bê hostabûn, bê estetîk mirov nikare tiştên baş biafirîne. ■

# Mirov çawa helbestan dinivîsîne

Mayakovskî

II

W  
E  
R  
G  
E  
R



**B**i baweriya min, helbesta min Ba bi navê “Ji bo Sergey Yesenîn”, yek ji wan helbestên min ên dawiyê ku gihaye armanca xwe ye û di vê derheqê de balkêş e.

Min ji bo çapkirina vê helbestê hewcedariya ku bi xwe li kovarekê ya jî li çapevanekî bigerim nedît. Berî ku bê çapkirin, kopiyake destnivîsa min, ji bo ku bikaribin di rojnameke melbend de zû çap bikin, ji redaksyonan hatibû revandin. Guhdaran bi xwe dixwestin ku ji wana re zûtir bê xwendin. Dema min helbest dixwend, di bêdengiya ku hebû de, vizîna mêşên ku difirriyan dihat mirov û bi dû re jî çepikan dest pê dikir. Xelkê, bi dû re xwe aciz dikir û ya jî dihatin li korîdoran kêfxweşiya xwe diyar dikirin û ez

pîroz dikirim.

Ez çawa li ser vê helbestê xebitîm? Min çawa çêkir?

Min Yesenîn berî niha bi deh dozdeh salan nasdikir.

Dema min cara pêşî ew dît, soleke ku pirtirîn dişibiya çaroxan di nigên wî de hebû û îşlikekî bi selibên biçûk neqîşandî lê bû. Di apartûmaneke Lenîngradê de em li hevdu rast hatin. Min cara pêşî wê çaxê dît bê gundiyeke xas ku qet ne dekoratîv e, ji bo ku xwe biguhere, dikare bi çi kêfxweşiyê bedlan bi ser şimikan de li xwe bike. Min ev ji Yesenîn bi xwe hêvî ne dikir. Bi rabûn û rûniştina xwe dixwest ku xwe wek mirovekî din bi min bide naskirin û Yesenînê rast ji min veşêre. Ji bo ku xwe wilo biqapan bike, li gora wî heqê wî hebû, ji ber ku hinek helbestên xweş nivîsibûn û nav dabû. Ji bo kirîna solên baş rûble ketibûn bêrikên wî, lê çûbû ew tiraga ku pê nediket wek tişteke bedew hîlbijartibû û kirîbû. Bi min ecêb hat.

Min wek yekî ku di dema xwe de ew îşlikekê zer ê tewtewan li xwe kiribû û êdî terkiribû, awayê lixwekirina wî ecêb dît, ji min re bû mereq, min xwe ne girt û min jê pirsî:

– Te ev hew ji bo reklaman li xwe kirine, ne?

Dema Yesenîn bersiv da, dengê wî, wek ku lempeyêke Îkonan can pê hatibû û dest bi axavtinê kiribû bû, lê dohnê wê dikir ku biqede, derdiket.

Li gora ku tê bîra min, tişteke wilo got:

–Em gundî, we bajariyan fam nakin... em bi awayekî din in... bi awayê xwe ne... em

xwediyên adetên xwe yên kevnare ne...

Me futûrîstan eşkere neyartiya helbestên wî yên gundîtiyê dikir.

Yesenîn xortekî ku hinekî sivik bû, lê he-ta wê çaxa min ev yek jê pirsî jî, cixweş xuya dikir. Dema em derketin derve, min xwe negirt, min jê re got:

– Ez şert digirim ku tu dê vî babetê lixwekirinê û van şimikan biterikîn!

Yesenîn di bersiva ku da min de, bi xeyd diyar kir ku ne xwebera min e. Klyûyev li ba me bû, wek dema ku dayikek dizane ku keça wê him ne xwediyê wê taqetê ye û him jî ew cegerê ku dest hilîne pê re nîn e, loma jî ji bêgavî keça xwe ya bê edeb ji pe-  
vçûnan dûr dixê, Yesenîn ji min dûr xist. Ji ber ku zanîbû Yesenîn, bi dest û lepan nikare di ber min re bajo, ew girt.

Yesenîn xwe cixweş kir lê min di ber re neajot. Min bi dû re nema ew dît. Heta rojêke piştî soresê bû, ez li mala *Gorkî* lê rast hatim. Min nû ew dît, min bi dengê xwe yê ku ji çêbûna min de bilind e, bankir:

– Yesenîn te şert wenda kir. Waye çakêt li te ye û qerewat di stûye te de ye.

Yesenîn dîsa aciz bû û xwe xeyidand.

Bi dû re, di helbestan de ez li Yesenîn rast hatim, bêkêr bûn. Min nikaribû helbestên wî qebûl bikim. Tiştin wilo bûn:

*Ezîzê min, ezîzê min, bêaqilê ecêb...ûhw.*

*Ezman saetek e, hîv jî gurover e, zengilê wê ye...ûhw.*

Yesenîn bi dû re ev babet gundîtiya eşkere berdabû, lê ew jî ne bê fiyasko bû:

*Dayika min welatê min e,*

*Ez bolşevîk im...*



Bi dû re helbesteke wî ji bo pesinandina çêlekê derket. Ji bedêla xwestina "peykerê Marx" ve, avakirina peykerê ji bo çêlekê dixwest. Ne çêleka ku mirov şîr jê didoşe, lê çêlek wek sembol, yeke ku poşan dide lokomotîfa tirênê.

Em futûrîst û Yesenîn gellek caran ketine qirika hevdû. Me bi pirranî, ew ji bo xeyalperestiya ku bi awayekî pirr êşkere di berhemên wî de hebû, rexne dikir.

Yesenîn bi dû re çû Emerîka û ciyên din dîtîn. Di derheqa helbesta nûjen de bi baweriyeye êşkere vegeriya, hinekî hatibû guhertin û nêzîktirê me bûbû.

Lê wê dema ku Yesenîn ne li welêt bû, mixabin navê wî di nav nûçeyên ku di derheqa helbestvaniyê de derdiketin de, dernediket. Navê xwe bi carekê re û pirr zû ji rêza navê helbestvanan (mebesta min, kirina wan tiştên mînimûm ku ji helbestvanekî dihat xwestin e) derxistibû.

Lê min bi xwe di wê demê de çend caran Yesenîn dît. Hevdûdîtina me, bê sedem her carê bû şîndarî û dilhiştin.

Lê divê ez bêjim ku min bi bextiyarî dît ku guhertinên pêşketî di Yesenîn de bûn; ji xeyalperestiyê, bûbû yek ji endamên VAPP (Yekîtiya Nivîskarên Proleter ên Rûsya Tevî).

Yesenîn bi mereqdarî di derheqa helbestên xelkê de diaxivî. Mîrov taybetiyeye din jî di Yesenînê de bi qapan de didît: çavnebariyeye wî li hemberî hemû helbestvanên ku organîk bi şoreşê û çîna karker ve girêdayî bûn û di derheqa pêşerojê de xwediyên hêviyên mezin bûn, hebû.

Bi baweriyaya min bingehê bêhtengî û

gazindariya helbestvaniya Yesenîn ya li hemberî wî bi xwe, di vir de ye. Ev gazindariya wî, bi alkolê û hevaltiya wî ya bi derdoreke bêedeb û nezan re, her ku diçû xerabtir bûbû.

Çend salên dawiyê sempatiya Yesenîn bi awayekî êşkere ji me LEF-îstan re hebû: diçû mala Aseyev, telefon dida min û bi ser me hemûyan de diçû û dihat. Fedîbûna xwe hilanîbû û bûbû wek yekî ji me, lê dîsa jî xwediyê jiyaneke Yesenîntiya berê bû.

Dema min ew cara dawîn dît, ez di derheqa wî de bûm xwediyê baweriyeye bêşik a neyînî. Li Çapxana Dewletê beşa muhasêbê ez lê rast hatim. Rûyê wî werimî bû û ber bi min de bazdida û dihat. Qerewata wî di stûyê wî de xwar bibû û şevqa wî jî yanî hima li ser serê wî bû, dikir bi aliyekî de bikeve. Dema ew û destbirakên xwe (li gora baweriyaya min) yê ecêb nêzîkî min bûn, bêhna votka ji wan difûriya. Ez bi rastî bibêjim min Yesenîn bi zahmetî nas kir. Min xwe bi zorê ji wana xelas kir. Taxakî kaxetên deh ruble li ber bêvila min dihejand û rû li min datanî, dixwest ku ez jî bi wana re herim û hinekî vexwim. Ew sûretê wî yê ku bi votka kereh bûbû, heta êvarê ji ber çavên min nedîçû. Êvarê ez bi hevalên xwe re axivîm û min got ku divê mirov alîkariya wî bike. (Lê mixabin tiştên wî her demê bi biryarekê dawî lê tê.) Me hemûyan bi awayekî li xwe amin gazin ji "derdora wî" kirin. Lê em di baweriyaya ku divê hevalên wî yê rojane alîkariya bikin de, ne wek hevdû difikirîn.

Bi dû re diyar bû ku ez ne neheq bûm. Mirina Yesenîn ez pirr êşandim. Lê mirina

wî him ne dûrî aqilan bû û him jî ne ecêb bû. Min êvarê bihîst- bêguman wê şîna min a ji bo wî berdewam ba, lê dîsa jî heta sibehê wê hinekî siviktir biba. Lê serê sibehê rojnaman bi van rêzên ku Yesenîn berî mirina xwe nivîsîbûn, mirina wî eşkere kirin:

*Di jiyane de mirin ne tiştekî nû ye  
lê jiyana bi xwe jî ne tiştekî nûtir e.*

Piştî van rêzan, êdî mirina Yesenîn bûbû pirsgirêkek edebî û civatî. Ne pirr dereng xuya bû bê çiqas mirovên ku pêwîstiya wana bi şîreke wilo hebû derketin, vê helbestê bi xwe dilê gellekan bijand şerîtan û demaçan. Di tu rojnaman de maqale û analîzên ku bikaribin vê helbestê pûç bikin, derneketin. Ez tê gihiştim ku mirov hew dikare û divê bi helbestekê şerê vê şîretê bike.

Bi vî awayî, hemû helbestvanên welatê Yekîtiya Sovyetan li ser daxwaza civatî ketin bin vatîniya ku helbestan li ser Yesenîn binivîsin. Ev xwestineke zû, di cî de û bedew bû. Ji ber ku van rêzên Yesenîn tesîreke mezin kirin û qet şaş derneketin. Gellekan gaziya wî rast dîtî û dan dû wî.

Lê ma mirov dê çi binivîsanda û pûç derxista? Mirov dê çawa binivîsanda?

Helbest, maqale, bîranîn, nivîsên giramgiriye û heta bi dramana ji bo wî hatin nivîsandin. Bi baweriya min ji sedî 99 tiştên ku di derheqa Yesenîn de hatin nivîsandin, quretî bûn û quretiyên xerab bûn.

Helbestên hevalên Yesenîn békêr in. Mirov wan babet gotinên rojane nas dike. Xwe gellekî nêzikî wî hesab dikin û jê re “Seryozya” dibêjin. (Bezîmenskî bi xwe jî

ev gotina bê xêr ji deverinan girtiye û bikar aniye.) Bûyereke lîteraturî bi navê “Seryozya”- tune ye. Helbestvanek heye- Sergey Yesenîn e. Min hêvî dikir ku em ê di derheqa wî de qise bikin. Mirov bi gotina “Seryozya” ku mirov di nav malbatê de bi kar tîne, ji wê daxwaziya civatî û çareserkirina xeterê bi dûr dikeve. Gotina “Seryozya”, temayeke mezin û giramîgirana, erzan dike, dadixe û dike çarînek helbestan, ya jî dike wek klameke kevînar. Hêstirên ji helbestvaniyê alîkariya tu tiştekî nakin. Ev helbestên wilo, bi hêla xwe ya lîrikî tu tesîreke baş nakin. Hew dibin sedema pêkenî û aciziyê.

Piştî mirina Yesenîn, hinek “dijminên” wî jî li dora wî civiyabûn. Helbestên ku wana bi xwe jî ji bo Yesenîn nivîsîbûn, ew babet helbestên keşan ji bo xwendina li ser tirban bûn. Ji ber encama xwekuştina wî ya eşkere, bi van babet helbestên veşartina wî, dixwestin xwe jê pak bikin:

*Lê xwekuştina bi vî awayê keleşan  
me qet ji te hêvî nedikir...*

(Zyarov, texmîn dikim)

Ev babet helbestên wilo, eşkere dikin ku nivîskaran ecele li xwe kiriye û daxwaza civatî şaş fam kirine. Armanç ji metodê bi dûr ketiye, armanç pê re nema ye. Di vê rewşa şîndar de stîla henekpêkirinê qet ne tiştekî biheq e.

Ji naveroka rewşa xwekuştinê ya tevlihev a civatî û psîkolojîk dûrkerî ye. Bûyerê hew bi zalimiya wê bîstikê, bi negatîvîzma bêsedem û qelp (heger ku ne wilo ye çi ye?) eşkere dikin.

Hemû nivîs û helbestên ku di vê derheqê

de li ser Yesenîn derketin, bi kêrî ku rê li ber wê xetera ku helbesta Yesenîn a dawîn bi xwe re anîbû bigirin, nedihatin.

Heger mirov ji Kogan dest pê bike... bi baweriya min ew camêr ne li gora Marks fêrî marksîzmê bûye, lê kiriye ku Marksîzmê ji Lukayê Gorkî fêr bibe: “kêç hemû ne xerab in, lê hemû reş in û xwe çeng dikin”. Ew bawer e ku ev bê şik rastiyeke zanistiye, objektiv e. Loma ji piştî mirina Yesenîn bi nivîseke bêxêr, bi awayekî ku tu feyda wî tê tune, radibe wî dipesînîne. Nivîsên ku di vê derheqê de derketin, bi pirtûkên Krûçenîk ên bêhnpekêti diqedin. Wek ku Krûçenîk jiyana xwe hemû di zindanan de buhartibe û ji bo azadîyê êş kişandibe, Yesenîn fêrî zaniyariya siyaseta bingehîn dike. Ên ku nizanin, wê bêjin qey ew şeş pirûkên biçûk ên li ser Yesenîn, bi destekî ku hîna dewsa zincîran lê xuya dikir, bi zahmetiyên mezin nivîsîne û êş kişandiye.

Baş e, divê ez çi û çawa li ser Yesenîn binivîsim? Piştî ku min ew xwekuştin ji hemû hêlan ve da ber çavan û bi tiştên wekî din ku min zanîbûn jî xwedî kirin, min bûyer analîz kir û min vatiniyeke wilo da xwe:

Armanç: bi carekê re pûçkirina tesîra helbesta Yesenîn a dawî ye, rakirina balkêşiya li ser mirina wî ye. Û her wilo divê ez bikaribim xweşiyeke din têxim bedêla wê xweşiya ku li gora Yesenîn di mirinê de heye. Ji ber ku di vê dema şoreşê de, ji bo ev xebata ku ji bo mirovatiyê dest pê kiriye, bikaribe biser bikeve, pêwîstî bi hemû cewherên me heye. Bê guman heger ev kar karekî sext be jî, heta ku em bigihin komunîzmê avabikin, NEP fedekariyên mezin jî ji me dix-

waze, divê em bêhêvî nebin û nehêlin ku xwestina jiyane di dilê me de vemire.

Bi vî awayî, aniha bingehê helbestê amadeye, êdî formulekirin hêsan e. Lê berî ku ez dest pê bikim pirr sext bû.

Destpêkirina min û rêwitiyên min ên ji bo karên girîng, ketin demekê. Sê mehan, her rojê ez carê dîsa lê vedigeriyam, lê min nikarîbû tişteki bikêrhatî pêda bikim. Bêkeysîyek derketibû pêşiya min û ez ji nav dernediketim. Dema sê meh derbas bibûn, min hîna jî xetek li hevdû neanîbû. Min hew ji axaftina rojane çend gotinên bi aheng hilibijartibûn. Dema ez vegeeriyam Moskoyê, min tê derxist ku sextiya ez dikişnim û derengketina min, ji ber taybetiya temayê û rewşa min bi xwe ye.

Otela min, her ew otela her rojê bû, xetên avê ew xet bûn û tenêbûna min a ji bêgavî jî, ew tenêbûn bû. Her rojê ev tişt bûn.

Rewşa min li ber min xitimibû, girêk lê ketibûn; ne his û xwestin dida min û ne jî ew gotinên ku ez bikaribim pê qalî bibim û bingehêki bavêjim dihatin bîra min.

Mirov dikare bêje ku pîrensîbek ji bo wilo jî heye: di rewşên wilo de, ji bo ku mirov bikaribe berhemeke helbestvanî biafirîne, guherandina cî û wext pêwîstiyek e.

Ji bo numûne, di wênevanîyê de wilo ye. Dema hûn ê tabloya tişteki çêbikin, divê hûn navbêreke ku bi kêmasî sê qatan hebe têxin nav xwe û tiştê ku hûn dixwazin bikin tablo. Heger hûn wilo nekin, bêşik hûn ê nikaribin wî tiştê ku hûn dixwazin bikin bingeha tabloya xwe bibînin.

Bûyer, ya jî tiştê ku mirov dê bike wêne,

çiqasî mezin bin, ji bo ku mirov bikaribe baş bibîne, divê nabêr jî ewqasî fireh be. Kesên reben, bi hêviya ku bûyerê bi dû re bikaribin bikin wêne, heta ku bûyer bi xwe bê û di ber wana re derbas bibe, li ciyê xwe radiwestin. Lê yên zîrek, ji bo ku bikaribin wextê ku şahidê bûyerê ye hemûyî zeft bikin, derdikevin pêş û bi bûyerê re dibezin.

Dema ew kesên ku di nav bûyerê de ne, bûyerê analîz dikin, analîzeke kêma derdikeve û bi piranî ne bi awayekî ku mirov bikaribe baş pê bawer bibe ye, yekhêl e. Her demê wilo bûye.

Pirr êşkere ye ku karekî wilo divê bibe ber û encama du faktorên— agahdariya mirovên ku bi xwe di nav bûyerê de bûn û encama xebata hunermendên pêşerojê a li ser wan agahdariyan.

Em ê îcarê li tirajediya nivîskarên şoreşger binerin: bêguman mirov dikare protokoleke ku diçirîsîne bi dû xwe de bihêle. Ji bo numûne wek “hefteyî” ya Libedînskî. Mirov dikare di derheqa bûyeran de derewên bêkêr bike û bûyerê bide nasîn. Lê heger di wext û cî de navbêr tunebe jî, mirov bi kêmasî dikare navbêra di serê xwe de bibêrîne.

Rojmamevan li ser navê giramiya ku di din “helbesyvanîyê” û ji bo ku xwedêgiravî dixwazin agahdariyên rast ji dîrokê û rojnamevaniyê re bihêlin, berhemên Rabkor ên civandî bi navê “Pelên Serê Şaxan” çap dikin. Lê bi karekî wilo xisareteke mezin di din helbestvaniyê bi xwe. Di wir de rêzên wilo hene:

*Ez topeke proleter im  
bi paş û pêş de dirêşnim.*

Heger ev aqilmendî bê şirovekirin: 1) Divê em hêviya ku em ê bikaribin di kozikên şer de “tenûsa sirûdan” wek ale bihejînin, terk bikin— çî cawê ku li wir heye, hemû tê çirandin. 2) Dema şoreşê, divê buhayê materyalên bingehîn (raporên nûçevanên gundan jî) bilind bînin nixkîrin; bi kêmasî bi qasî “berhemên helbestvanî” bin. Helbestên ku di ecelê de tên xweşkirin, materiyan dixesînin û sûretekî ne rast didin. Pirtûkên xwendegehîyê, ên di derheqa helbestvaniyê de, ku Sengell’kî ne, ne baş in û bi xisar in; ji ber ku helbestvaniyê ji materyal, yanî ji rastiya ku tê de ye, dûr dixê. Ew babet helbest, ji bo ku mirov bikaribe wî ruhê ku di bûyeran de veşartî ye, wî ruhê ekonomîk êşkere bike, rastiye û agahdariyan bi hevdû ve nacebirînin. Usûleke kevnar, ji bo naverokeke nûjen tê bikaranîn. Gellek caran usûl û naverok li hevdû nayên: ya naverok wek kêçeke ku di şal de wenda dibe ye, ji bo numûne çarînen Radîmov. Çarînen wî wek kudikên berazên Yunaniyan in, ji bo ku mirov bikaribe “Îllîada” binivîse baş in. Ya jî naverok ji kirasê xwe yê helbestvanî direve û dibe qeşmerî. Ji bo numûne, dema “matrosên” Krîllov bi awayekî çarrêz, bi amfîbraşên çep û rast dikevin rê, wek şerkerên ku şalên fetiqî li wana ne, xuya ne.

Dema mirov bixwaze cî biguhere û bikaribe neverokê bibîne, nabêr pêwîst e. Ev nayê maneya ku dema wext dibuhure, divê helbestvan li ber qeraxa deryayekê rûnê û li bedî hewake xweş be. Divê helbestvan bi wext re be, pê re bimeşe û temaşevanê bûyeran be. Dema wext hêdîka bimeşe, mirov

dikare guhertinên ku di dorhêlê de dibin têxe bedêla pêşketinan. Di rojêke ku bilez di ber mirov re dibihure de, mirov dikare sedsalên ji xeyalan bişî.

Di berhemên ne pîrr mezin de mirov divê û dikare guhertinên bi vî awayî ava bike. Ji xwe tê kirin jî.

Heger bi rastî mirov bêriya gulanê kiribe û bixwaze di derheqa gulanê de helbestekê binivîse, divê mirov çiriya paşîn, ya jî çileyê pêşîn dest pê bike.

Heger mirov dixwaze di derheqa nazdarî asayiya jiyandê de binivîse, divê mirov ji Meydana Lubyankaya otobusa xeta 7-an bigire û here Meydana Nogîn. Ew hajan-din û çelqandina xerab ku di otobusê de tê serê mirov, xweşiya jiyaneke din ku ew ne wilo bi xwe ye û lê hêja ye dide mirov. Divê mirov ji rewşeke ku mecala mirov bikaribe du tiştan bide ber hevdu, dest pê bike. Divê mirov bikaribe rewşeke wilo bi dest bixe.

Ji bo ku berehemeke nivîsandî jî bistewe, pêwîstî bi wext heye. Ew helbestên ku ez ji bo temake ji nîfşê ve peyda dibe dinivîsim, dema xwestina min a nivîsandinê bilindtirin e û ez bi dilxweşiyeke mezin jî dinivîsim, roja bi dû re ez tê derdixim ku deverin jê bi kêr nayên, berhem kême e û yekalî ye. Her demê tiştekî ku ez dixwazim biguherim tê de heye. Ji ber vê yekê, dema ez berhemekê xelas dikim, ez çend rojan di çaviya masa xwe de hiltînim. Bi dû re dema ez nû radihijim kaxetê, tiştên ku berê ji ber çavên min filitîbûn û şaşiyên ku di berhemê de hene, ez zû dibînim.

Ev nayê maneya ku mirov nikare helbes-

tan di wextê hewce de binivîse û eşkere bike. Na, ne wilo ye. Ez dixwazim bêjim ku divê mirov wexta rast bigire. Ez dixwazim bînim bîra helbestvanan ku nivîsandina helbestên ajîstasyonê ne hesan e, divê bala mirov hemû li ser be, dema mirov dinivîse ji bo ku mirov bikaribe rê li ber şaşiyên xwe bigire, divê mirov şiyar û çarçav be.

Dema mirov ji bo ajîstasyona di rewşeke pîrr bi lez jî dixwaze tiştekî amade bike, divê mirov vê metodê, wê şevê bi xwe bikar bîne û nehêle heta sibehê. Heger mirov sibehê jî çavekî biavêjê karên êvarê, mirov dibîne ku gellek tişt dikarin baştir bînin avakirin. Heger mirov wê sibehê dest bi nivîsandina wî tiştî bike, wê piraniya wan şaşiyên li ser kaxetê bimînin. Fêrkirina peydakirina taqeta xwestina jê bi dûrketin û organîzekirina wext (ne a çarîn û trokiyan), divê wek prensîp di her pirûka perwerdekirina afrandina helbestan de hebin.

Sedema ku min di nabêra kuşa Lubyanskî û çayxana li Myasnîtskaya de, (ez çûbûm ku ez çayê bikirim) ji hemû rêwîtiya xwe ya din bêtir lez li nivîsandina helbesta di derheqa Yesenîn de kir jî, ev bû. Myasnîtskaya ew dera ku min tiştên pîrr li dijî hevdu lê dîtî bû: piştî tenêbûna li odeyeke otêlê, êdî deryayeke ji mirovan dihat, piştî melbendiyê, êdî girgir û nûjentiya otobusan, tirimpêlan û tramwayan dihat. Û li der û dorê jî, elektrik û teknîkê xwe wek xeterekê şanî gundîtiyê dikirin.

Ez dimeşiyam û min destên xwe dihejandin û bêyî ku ez tu gotinan bibêjim, min di ber xwe de dikir pin pin. Geh ji bo ku ez deng xerab nekim min gavên bi hêdîka di-

avêtin û geh jî min bi gavên xurt re, xurttir dikir pin pin.

Bi vî awayî, aheng hat avakirin, rîtm û bingehê dengên helbestê, tev li hinek dengên xerîb dest pê kirin û derketin. Îcarê mirov hêdî hêdî karîbû hinek gotinan di nav girînê de fam bike.

Di rewşên wilo de, hinek gotin ji tiştên ku hatibûn bîra mirov, tên ji bîrakirin û bi dû re nema tên bîra mirov û hinek jî di bîra mirov de dimînin, lê tên guhertin û tewandin û deh carekî xwe digirin, heta mirov tê der dixê ku gotinê ciyê xwe girtiye (ev his bi tecrubeyan xurttir dibe û jê re huner tê gotin). Gotina ku pêşî di serê mirov de dimine, pîrê caran ew gotina bingehîn e, ew gotina ku ramana di helbestê de hildigire ye, ya jî ew gotina ku dê aheng li ser bê avakirin e. Gotinên din jî hêdî hêdî derdikevin û li gora mana wê gotina bingehîn ciyê xwe digirin. Dema bingeh bi vî awayî hat avêtin, mirov ji nîfşkê ve tê derdixê ku aheng li hevdû nake: ya li ciyekî tiştêkî kêr heye, ya jî dengêkî şaş ji derekê tê. Mirov ji nû ve dest pê dike, gotinên xwe hemûyan ji nû ve li hevdû suwar dike û helbest piştî xebateke wilo derdikeve. Gotin dibin wek kirasekî zêr ku li diranekî neyê. Mirov sed caran dicerribîne, cara sedî mirov dixê cî û êdî rûdinê. Ev şibandin ji bo min eşkeretir e, ji ber ku dema ew "kirasê dirên ê ne baş" tavilê "ket ciyê xwe", ez bi rasti bibêjim, ji ber êşa ku min berê dikişand û rehetbûna ku min bi dû re dît, hêstir ji çavên min hatin.

Mirov nizanê bê ew dengên ne zelal, ên ku bi dûr e dibin bingeh ji ku tên. Deng, ji

bo min her babet deng û dubarekirin, parazît û pin pina di devê min de, ya jî her babet kirin û dubarekirinên giştî ku bi deng in. Aheng, ji çûn û hatina pêlên der-yayê, ji dengê dema ku xizmetkarek her sibehê li derî dixê û dikeve hundur, dikare di hişê min de cî bigire û babetekî ahengê jê derkeve. Ya jî dengê gera dinyayê, li mala min bi xwe, wek li dikaneke ku tiştên xwe-pêşandanê dibin karîkaturê tiştên ji bo bikaranîna li dibistanan, tê guhertin û bê rawest di ber dengê bê re tê guhên min.

Xebata di derheqa organîzekirina lebatê de, di derheqa organîzekirina dengê der dora de, di derheqa pêdakirina karakterê wan tiştan de, taybetiyên bingehîn û nemirên xebata helbestvanîyê ne; amadekariyên rîtmîk in. Ez nizanîm bê ev rîtm bi rastî li der û dora min jî heye, ya jî hew di nava min de heye. Lê çî be, ji bo min bi xwe heye. Ez bawer im ku hew di nava min de heye. Lê ji bo ku rîtm bikaribe peyde bibe, divê lerezek, lebatek tê de hebe. Dema dengê kemanekê di hundurê piyanoyekê de bike zingîn jî tiştêkî wilo ye, ya jî wek dema pireke daliqandî dike ku hilweşe û mirov bi gavên bi hevdû re li ser dimeşe ye.

Rîtm qeweta bingehîn e, enerjîya helbestê ye. Mirov nikare vê baş famkirin bide. Wek dema mirov qala magnetîzmê, ya jî elektrîkê dike ye, mirov hew dikere tiştinan di derheqa wê de bêje. Magnetîzm û elektrîk babetekî enerjîyê ne. Rîtm di gellek helbestan de tiştêkî wilo ye. Dikare di seranserê gellek helbestên yekî navdar de hebe, lê dîsa jî helbestên wî nake tiştên monoton. Ji ber ku rîtm tiştêkî bilind e û pirhêl e, mi-

rov bi çend helbestên dirêj jî nikare têkeve rewşeke wilo.

Divê yekî helbestvan bikaribe vê hisa rastiye, bi xwe di nava xwe de ava bike û xwe ji yekî din fêrî pîvanên bêxêr neke. Jamb, troké, ya jî helbesta azad ku îro bûyê topek jî, rîtmêke ku li gora bûyeran ji nû ve hatiye avakirin e. Enerjiya magnetîk jî wilo ye. Heger mirov rabe bi nalên hespan veke, wê hew piçikên hesinê biçûk ji ristan bikişîne xwe. Di rewşeke wilo de, wê magnêt ji bo tiştêkî din jî nebe.

Ez bi xwe pîvaneke qalibên helbestan nizanîm. Lê ez li gora baweriya xwe ewle me ku divê helbestên ji bo şer û dilêriyê û tiştên din ên bilind, bi rêzên dirêj û bi gellek peyvan bîn avakirin, ên kêfxweş jî bi rêzên kin û peyvên hindik. Nizanîm bê ji ber çî, lê hîna ji nehsaliya xwe ve ez hevalbendiya grûpa yekem a jêr dikim. Bi vê rêzê:

Hûn bûn qurbanên şerê ku qedera we ye...

Û grûpa din jî, bi vê rêzê:

*Em xatir ji dinya kevnar bixwazin...*

*Ecêb xuya ye. Lê bawer bikin ku wilo ye.*

Ez bi xwe, pîvana helbesta xwe, bi awayê ku ez vê tevliheviya rîtmîk, bi peyvan biguherim peyde dikim. Peyvên ku ji bo armanca min pêwîst in (mîrov her demê ji xwe dipirse: gelo ev gotin e, ya jî wê eva din e? Ez ê ji kê re bixwînim? Gelo wê bê famkirin?), ew peyvên ku bi ramanan, bi xîretê û kêrhatinê hatine kontrolkirin in.

Helbesta ji bo Yesenîn, di destpêkê de dengêkî wilo bû:

*ta-ra-ra/ra ra/ra, ra ra, ra/ra ra*

*ra-ra-ra/ra ra ra/ra ra/ra ra ra*

*ra-ra-ra/ra-ra ra ra ra rari*

*ra-ra-ra/ra ra-ra/ra/ra/ra ra*

*Bi dû re êdî gotin tîn:*

*Tu êdî çû ra ra ra ra ra dinyake din*

*Bê xêr e ra ra ra ra ra ra*

*deyn tune ne, jin û bîra tune ne*

*ra ra ra / ra ra / hişê te hat serê te.*

Min gellek çar rêza pêşî di ber xwe de got û guhdar dikir:

Tu êdî çû ra ra ra ra ra dinyake din ûwd.

Gelo ez ê çî têxim bedêla van mîratên “ra ra ra”? Dibe ku bikaribe bêyî wana jî bibe.

Tu êdî çû dinyake din.

Na! Wê çaxê helbestêke din ji nîşkê ve hat bîra min:

*Hespê reben li mêrgê ket û ma.*

Hespek heyê! Lê hesp li wir çî dike, helbest di derheqa Yesenîn bi xwe de ye. Heger mirov wan gotinan deyne ciyekî din, dibe wek bezeke ji xwe re û me re. Loma jî heger ra ra ra di ciyê xwe de bimîne, baştir e. Mîrov aniha nikare “ra ra ra” jê derxe. “Ra ra ra” ahengekê dide wir. Min dest bi hîlbijartina gotinan kir:

*Tu êdî çû Seryozya, tu çû dinyake din*

*Bê xêr e, ev rastiye e, tu çû dinyake din*

*Tu êdî çû Yesenîn, tu çû dinyake din...*

Ji van rêzan kîjan baş e? Bi baweriya min hemû kêrhatî ne! Çima?

Rêza yekem, ji ber peyva “Seryozya” şaş e. Ji ber ku ez û Yesenîn tu çar nebûne hevalên wilqasî nêzikî hevdu. Loma ez nikarim rê bidim peyva “Seryozya” (kinaya navê Sergey e S.D.). Heger min rê da vê peyvê, wê ew jî birrek gotinên din ên qelç, wek “ezîzê min”, “birayê min” ûwd. bi xwe re bîne. Ev peyv ne bi min dikevin û ne jî li

pêwendiyên min wî tîn.

Rêza duyemîn xerab hetiyê avakirin. Ji ber ku gotina “ev rastiyeke e”, ne pêwîst e, hew ji bo ku gotinê temam bibin hatine lêkirin. Ew ne tiştêkî xurt dikin û ne jî tiştêkî dibêjin. Hew xerabtir dikin. Tiştêkî din jî: gelo hûn dizanin bê gotina “ev rastiyeke e” dikare bê çi maneya din? Gelo mirina bi henekî heye, gelo kesekî ku miri ye û vegeriya ye heye?

Rêza sêyem bi kêrnehatî ye, ji ber ku pîrr giran e û bêşik e. (Ez bi vî awayî tê derdixim ku hersê rêz jî şaş in.) Gelo ev gotin ji ber çi xeter e? Ji ber ku wê gellek bixwazin min bikin xwediyê baweriyêke Îsayî ya piştî mirinê. Lê ez ji tiştêkî wilo bawer nakim. Bi dû re, helbest bi vî awayî êdî nema pêwîstiyek e, lê dibê helbesteke ser miriyan, ji armanca xwe dûr dikeve. Loma jî ez gotina “wilo tê gotin” bikar tînim.

Tu êdî çû. Wek ku tê gotin çû dinyake din.

Rêza ku bi “wek ku tê gotin”, ne henek-pêkirinek e. Him bi awayekî sergirtî helwesta dilpêşewitandina di derheqa mirina wî de radike û him jî şikên li ser baweriyê wî ya di derheqa jiyaneke din de pûç dike. Baweriyê wî, bi tiştên wilo vala tunebû. Rêz bi vî awayî ava bû û di çarînê de bû rêza bingehîn. Çarîneke li hevdu hatî ye; divê wilo be, him divê nebe wek ku mirov bi lotikan bi miriyan re here ser tirban, him jî divê nabe wek ku mirov xwe bi nav destên yekî ku ji bo bavêje ser miriyan hatibe kirêkirin de berde. Divê helbesteke hemdem be û divê çarrêziyê, bike du nivên du rêzî: duduyên li hemberî hevdu, yeke giramiyê

û yeke jiyana rojane. Li gora baweriyê min, a ku divê tiştên ji bo kêfxweşiyê bin, kin bin, loma jî ez ê rêzên dawî kin bikim. Min bi vî awayî dest bi avakirina vî qismî kir.

*Ne deyn hene, ne pîrek û ne jî bîra li wir  
ra ra ra ra ra ra ra li ser hişê xwe*

Îcarê ez ê van rêzan çawa ava bikim? Ez ê wan çawa kin bikim? Divê ez gotina “pîrek” jê derxim. Hûn ê bêjin çima? Ji ber ku ew pîrek hemû hîna sax in. Ew pîrekên ku Yesenîn di piraniya helbestên xwe de, bi pûteyî cî dida hezkirina xwe ya ji bo wana, hîna sax in. Heger mirov rabe û wana di helbesteke ku di derheqa wî de ye de bimirîne, wê bê rê be. Loma wê helbest him ne spehî be û him jî wê qelç be. Tiştê ku wê bimîne:

*Ne deyn hene, ne jî bîra li wir.*

Min ev rêz di ber xwe de dubare dikirin û digotin, lê nabûn. Ew rêzên dawî, li gora ên pêşî pîrr hatine guhetin. Ne ku rîtm guhertî tenê ye, lê êdî xerabtir jî bûye, hilweşiyaye. Min gellek jê derxistiyê. Gelo mirov dikare çi bike? Gotineke biçûk jê kêm e. Lê ev rêza ku ji rîtm helbestê bi dûr ketiyê, ji hêleke din ve jî şaş xuya dike: ji hêla mane-yê ve. Him bi rêzên pêşî re dijayetiyeke sist ava dike û him jî “çi deyn û bîra ku heye” wek bargiraniyeke giran dide ser Yesenîn tenê. Lê em hemû di vî warî de xwedî kêmasiyan in.

Ez ê çawa bikim ku ev rêz bi ên din re dijayetiyeke tûjtir ava bikin, lê hîna bêtir ne xwedî naverokeke gelemperî bin?

Ez ê a rast û rê, bi zimanê gel derdixim:

*Tu rût ma, tiştêkî ji te re nema*



*Ne deyn û ne jî bîra ji te re ma*  
Bi zimanê rojane, bi awayê hişk, wilo tê  
gotin:

*Tu rût ma, tiştêki te nema*

*Ne deyn û ne jî bîra te ma*

(Maneya rast: ne deyn, ne jî bîra li wir  
hene.)

Êdî malik him ji hêla maneyê ve û him jî  
ji hêla ahenga xwe ve rûnişt. Ev gotinên nû  
bi rêzên pêşî re di dijayetiyeke tûjtirde ne.  
Deyn û bîra ne temsîla biçûk kirina Yese-  
nîn dikin, lê ji bo maneyeke tevayiyê ne.  
Ev rêz, ji bo ku mirov bikaribe serketinê  
bide hemû peyvên li pêşiya gotinên wek “li  
ser hişê xwe” û “ê liser hişê xwe” rola pêş-  
dexistinê digire. Rast e, Yesenîn hinekî bi-  
çûk dikin, lê dîsa ez bawer im ku dostên wî  
bi xwe jî dê bikarin ji vê malika çar rêz hez  
bikin.

Malika çar rêz bi bingehîn xelas bûye.  
Hew rêzêke ku ahenga wê xelas nebûye  
maye.

*Tu êdî çû, li gora ku tê gotin dinyake din*

*Ew der belkî ji ber ra- ra- ra- ra-ra*

*Ne deyn hene, ne jî bîra li wir*

*Divê tu êdî li ser hişê xwe bî.*

Belkî mirov dikare bê aheng jî bihêle. Lê  
na, nabe! Çima nabe? Ji ber ku bêyî ahenga  
bingehîn, wê helbest bikêrnehatî be.

Aheng e tiştê ku mirov dikişîne rêza çûyî,  
wê rêzê tîne bîra mirov û hemû rêzên ku  
ramanê dihûnin, dide ser hevdû. Ji bo du  
peyvên wek hevdû, yên di dawiya du rêzan  
de, aheng tê gotin. Bi tîpên ku dişibin hev-  
dû tîn avakirin û dengên ku derdixin jî  
wek hevdû ne. Wilo tê zanîn û gotin, lê ne  
rast e.

Wekhevûna dawiya rêzan- ya jî aheng,  
ji nav piraniya mecalan, hew rêyêke tenê ya  
ku mirov dikare rêzan pê bi hevdû ve girê-  
bide ye. Ez bi hêsanî dikarim bêjim ku rêya  
hêsantirîn û a tundtirîn e.

Mirov dikare ahengê bide serê rêzan:

*Kuçe*

*Kuçe li taxa.....*

Mirov dikare ahengê bide dawiya rêza  
yekem û serê rêza duyem.

*Baraneke xain çavên me terifand in*

*Lê em li hundur in, em li pişt pacê ne.....*

Mirov dikare ahengê bide dawiya rêza  
yekem û duyem, lê di wê malikê de ahengê  
bide serê rêza sêyem û çarem.

*Di nav zanan de xuyabû*

*Lê her demê şik li ser hebû*

*Ji bo helbestvaniya me Rûsan*

*Ji bo ku Şengellî digot û dibûna.*

Heta dawî mirov dikare bi vî maqamî  
bajo û lêke. Lê di vê helbesta min de, divê  
aheng ji peyva “li ser hişê xwe be” re bê dî-  
tin. Tiştê ku bi hesanî dikeve hişê min,  
peyva “seyrangeha te be” ye.

Tu êdî çû, li gora ku tê gotin dinyake  
din

*Ew der belkî ji ber ... tu êdî seyranê bike*

*Ne deyn hene, ne jî bîra li wir*

*Divê tu êdî li ser hişê xwe bî.*

Ma gelo mirov dikare vê ahengê wilo bi-  
hêle? Na. Çima? Berî hemû tiştan, ev  
aheng pirr diçirîsîne. Dema mirov dibêje  
“seyranê bike” gotina “li ser hişê xwe be” jî  
ber xwe ve tê ber. Dema tê gotin, ne wek  
bûyereke ecêb tê guhan û pirr bala mirov  
nakişîne. Rewş, ji bo van babet gotinan he-  
mûyan wilo ye û ev yek tê serê wana. He-

ger lêker bi lêkeran re ahengê ava bikin, nav bi navan re ahengê ava bikin, rewşeke wilo derdikeve. Gotina “seyranê bike” nabe, ji ber ku biçûkkirina di rêza yekem de dubare dike û dijîtiya di rêzên bi dû re lawaz dike. Mîrov dikare gotina “li ser hişê xwe be” bi gotineke din ku mirov ne mecbûrê ku wê bi aheng bike, biguhere û karê xwe hesantir bike. Ya jî mirov dikare wê gotinê ji dawîya rêzê derxe û rêzê bi gotineke din dagire. Divê wilo be. Bi baweriya min mirov nikare wek ku heye bihêle. Ez bi xwe, her demê gotina ku maneyê dide rêzê, dixim dawîya rêzê û bi vî awayî ahengê didimê. Carinan ne hesan e, lê ez rêyekê dibînim û dikim. Bi vî awayî, ahenga di helbestên min de dibe ahengeke cuda. Ez bi hesanê dikarim bêjim ku tu kesan berî min ev babetê ahengê bikar neaniye û di ferhengên de jî tiştêkî wilo tune ye.

Aheng rêzan bi hevdu ve girêdide. Loma jî divê ew gotin, ji gotinên din girantir bin. Ew dengê di gotina “seyranê bike” de û ku wek aheng derketiye pêş, min pirr caran ji xwe bi xwe re dubare kir û lê guhdarî kir. Min a rast girt: bila seyrangeha te be. Bi vî awayî, ahenga ku ez lê digeriyam derket. Lê dîsa jî wek gotin, gotineke bilind bû.

Ji ber hinek dengên ku di zimanê me de hene û xweş nayên guhên mirov, min gotina “belkî ji ber...”, bi gotina “vala ye” guhert.

Guhertinên ku divabû bibin, êdî bûn, helbest amade ye:

*Tu êdî çû, li gora ku tê gotin dinyake din*

*Ew der vala ye, tu bifire, bila seyrangeha te be*

*Ne deyn hene, ne jî bîra li wir*

*Divê tu êdî li ser hişê xwe bî.*

Rast e, êşkere ye ku ez karê helbestvaniyê bi van numûnan hêsantir didim xuyakirin, bi awayekî şemayî didim ber çavan û dabeş dikim. Ji ber ku ez di hişê xwe de wilo dikim. Lê bêguman karê helbestvaniyê sexttir û tevlihev e, bi awayekî biryardar e. Lê dîsa jî divê ez bêjim ku karê helbestvanan bi vî awayî ye.

Malika ji çar rêzên pêşî, barê helbestê tevî hildigire û jê re dibe bingeh. Dema malîkek min a wilo derket, ez êdî karim hesab bikim bê ji bo tema min çend malikên din divên û ji bo ku ez bikaribim bi helbesta xwe bigihim armanca xwe, divê ez helbestê çawa ava bikim: mîmariya helbestvaniyê bi xwe jî di vir de ye.

Heger tema min giran û tevlihev be, wê çaxê ez 20–30 kelpîçan–malikan hesab dikim. Malik dikarin çar rêz, pênc rêz ya jî şeş rêz bin.

Piştî ku min ew kelpîçên ku hewcedariya min bi wana heye hemû çêkirin, ez êdî wana yek bi yek li ser hevdu dikim, ciyê wana diguherim û dixwînim û guhdar dikim, dixwazim texmîna bê wê bikaribin tesîreke çawa li guhdaran bikin, bikim.

Min di vê helbestê de jî wilo kir. Piştî ku min bi vir de û wir de bir û anî, min êdî biryara xwe da: Piştî vê, divê êdî ez bikaribim bikim ku guhdarên min hemû guhên xwe miç bikin û guhdar bikin û bi vî awayî bikaribim bikim ku bizanibin bê ez di derheqa vê mijara dualî de, li gel kîjan hêlê me. Ez hêvî dikim û bawer im ku ez ê bi vî awayî bikaribim Yesênî, ji lepên wan kesên ku dixwazin ji mirina wî jî feyde bikin,

azad bikim. Ez ê bi vî awayî hezkirina xwe ya ji bo Yesenîn eşkere bikim û wî biparêzim. Divê mirov vê bike, ji ber ên ku xwedêgiravî jê hezdikeyn, kadînek helbestên bêkêr ji bo wî derxistine. Heyfa Yesenîn.

Ji bo ku mirov bi xwe bikaribe di vê derheqê de piştgiyariya guhdaran bigire, divê mirov pêşî wanê ku karê Yesenîn bêxêr dikan, dax bide. Ji ber ku ew camêr hemû, tiştan wilo bêxêr û erzan dikan, û dikan ku bala guhdaran jî bibin ser karên wilo bêxêr. Divê em li hemberî wan Sabînov û Koganên ku dixwazin xwe wilo bi hesanî bikin helbestvan, rawestînin. Piştî ku mirov bi vî awayî guhdar razî kirin û mirov xwe kir xwediyê Yesenîn û tiştên di derheqê wî de, mirov êdî dikare bi guhdaran bide famkirin ku mirina wî, ne bûyereke wilo girîng e, ne întesant e û ne tişteki ku divê mirov bike ye. Min ev yek kir û min gotinên Yesenîn ên dawî bi maneyeke din, ji nû ve kirin helbest.

Mirov dikare vê yekê bi şemake bêxêr û kevnan bide xuyakirin.

Piştî ku mirov bi vî awayî malika ku bingeha helbestê ye derxist û şiklê mîmariya tevaya helbestê dît, êdî kar hêsan e. Ez bi xwe, êdî karê nivîsandina helbesta xwe ya di vê derheqê de xelaskirî hesab dikim.

Karê piştî vê, êdî karê di warê teknîkî de ye.

Divê mirov bikaribe di helbestan de têgi-handinê bi awayekî baştirîn bike. Yek ji wan meclan, wêne ye. Lê ne ew babet wêne yê ku min di serê nivîsê de qal kiribû. Ne ew wêneyê encama ku mirov li ser xwestina civatê derdixe. Ez dixwazim qala wan wê-

neyên ku alîkariya xurtkirina naveroka helbestê dikan, alîkariya eşkerekirina mebesta mirov dikan bikim. Di helbestê de wêne wek hêleke alîkar, yek ji wan hêlên helbestvaniya hemdem e. Lê hinek, ji bo numûne Îmagînîst vê hêlê dikan armanc. Yesenîn jî ev yek di helbestên xwe de derdixist pêş û xwe ji nav gellek metodên avakirina helbestan, hew kiribû hêsrê vê yekê.

Awayê derxistin û avakirina wêneyan pîrr in. Awayê peydekirina wêneyan ê kavrtirîn û hesantirîn, ku mirov tiştan bide ber hevdû ye. Helbestên min ên pêşî wilo ne. “Ewrêkî bi Şal” ji serî heta dawî li ser bingehê şibandinê hatiye avakirin. Vê yekê bala rexnegiran jî kişandibû û lomajî hat gotin ku ew dawîya “serketina” min e. Ev kevnanî di helbestên min ên bi dû re de û di “Yesenîn” a min de tune ye, min xwe jê xelas kir. Ez lê vegeyriyam û min dît ku hew li ciyekî tenê tişteki wilo heye: “dirêj û rencîn wek li ba Doronîn”.

Çima “wek Doronîn” lê ji bo numûne çima ne wek “ji vir heta hîvê”? Sedema yekem, ji ber ku min ev yek ji edebiyatê girtiyê û daye ber hevdû ye û ku tema bi xwe temake edebî ye. Sedema duyem, ku “Cotkarê Hesinî” (ez bawer im ku navê helbestê tişteki wilo bû) ji mesafa ji vir heta hîvê dirêjtir e. Rêya ji vir heta hîvê, ne rastiyeke xuyayî û li ber destan e, lê mixabin “Cotkarê Hesinî” heye. Dibe ku rêya ji vir heta hîvê bi mirov kurttir bê, ji ber ku nû ye, lê helbesta Doronîn a ji 4000 malikan (di wergera Tirkî de tê gotin ku 4000 rêz in. S.D.) bi gotin û pîvana xwe wek deşteke mezin ku me 16 000 caran ditiye, dike ku

bi ser me de bikeve. Divê liberhevdûxistin, bi armanc be. Dema mirov li ser mijareke mezin kar bike, bêguman mirov dê hewcedarê gellek wêneyan be. Di vî şerê jiyane yê dirêj de, di karê ajtasyonê de, divê em bikaribin bi wêneyên di edebiyatê de jî alikariya rakirin û perwerdekirina mirovan bikin.

Ji bo ku mirov bikaribe wêneyan biafirîne, metafor baş in; ew peyvên ku hew ji bo tiştêkî taybet tenê tînan, mirov dikare bi peyvên din, ji bo tiştên din, ji bo bûyer û ramanên din bikar bîne. Ji bo numûne ev rêza metaforîk:

*Xurdê madenê laşê helbestan dikişînin.*

Em dizanin ku xurdê hesin heye. Lê di helbestan de çi dikare bibe xurde? Ew tiştê ku ji nîşkê ve têkeve helbestekê û di wir de bimîne, nikaribe têkeve berhemeke din û bimire, xurdê helbestê ye bêguman. Ev babetekî madenê xurde ye. Xurdê madenê laşê helbestê ye. Helbestên wilo jî xurde ne. Lê divê mirov wilo bi hesanî dev ji helbestên wilo bernede. Ji ber ku pîrr bi hesanî "devê vekirî", ku bi dû re "lewlew" dikare jê derkeve tîne bîra mirov. Bi vî awayî bi xwe ye, dema di helbestan de jî şemitandina maneyê çêdibe.

Di helbesta Utkîna a lîrikî de, a ku ne pîrr ji zû ve ye di "Projektor" de hat çapkirin de, ji bo numûne ev rêz hene:

*Ax, ewê min nema tê*

*Wek ku swana (qû, kugu) havînê nema bê gola zivistanê*

Bêyî ku mirov bixwaze, navê "zik" bi van rêzan tê bîra mirov. (Ji ber ku diêşe S.D.)

Divê di helbestan de rêza yekem bi hêztir

be. Bryûsov, di serê şer de, di kovara bi navê "Dema Me" de, helbestek çapkiribû:

*Em gazi ne, birinên me êşê didin me*

Di vir de şemitandina maneyê nabe û biryardariyeke bi hesanî û ku xweş tê xwendin, ciyê rast dide hîlbijartina peyvyan.

Yek ji wan metodên hîlbijartina wêneyan jî, ew metoda ku min di van demên dawî de pîrr bikar aniyê ye, bikaranîna bûyer û rastiyên ku ecêb in e. Ez ji rastiyê, mezintir didim xuyakirin:

*Bêkontrol dibezin, mîrze Kogan û peyên wî*

*bi xilçên simbêlan dibire û digelêşe kî dikeve ber wî*

Bi vî awayî Kogan (di ber seroktiya akademiya hunermendî a Moskoyê re dî-roknasê edebiyatê û rexnegir bû S.D.) dibe mirovekî ku ji gellek kesan pêk tê û mecala ku bêkontrol li vî alî û wî alî keve dide wî. Di vî beza bêyom de, simbêlan wî yên mezin dibin xilç û li xelkê dikevin, wana li ser rêya xwe radixe û dibeze. Ma kî ji me ji ber xelas bûye.

Metodên hîlbijartina wêneyan jî, wek hemû awayên din ên ku mirov ji bo afirandina helbestan bikar tîne, tê guhertin. Ev li gora xwestin û redkirina xwendevanan tê guhertin.

Mirov dikare bi awayê berovajî vê yekê jî, di nav dewlemendiya wêneyan keve. Wê çaxê mirov maneyê bi alikariya wêne mezintir nake, mirov bi zanabûn zorê dide peyvyan û maneyê biçûktir dike, tengtir dike. Ji bo numûne di helbesta min a kevn, a bi navê Şer û Gerdûn de wilo ye:

*Di paytoneke hilweşiyayî de em çil kes bûn*

*lê hew çar çimên me tenê hebûn*

Selvînskî pirraniya berhemên xwe bi vê metoda reqeman avakirine.

Bi dû re jî, dor tê teknîna karê hîlbijartina peyvvan. Heger mirov vê metodê bikar bîne, divê mirov di derheqa hîlbijartina peyvvan de pîrr şiyar be û ciyê ku mijara helbestê wek bûyer lê dibe, ji bîra neke. Gotinên ku mirov hîlbijêre, divê ne xerîbên wê derê bin, divê bikaribin lê bîn û pêkevin. Divê gotinên ku ne ji wir in, nekevin nav helbestê.

Ji bo numûne, min demekê rêzeke wilo ji Yesenîn lêkiribû:

*Hevalê min ê hêja, te ew zanibû*

Yek, “*hevalê min ê hêja*” pûç û şaş e. Ji ber ku bi hişkbûn û biryardariya helbestê re dikeve dijayetiye. Dudu, me ev gotinên wilo, di nav xwe de ji bo hevdu bikar ne anîne. Sisê, awayekî gotinê yê erzan e, bi pirranî ji bedêla xurtkirin û eşkerekirina mebesta rast ve, ji bo veşartina neyînîbûna hisan bi xwe, di nav axavtinên bêqîmet de tê bikaranîn. Çar, mirovekî ku bi şînê eşiyabe, xwe di pişt gotinên wilo qewîn de vedişêre. Bi dû re jî, ev gotin nayên maneya bê ma wî ne çî nizanîbû, lê tê maneya bê ma wî çî tenê zanîbû.

Ma gelo Yesenîn çî zanîbûn? Aniha pîrr li helbestên wî tîn pîrsîn û ji helbestên wî yên evîndariyê pîrr tê hezkirin. Pêşdeketina Yesenîn a di warê edebî de, bi skandalan bû (ne skandalên ku mirov ji ber wana şerm bike bûn, lê tiştên wek tûrneyên me futurîstan balkêş û bi rûmet bûn. Wek awayekî din ê wê rabûnê bû). Ew skandal di karê Yesenîn ê edebî de, gavên pêşveçûne bûn.

Dema Yesenîn sax bû, nedibû ku mirov weha bêje:

*Te dikaribû çî klaman ji bo ruhan bibêjt.*

Yesenîn ne klambêjek bû (a rastî ew qereçiyekî gîtarvan bû, lê heta ku sax bû, ev yek ne bi vî awayî dihat nîrxandin. Loma jî helbestvaniya wî hat kuştin. Lê mirov kare hîna jî di gellek deverên pirtûkên wî de, helbestvaniyeke nûjen bibîne.) Yesenîn ne klambêj bû, ne klam digotin, lê dikir qêrîn û wek yekî li kuçan, bi gotinên nizm diaxivî. Piştî ku ez baş ramiyam min ev gotin ji bo wî lêkirin. Dema min ev gotin ji bo wî lêkirin, ez qet neramiyam bê wê şagirtên wî yên di kerxanên edebiyatê de, ku seranserê rojan li lewlewa edebî guhdar dikin û xeyal dikin ku wê qeşmertiya helbestvanî di nav xamekan de, di himbêzan de, di tonên dangan de, di sazkirina dangan de û di hînkên sor de bikaribin rehan berdin, çiqa-sî aciz bibin.

Aniha jî, ez ê îcarê bêyî ku ez şirove bikim, ez ê karê ku gav bi gav ji bo rêzekê hatiye kirin eşkere bikim:

1 *Rojên me ne ên kêfê ne*

2 *Rojên me ne ji bo kêfê ne*

3 *Rojên me bi kêrî dilgeşiyê nayên*

4 *Jiyana me ne pîrr dilşad e*

5 *Jiyana me ne yeke pîrr dilgeş e*

6 *Jiyana me ji dilgeşiyê re nabe*

7 *Dinya me ne dinya dilgeşan e*

8 *Dinya me ne dinyake ji bo kêfê ye*

9 *Dinya me bi taybetî ne ji bo dilgeşan e*

10 *Dinya me bi taybetî ne ji bo kêfê ye*

11 *Dinya me ya reben ne pîrr ji bo kêfê ye*

Cara dozdehem û a dawîn:

12 *Em li dinya xwe wilqasi bi pêş ve neçûne*

Ez karim ji bo parastina rêza dawî axavtineke dirêj bikim, lê ez ê hew bi çend peyvan tiştê ku ez dixwazim bêjim, êşkere bikim. Wê dîsa jî bê xuyakirin bê ji bo hilbijartina çend peyvan, çiqase kar hewce ye.

Karê avakirina taybetiyên dangan jî –girêdan û pêwendiyên peyvan– ji karê teknîkî yê helbestê tê hesab. “Efsûnkariya peyvan” û belkî jî “di jiyânê de, ew tiştê tenê ku bikaribe ji helbestan re bibe aheng” di vir de ye. Ev hêla helbestan a dangan, ji bo gellekan armanca bi tenê ye. Lê ev yek dike ku helbestvanî, hew wek karekî teknîkî tenê bimîne. Dema mirov wilo zêde bala xwe bide ser ahengê û alliterationê ûhw., helbest ji deverêkê pê ve êdî dixitime û piştî xwendineke ne pirr, nema xweş tê guhên mirov.

Ji bo numûne Balmont heye, ahenga wî ya destpêkê heye:

*Ez bayê bahoze me, ez her tem  
ez pêlan radikim.*

Divê mirov pirr bi pûteyî ahenga destpêkê bide helbestan û bi awayekî beloq dubereneke. Numûneya êşkere di derheqa alliterationê de, ev rêza han a ji helbesta min a bi navê Yesenîn e:

*Ma ka ew peyker,  
ji mefreqê helandî,  
ji mermerê kolayî?*

Ez bi xwe, ji bo ku ez bikaribim wan babet peyvên ku ji bo min girîng in derxim pêş û xurttir bikim, alliterationê bikar tînim. Hinek jê, bi awayekî êşkere hew ji bo ku bi peyvan bilîzin û ji bo kêfa xwe ya helbestvanî, alliterationê bikar tînin. Helbestvanên kevn (ên li gora me hinekî sal-

mezin), alliterationê ji bo melodiya helbestê, ji bo bi peyvan peydakirina muzîkê, pirr bikar tînin. Loma jî babeteke alliterationa ku ez bi xwe pirr jê nefret dikim, a ku dubarekirina dangan pirr bikar tînin e. Dema min qala ahengê kiribû, min baweriyên xwe di derheqa alliterationeke wilo de jî êşkere kiribûn.

Bêguman mirov ne mecbûr e helbestê bi alliterationa beloq û bi ahenga tûj bixemilîne. Divê neyê ji bîra kirin ku ji bo berhemên ji hêla estetîkî ve xurt bikaribin bêtir afirandin, bi tedarikbûna bikaranîna zimên, di hunermendiyê de prensîba bingeîn e. Nabe hima çi bê ser zimên, mirov lêke. Loma jî wek ku min di destpêkê de êşkere kiribû, dema mirov karê helbestê yê bingeîn dike, ji bo ku mirov bikaribe bike ku deverên girîng biçirîsin, divê mirov bi zanabûn gellek deverên ji mijarê bi dûrketî û hinek hêlên estetîkê bibirre.

Ji bo numûne mirov dikare rêzê heta bi nêvî bike bi aheng û bi dû re jî ji bo ku mirov bikaribe ahengeke ku xweş bê guhan ava bike, mirov dikare lêkereke ku bi awayekî tûj nayê guhên mirov bi yeke din ve girêbide.

Ev yek pirr êşkere dide xuyakirin ku prensîbên nivîsandina helbestan li gora mirovan têtir guhertin. Karê helbestê yê di derheqa dangan de jî, yek ji wan karên helbestê yê hêla teknîkî ye. Mirov nikare li ser helbesteke ku bikaribe li ciyekî ku hewa lê tune ye, ya jî wek ku di helbestvanîyê de pirr xuya dibe, li ciyekî pirr şil birame, bi xebite.

Divê mirov tu caran ji bîra neke bê mi-

rov helbestê ji bo kîjan guhdaran dinivîse. Bi taybetî jî ew guhdarên rû di rû de, divê her demê di bîra mirov de bin. Ev yek anîha, vê dema ku pêwendiyên mirov bi gel re bi rêya guhdaran in, bi derketina ser dikan in, bi civînên fireh û bi axavtinê ne, bi taybetî pîrr girîng e. Li gora bê guhdar kî ne û ji bo ku mirov bikaribe teşîrê li wana bike, divê mirov dengên biryardariyê, lawakirinê, rê şankirinê û pîrskirinê rast hilbijêre.

Pirraniya helbestên min li ser dengên axavtinê hatine avakirin. Li gora ku ez bi xwe li ser vê yekê bi pûteyî radiwestim jî, ev yek ne tiştêkî ku qet nayê guhertin e. Dema ez derdikevim pêşberî guhdaran, li gora bê guhdarên min kî ne, dibe ku ez hinek tiştan bikim wek xwestina wana.

Lê tiştên ku tîr çapkirin, bi piranî dîkevin destê mirovên perwerdebûyî. Hewce-dariya ku mirov bixwaze xiroşîya wana rake tune ye. Min wilo nivîsîbû:

*Divê em dilgeşiyê ji rojên ku tîr derxin.*

Carinan, min ev rêz di xwendina li ser dikan de kiriye qêrîn:

*Dilgeşiyê ji rojên ku tîr derxînin!*

Loma jî, dema helbest li ser dikan tîr xwendin, heger mirov tiştêkî ku hatiye çapkirin hinekî guhertî jî bibihîze, divê mirov ecêbmayî nemîne. Ji bo teşîrkirinê, ev yek hilbijartina metoda dengên taybetî ye.

Dema mirov helbestan ji bo çapkirinê dinivîse, divê mirov bikaribe texmîn bike bê wê bi awayê çapbûyî çî nîrx lê bê kirin. Divê mirov xwendevanan ji bîra neke, wek helbestvan bikaribe hesab bike û bikaribe bala wana bikişîne ser tiştê ku mirov dixwaze bi helbestê bibêje. Rênûsîna me ya ro-

jane ya bi niqte, bêhnok, nîşandeka pîrsê û nîşandeka hêdanê, ji bo eşkerekirina hisên mirovan ên cuda, dema mirovekî perwerdebûyî dixê nav helbestê, dibîne ku pîrr sist û lawaz tîr. Pîvan û rîtm helbestê, ji rê-nûsînê girîngtir in. Heger mirov vî karî li gora berê bike, ew bi xwe ji girîngiya xwe dixwin.

Ji bo numûne, hemû kes van rêzên Aleksey Tolstoy:

*Şibanov bêdengbû. Ji çîma ku qul bûbû*

*Xwîna sor wek ku ji şîrînekê bû diherikî...*

*mîrov wek,*

*Şibanov bêdengbû ji çîma ku qul bûbû...*

*dixwînin.*

*Tiştêkî din;*

*Bes e, êdî! Ma ez şerm nakim*

*Dema ez serê xwe ji Polonyayîya qure re dadixim...*

*mîrov di axavtina rojane de vê rêzê wilo dixwîne,*

*Êdî ez şerm nakim...*

Ji bo ku mirov bikaribe vê rêzê, wek ku Pûşkîn bi xwe fikirîbû bixwîne, divê mirov wek ku min li jêr ji hevdu cuda kiriye, bike.

*Êdî bes e!*

*Ma ez şerm nakim.*

Dema mirov bi vî awayî dîke du niv rêz, êdî ne di derheqa rîtmê û ne jî di derheqa maneyê de tevliheviyek dimîne. Pêwîstiya ragihandina rîtm rast, mirov mecbûrî vê yekê dîke. Ji ber ku tîrbûna zimanê helbestvaniya me, di warê bikaranîna zimên de û divêtiya bîtedarîkbûna awayê avakirina helbesta me, destûra ku mirov gotin û kîteyên navîn derxe jî dide mirov. Heger di

rewşên wilo de rawest nekeve xwendina rêzê, rîtma helbestê xerab dibe. Ji ber ku rawesteke di deverên wilo de, ji ên di nav hevokekê de dirêjtir in.

Ez bi vî awayî dinivîsim:

*Ew dera vala ye,*

*tu bifire,*

*bila sey-*

*rangeha te be.*

“Ew dera vala ye” bi awayê cuda, wek rêzeke bi serê xwe tenê, ezmên bi xwe tîne ber çavên mirov.

Di helbesteke ku li ser xwestina civatê hatibê nivîsîn ya jî armanceke wê ya civatî hebe de, tiştê dijwar, girêdana dawiya wê ye. Ji ber ku peyvên helbestê ên xurttirîn û serketîtirîn di dawiyê de ne. Carinan dema guhertinek di dawiyê de dibe, mirov mecbûrê ku helbestê hemûyî biguhere dibe.

Di helbesta min a bi navê Yesenîn de, hewcedariya ku ez ji nû ve, lê bi awayekî din rêzên dawî binivîsim derket. Wilo bûn:

*Ên Yesenîn:*

*Di vê jîyanê de mirin ne tiştêkî nû ye*

*lê jîyan bi xwe jî ne tiştêkî nûtir e.*

*Ên min:*

*Di vê jîyanê de mirin pirr hesan e*

*lê xweşkirina jîyanê pirr sextir e.*

Seranserê dema ku min li ser vê helbestê kar dikir, ez li ser van rêzan bi taybetî diramiyam. Dema ez li ser rêzên din jî dixebitîm, çi bi zanabûn û çi jî bê hemdê xwe, ez dîsa li van rêzan vedigeriyam.

Ji bîrakirina tiştên ku min ê di helbestê de bikirina ne gengaz bû. Ev rêz û ev awa ji min re eşkere bûn. Loma min ev rêz li ciyekî nenivîsîn. Wek ku min di piraniya hel-

bestên xwe de kiriye û aniha bêtir dikim, min di hişê xwe de girtin.

Loma jî hejmartina guhertinên ku min di van rêzan de kirine jî ne gengaz e. Lê ev herdu rêz bi kêmasî 50–60 caran hatina guhertin û ketine şiklên cuda.

Gellek awayê xebata teknîkî ya li ser guhertin û li hevdû suwarkirina peyvên hene. Hewcedariya ku ez pirr li ser vê yekê rawestim tune ye. Wek ku min di gellek deverên vê nivîsê de gotiye, ji xwe avakirin û peydakirina van rêyan bi xwe ye tiştê ku mirovan dike helbestvan. Ez dikarim texmîn bikim ku wê qureyên helbestvaniyê dev û lêvên xwe ji bo vê nivîsa min xwaro–maro bikin, tinazên xwe bikin. Ji ber ku ew hez dikin û dixwazin ku mirov reçeteyên qalibên helbestên kamil bide destên xelkê. Li gora wana mirov mijarekê hildibijêre, mirov dixê şiklê helbestê, çi bi jamb û çi jî bi trokê, mirov hinek ahengê dide dawiya rêzan, bi alliterationê dewlemendir dike û bi dû re jî mirov bi hinek wêne, hemûyî bi hevdû ve pîne dike û dibe helbest!

Divê bê zanîn ku hemû redaksyon, van tiştên wilo bêkêr ku bi karekî hesan tîne afirandin, davêjin. Baş dikin ku davêjin, divê bavêjin.

Ev pirtûka min, alîkariya yekî ku cara yekem rahijê pênûsê û piştî hefteke din dest bi nivîsandina helbestan bike, nake.

Pirtûka min ji bo wan kesên ku li hemberî hemû astengan jî dixwazin bibin helbestvan e, ji bo wan kesên ku dizanin helbestvanî karekî afirandinê yê sexttirîn e, ji bo wan kesên ku dixwazin ji bo xwe û xwendevanên xwe hinek rêyên nedîtî yên



afirandina berhemên helbestvanî peyda bikin e.

Ji bedela qalibên amade ve, hûn dikarin ji van encaman feyde bikin:

1. Helbest babetekî afirandinê ye. Awayekî afirandina pirr sext û pirrhêl e.

2. Xebata ji bo helbestan, ne xebata lêkolînê li ser qalibên ku berê di vî warê de hatine nivîsîn û li gora wana jî afirandina helbestan e. Xebata ji bo helbestan, xebata peydakirina hemû rêyên afirandina ku ji bo afirandina tiştên nû, rêyên nû veke ye.

3. Bi gelemperî nûjentî, nûjentiya mijarê û metoda afirandinê, di çi helbesta ku nû tê nivîsîn de, misoger e; divê hebe.

4. Ji bo ku helbestvanek bikaribe serketî be û hêza zaniyariya afirandina helbestvaniyê peyda bike, divê her rojê karê xwe yê li ser helbestan bike.

5. Tênuşeke mirov a notan a baş û serketina di warê jê feydekirinê de, ji serketina nivîsîna helbestên li gora pîvanên kevnar, baştir e.

6. Ji bo ku mirov bikaribe piçek hesteyê helbestan çêbike, ne pêwîst e mirov febrîqa helbestvaniyê hemûyî bixebitîne. Divê mirov bala xwe nede ser tiştên wilo biçûk û ne ekonomîk. Dema rêya eşkerekirinê, hew helbest be, mirov radihije pênûsê. Dema ji mirov tê xwestin, mirov dide xwe û li ser amadekariyên bingehîn dixebite, dike helbesteke kamil.

7. Xwestin kengî ye û çawa ye? Ji bo ku xwestina xelkê rast bikaribe bê fam kirin, divê kesê helbestvan di nav bûyer û guherinan de be. Ji bo serketina xebata di vê derheqê de, zaniyariya teoriya ekonomiyê,

zaniyariya di derheqê rastiyan jiyana rojane de û bi nav mêjûya zaniyarî de daketin, ji pirtûkên kevnar çêtir in. Ji ber ku ew pirtûkên skolaştîk ên perwerdekirinê, profesorên ku ji tiştên kevnar, bêxêr û îdealîst hez dikin, nivîsînê.

8. Ji bo ku mirov bikaribe bersiva baştirîn bide xwestina civatî, divê mirov ji bo çîna xwe re di hemû waran de di şeran de beşdar bibe. Divê mirov ramanên ji bo hunermendiyeke ne polîtîk, bike hezar perçe. Çîroka di vê derheqê de, aniha di kirasê ji qumaşê “destana ji tevneke mezin” de (pêşî wek destan, bi dû re objektîf û bi dû re jî dijî polîtîkayê) û di derheqê awayê xemilandî yê bilind de jî (pêşî bilind, bi dû re bilindtir û bi dû re jî îlahî) derdikeve ber me.

9. Hew helwesta mirov a di derheqê afirandina berheman de dikare di hunermendiyê de rastlêhatiniyê, ji huner hezkirina bê prensîp û bi serê xwe tenêiyê hilweşîne. Hew helwesta mirov a di derheqê afirandina berheman de dikare karê mirov ê edebî ji ên din cuda bike: him helbest û him jî nivîsên din ên ji bo doza karkeran. Bi vî awayî, ji bedêla ku mirov helbestê bi awayekî ne eşkere di serê xwe de bibe û bîne û serê xwe bi helbestan bi êşîne, mirov bêtir nêzikî mecala ku mirov bikaribe mijarê rast û rê bigire û bi nixekî hunermendî ji nû ve biafirîne dibê.

10. Xebata teknîkî ya helbestê girîng e, lê mirov nikare wê bike armanca helbestê. Lê dîsa jî ew xebat bi xwe ye tiştê ku helbestê dike berhemeke bikêrhatî. Cudabûna awa-

yên di warê meşandina vê xebatê de, helbestvanan jî ji hevdû cuda dike. Tiştên ku mirovekî dikin nivîskarekî serketî jî, zanîyariya wî ya pîrr hêl, hêza wî ya ji xeletiyên dûrketinê, bi tedarikbûna wî ya di warê bikaranîna zimên de û hewldanên wî yên bikaranîna rêyên afirandinê yên cuda ne.

11. Tişt û bûyerên rojane jî bi qasî hemû faktorên din tesîrê li başbûna helbestan dikin. Gotina "bohem", bûye navê keriyê her babet hunermendan, gotina ji bo biçûkkirina wana û wek burjûvayên biçûk danasîna wana. Lê mixabin şerê di vî warî de hew bi peyvan tê kirin. Hew li hemberî gotinê bi xwe şer bûye. Kesên parezgerên edebiyata kevnar û navdariya wana, her demê li ber a xwe bûna wana, piştgiriya bi dizî û hevdû pesinandina wana ya edebî hîna heye; loma jî "helbestvanî" ji bo gellekan tê mana peyvên "ketî", "serxweş", "tolaz" û "araqvaxur" ûhw. Îro, ji lixwekirina mêtîkê helbestvan heta bi axavtina wî ya li malê a bi jina wî re, divê guhertî be û şiklê xwe ji xebata wî ya helbestvanî bistîne.

12. Em LEF-îst (ji derdora kovara ku di pêşengiya Mayakovskî de derdiket re dihat gotin. LEF, Eniya Hunermendiya Çep, S.D.) tu caran nebêjin hew em tenê nepeniyên (sir) di derheqa helbestvanîyê de dizanin. Lê em dibêjin ku em tenê dixwazin nepeniyên di vî warî de hilweşînin, em tenê ên ku naxwazin helbestvanîyê bi baweriyên hunermendiya îlahî rapêçin in.

Bi vê pirtûkê, min xwest ez wek mirovekî nefsbîçûk, bi alîkariya xebata hêvalên xwe yên filolog, tiştinan, hinekî eşkere bikim.

Ev pêwîst e, ji ber ku ew camêrên filolog, ji bo ku bikaribin alîkariya karê ku di warê helbestvanîyê de dibe rast û rê bikin, li ser berhemên modern jî hûr dibin.

Lê ne ev yek tenê.

Ev pêwîst e, lê ji bo ku organên perwerdekirina gel xwendinê nûjen bikin, divê pêşî ji estetîka paçên kevnar pak bikin. ■

Wergera ji swêdî: Suleyman Demîr

# Hevpeyvîn bi ŞÊRKO BÊKES re

H  
E  
V  
P  
E  
Y  
V  
Î  
N


Şêrko Bêkes di sala 1940'î de li başûrê Kurdistanê, li bajarê Silêmaniyê hatiye dinyayê. Ew kurê şairê navdar Faîq Bêkes e. Şêrko Bêkes xwendina xwe ya destpêk, navîn û lîse li bajarê Silêmaniyê xelas kiriye. Cara pêşî wî di hufdeh saliya xwe de, li Silêmaniyê, şîrên xwe di kovara "Jîn"ê de belav kirine. Di salên 1964-65'an de tevli refê şoreşê dibe û di wan salan de di radyoya şoreşê de dixebite. Di 1968'an de diwana xwe ya pêşî "Tirêjên Heyvê" li Bexdayê çap dike. Di sala 1970'ê de bi komek hevalên xwe re, ji bo nûkirin û ji kevintiyê rizgarkirina şîra kurdî, bi navê tevgera Ruwange îmzeyê xwe davêje bin manifestoyekê. Di sala 1975'an de ji aliyê rejîma Iraqê ve tête surgûnkirin û sê salan li jêrî Iraqê jiyana surgûnê dijî. Ji sala 1984'an û heta 1986'an dîsan di nava refê şoreşê de dimîne û di dawiya 86'an de mecbûr dimîne welêt terk dike, diçe Îranê, ji wir diçe Sûriyê û paşê di ser Îtalyayê re xwe davêje Swêdê. Di sala 1987'an de xelata PEN'a Swêdê ya Toxoloskî digire û dibe edebiyatvanê kurd yê pêşî ku xelateke ede-

bi ya navneteweyî digire. Wî heta niha zêdeyî deh pirtûkên helbestan çap kirine û şîrên wî wergeriyane zimanên tirkî, farişî, erebî, swêdî û niha jî ji çapkirina îngilîzî re amada ne.

Piştî serihildana 91'ê dîsan Şêrko Bêkes vedigere welêt. Di hîlbijartina 91'ê de dibe endamê parlamentoya Kurdistanê û paşê bi dengên parlamentan dibe wezîrê kulturê. Ew nêzîkî du salan wezîr dimîne û bi gotina wî, ji ber nedemokratîkbûna parlamentoyê ew ji wezîrtiya xwe îstifa dike.

Me Şêrko Bêkes li kafeteryayeke li navenda Stockholmê dît, bi qehwevexwarinê re û di nava dixana cigara wî ya şairane de ji bo xwendevanê Nûdemê pê re sohbetek kir.

**Nûdem:** *Em dizanin ku tu kurê şair Faîq Bêkes î. Zarokên gelek navdaran an dibin berevajiyên wan, an jî bi wan re dikevin qajiyê, dixwazin bibin wek wan. Gelo mirov dikare bibêje ku te dilbijokiya jiyana bavê xwe kir?*



Şêrko Bêkes (Foto: Nûdem)

**Şêrko Bêkes:** Gava bavê min mir, ez hê biçûk bûm, şeş-heft salî bûm. Mîna zarokêkî şeş-hef salî min bîr nedibir ku ez di derheqa şîrê û cîhana şîrê de bi bavê xwe re bipeyivim. Lê tê bîra min gava bavê min radihişt pirtûkan û pirtûk dixwendin an jî gava tiştin li ser kaxezan dinivîsand. Lê ev yeka mîna xewnekê tê ber çavên min. Di jiyana min de sê tişt hene ku tesîra mezin li min kirine da ez ber bi cîhana şîrê de herim. Yekem bavê min e ku mîna şaîr di nava xelkê de dihate naskirin û hezkirin û xelkê jê re hurmet digirtin. Dudu; xwezaya Kurdistanê, spehîtiya wê, şax û dax, çem û daristanên wê, sisê; ew çîrokên ku diya min ji min re digotin. Van her sê tiştan ji bo nivîsandina min tesîrên mezin li min kirine. Rast e, gelek şaîr hene ku kurê wan nebûne şaîr û ji xwe re dane ser rîyeke din, an jî ge-

lek hunermend hene ku zarokên wan dûrî hunerê ne. Yanî ne şert e ku mirov şaîr be divê zarokên mirov jî şaîr bin. Wek mînak du xwişkên min hene ku qet têkiliya wan bi şaîrtî an jî edebiyatê te re tunene. Lê tesîra bavê min ya li ser min bêtir tesîreke manewî bû, tesîreke ruhî bû. Tê bîra min ku xelkê digotin kurê Faîq Bêkes e, bavê min jî di nava xelkê de xwedî xatir û qîmet bû, loma ew ji min re bû nîşana qencyê, ji min re bû çirayek. Min jî dixwest ez mezin bibim û weke bavê xwe werim hezkirin, di nava xelkê de bibim xwediyê xatir û qîmet. Bavê min ji min re şîrek nivîsandibû, digot, hêvîdar im tu ê şûna min dagirî, bibî dengê qencî û rastiyê. Wan gotinên wî jî ez ber bi cîhana şaîrtiyê ve ajotim.

– *Mîna tê zanîn du demên girîng di guherandina şîra başûr de xuya dibin; dema pêşî*

*di navbera herdu şerên cîhanê de û bi serkêşiya Evdila Goran û dema dawî jî piştî serhildana tevgera Ruwange bi serkêşiya Şerko Bêkes. Gava tu van herdu deman beramberî hevdu bikî tu çi hêlên wekhev û yên cûda di navbera van herdu deman de dibînî? Tu dikarî hinekî bi van deman ve girêdayî behsa rewşa şîira kurdî bikî?*

– Ez dixwazim bibêjim ku şîr li başûrê Kurdistanê, berî niha bi du sed salî, di dema Baban de li ser destên sê şairên mezin Nalî, Salim û Mustefa Beg geş bû. Herçî şîra nû, bi şeweya nû, mîna ku te jî behs kir, di navbera herdu şerên cîhanê de bi serkêşiya Evdila Goran dest bi gulvedana xwe kiriye. Tişteki din jî heye ku nivîskar û rewşenbîrên kurd yên wê demê, an jî avakerên wê dibistanê bi kapasîte bûn, bi kêmanî her yekî ji wan bi sê zimanan dizanîbûn, wek erebî, tirkî, farisî û tirkî û herweha gelek ji wan bi gelek zaravayên kurdî jî dizanîbûn. Nûhîtiya şîr û edebiyata Ewrûpayî zûtir, yanî berî ku bigihîje Kurdistanê, gihîşte Tirkiyeyê. Tesîrê wê jî Tirkiyeyê derbasî rohilata navîn bû û ji wir jî derbasî Kurdistanê bû. Ez dikarim bibêjim ku Şêx Nûrî Şêx Salih ku berî Goran e, bi riya tesîra edebiyata Ewrûpayî û edebiyata tirkî xwest guhertin û nûyîtiyekê di şîira kurdî de çêbike. Lê herçî Goran e, tiştê ku Şêx Nûrî Şêx Salih xwestiye bike, wî bi awayekî firehtir xistiye jiyanê, di form û zimanê şîrê de guhertin û nûyîti anîne. Evdilax Goran, bi qasî ku bi zaravayên kurdî dizanîbû, wî bi zimanên biyanî, mîna erebî, farisî, tirkî û hinekî jî bi îngilîz dizanîbû. Zanebûna wî ya bi îngilîzî jê re deriyê îmkanan vekir

ku zû ji şîira îngilîz ya romantîk haydar bibe. Bi taybetî Byron û Schiller nas kir û di bin tesîra wan de ma. Evdila Goran xwest bi riya wergerandina şîira îngilîzî deriyê şîira modern li ber zimanê kurdî veke. Wî di dema xwe de şîrên Byron, Schiller û La Martin wergerandine kurdî û hem pê zimanê kurdî kiriye şîrê zimanên dinyayê, hem jî berê şîira kurdî ber bi nûkirinê ve kiriye. Zanebûna Goran ya bi gelek zimanan, herweha zanebûna wî ya bi zimanên biyanî kir ku ew bêtir di şîrê de kûr here û şîira kurdî ji qalib û kêşana şîira erebî rizgar bike û bi folklorê kurdî ve girê bide. Ew kapasîteya ku di wê serdemê de bi Goran re hebû, kir ku ew bikaribe di şîira kurdî de guhertinên bingeîn çêbike, berê şîira kurdî ber bi dinyayê nûtir ve bike. Yanî yek ji kirinên Goran yê girîng û biserketî ew e ku wî şîira kurdî ji kêşan û qaîdeyên şîira erebî qut kir û ew bi celebê folklorê kurdî ve girê da. Ji xwe folklorê kurdî jî cerg û hinavê civaka kurdî derketiye û serbestiyeke hunerane tê de heye. Lê belê Goran ne bi tenê tiştên nû xiste nav şîira kurdî, wî herweha fikrên nû jî di nava civata kurdî de belav dikir. Bê fikrên nû, guherînên nû ne di jiyana mirovan de dibe, ne jî di şîrê de...

Ferqiyeta serdema me ji ya serdema Goran ew bû, ku em komek xort bûn, em bêtir li Bexdayê dijiyan, Bexda jî wê demê yek ji navendên huner û kulturê bû. Em li Bexdayê bi riya zimanê erebî ketin nava cîhana edebiyatê; çî roman, çî çîrok, çî şîr... Herweha em ketin nava meseleyên fikrî û îdeolojî jî. Em bi riya kovar û rojnameyên

ji welatên ereban yê cihê cihê haydarî guherthinên dinyayê, siyaseta û civatên dinyayê jî dibûn. Ji bilî vê jî, li Bexdayê, pêwendiyên me bi şair û edîbên ereban re hebû; şair û edîbên ku ji gelek welatên ereban yê cûda. Ev şair û edîbên han jî çî di warê zimanê erebî de, çî jî di warê zimanê Îngilîzî de, gelek şareza bûn, kovar û rojnameyên pir bi kalîte derdixistin. Têkilî û danûstandinên me yê digel şair û edebiyarvanê ereban kir ku em careke din li şîra kurdî hûr bibin, dîsan wê nû bikin, jê re zimanekî nû, resimên nû û formeke nû û hemdem binin. Di vê serdemê de ne ez bi tenê bûm, li gel min hin hevalên din jî hebûn. Bo nimûne; çîroknivîs Husên Arif, kak Botanî ew jî çîroknivîs e, rehmetiyê Celalê Mîrza Kerîm ku berî bi çend salan wefat kir û hin hevalên din... Me van hevalan bi hev re manifestoyek derxist, manîfestoya Ruwange. Manîfestoya Ruwange ji bo tazekirina şîra kurdî hawarek bû, bangêk bû. Mîrov dikare bibêje ku ev manîfesto digel nûkirin û azadiya şîrê, nûkirin û azadiya fikir û ramanê jî bû. Herweha di civatê de azadî û serbestiya jinan bû jî. Ji bo vê yekê hin meleyên kevneperest êrîş anîne ser me, vê êrîşawan kir ku em beyaneke din jî derxin. Yanî tevgera Ruwange tazekirina fikrê, tazekirina nêrîna cihanî, nûkirina şîra kurdî û ji bo azadiya jinê gavavêtinek bû. Herweha tevgera Ruwange pakkirina zimanê kurdî ji gotinên biyanî, pakkirina naveroka çîrok û şîra kurdî bû. Em bawer dikin ku her tim pêwîstiya guherandin û nûkirina huner û edebiyatê heye. Me bi xwe li gorî hêza xwe ew guhertin kirin. Nivîş li dû me jî li gora

xwe guhertinan dikin. Çî ji bo çîroka kurdî, çî ji bo şîra kurdî û bi giştî ji bo pexçana kurdî dewreke me ji bo guherandin û nûkirinê hebû, me ew kir, lê niha hinek ji me westiyane, rûniştine, hinek di vê riyê de berdewam in.

Ferqiyeta di navbera tevgera me û ya Goran de, ew e ku du nêrîna cuda li ser jiyane û cihanê, du nêrînên cuda li ser şîr û edebiyatê û du felsefeyên cuda bûn.

– *Dîroka Kurdistanê başûr ya nêzîk bi şer û berxwedanan ve derbas bûye. Gelo şîra kurdî jî di meydana şer de bû, an jî xwe kişandibû quncikan û ji şer re temaşevan bû? Bi gotineke din çî tesîra şîra kurdî li şer û berxwedanên kurdan bûye, an jî çî tesîra şer û berxwedanan li şîra kurdî bûye?*

– Serdema nivîş min, serdema şer û berxwedanê bû. Ev jî serdema me ji ya Goran vedîqetîne. Derketina me tûşî demeke teqînê bû, tûşî demeke şerê germ bû. Di sala 1961'ê de temenê min bîst û yek sal bû gava şoreşa kurdî li Kurdistanê başûr dest pê kir. Xort bi kêf diçûn şer, ev çûyîn û hatina şer însanekî nû afirand, ku ew jî di dîrokê de û ji bo guherandina dîrokê însanê kurd yê şoreşger e. Helbet vê yekê tesîreke mezin li me kir. Ev tesîr ew bû ku em tiştê xwe yê taybetî bi bîr binin. Ew tiştê taybetî jî ziman bû, huner bû, edebiyat bû, dîrok bû. Azar ne bi tenê azara şairan e, ji ber ku azarî xak e, azarî av e, azarî welat e. Durustbûna pêşmergeyên kurd, durustbûna însanekî ye ku divê dîrokê biguhere, ku divê jiyaneke nû ji bo millet ava bike, tesîreke van ya gelek mezin li ser me hebû. Ez bi xwe heta vê saetê jî di bin tesîra wê gavavêtinê

de me. Lê şîra me jî li Kurdistanê mîna sî-lehekê ye. Rola şîrê li Kurdistanê ne mîna ya Ewrûpayê ye, li Kurdistanê şîr jîndar e, li nav xelkê ye. Çawan li malan nan heye, av heye, xwarin heye, wilo jî şîr li malan heye, li nav xelkê, di dilê xelkê de heye. Li Silêmaniyê di şahiyêke şîrê de ne kêmi du hezar mirov beşdar dibin. Lê li Ewrûpayê ne wilo ye. Ger şairêkî baş li Kurdistanê dîwaneke xwe çap bike, wê kêmi heft-heşt hezar liban neyê firotin. Bo nimûna gava ez di sala 1991'ê de çûbûm Silêmaniyê, di şeveke xwendina şîran de zêdeyî sê hezar kes hatibûn, ji van belkî hezar kes li derve rawestiyabûn. Bi kurtayî em şairên demekê ne ku barût, teqîn û xwîn hebû. Em şairê demekê ne, ku malên me dişewitîn, daristanên me dişewitîn, asmanê welatê me her duxan bû. Bêguman, ew dûkela, ew xwîna, ew wêrankirina hemû li ser şîr û edebiyata serdema me tesîr kiriye. Herweha tesîra me jî li ser şerkerên welêt gelekî hebû. Wan şîrên me digel çekên xwe bi xwe re dibirin serê çîyan, bi xwe re dibirin qada şer. Tiştek heye ku ez qet ji bîr nakim, carekê pêşmergeyekî nameyek ji min re nivîsandibû, di nameya xwe de gelekî kêfa xwe ji şîrên min re anîbû û gotibû, 'ez dixwazim şehîd bibim da tu ji bo min şîrekê binivîsînî'. Ew şehîd ket û min jê re şîrek nivîsand. Ev tişekî mezin e. Ez dikarim bibêjim ku em nikarin şîra xwe ji şerê azadî û serbestiyê cuda bikin, şîra me jî her tim bi pêşmergeyan re di cepheyê de bû. Ez bi xwe sê caran ketime nava refê pêşmergeyan. Carekê temenê min bîst û sê-çar sal bû, carekê di 74'an de çûm, carekê jî ji 84'an ta 86'an di

nava şoreşê de mam. Vê yekê tucrebeyeke zindîtir da min. Gelek ji hevrêyên min ku pêşmerge bûn, şehîd ketin. Li ber çavên min gund dişewitîn, zarok, jin, kal û pîr dişewitîn, bê guman ez nikarîbûm ji van re temaşevan bimama. Van hemû tesîr li min dikirin. Tesîra şîra me jî li şoreşê hebû, lê divê ez bibêjim ku her dem hêza pêşmerge di pêşiya şîra me de bû, şer û berxwedan ji şîra me xurttir bû.

– *Ji bo hin şairan şîr evîn e. Ji bo hin kesan jî şîr şeraba tenêtiyê ye, çûkekî baskokirî ye. Ji bo te şîr çi ye? Şîr çi dide te, an tu dixwazî bi gotinên xwe yê hundurîn çi bidî dinyaya derve?*

– Ez şîrê ji bo jiyane dinivîsînim. Ez şîrê ji bo rehetiya ruhê xwe dinivîsînim. Ez şîrê bi zimanekî taybetî dinivîsînim da ez xoşewîtiya xelkê ya ji bo şîrê bêtir bikim. Şîr di eynî demê de hem ez im hem jî xelk e. Şîr xoşewîstî ye, şîr ezmanekî ji gotinan e, ku hemû însan pêwîstî bi ezmanekî weha heye. Şair ew ezmanê xoşewîstî yê gotinan e. Bi ya min şîr ji bo her şairî cûda ye. Gava mirov dibêje şîr evîn e, ev ne bi tenê evîna jinekê ye, ev dikare evîna dayikekê be, evîna zarokekî be. Zarok, jin û dayik hemû bi hev re evîn e, ev evîna wicûd e, evîna jiyane ye. Bi ya min şîr berdewambûna jiyane ye. Şîr berdewambûna evîne ye. Gava ez şîrê dinivîsînim, ez dixwazim bi riya ziman xweşitiyekê bînim pê, di giyanê xwe de xweşitiyekê ava bikim.

– *Gelek kes bi şîran dest bi nivîsandinê dikin lê paşê derbasî prosayê (nesîrê) dibin. Tiştê ku dixuye tu hê jî li ser şîrê berdewam î. Gelo ferqiyet an jî hêlên wek hev yê şîr û*

*nesîrê çî ne? Çî pevçîrêdan an jî çî cûdayetî di navbera wan de heye?*

– Bi ya min di hemû zimanê dinyayê de girantirîn şêwezimanê edebî şîr e, zimanê şîrê ye. Zimanê şîrê di hemû zimanê dinyayê de xweştirîn, zehmettirîn ziman e. Helbet şîr ne bi tenê beşek e, şîr dinyaye-ke mezin e. Şîr heye weke kaniyê ye, biçûk e, şîr heye weke çem e, mezin e, şîr heye weke golê ye, kûr e. Şîr heye, şanonameya şîrî ye û şîr heye qesîdeya dirêj e, drama ye, dramayê mezin e. Yanî şîr ne bi tenê şêweyek e, şîr dikare di nav şîra xwe de hemû dinyayên din bihundurîne.

Rast e, gelek şairan bi şîrê dest pê kirine û paşê derbasî nivîsandina romanê, an jî peşanê bûne. Yê min rast e ku ez şîrê dinivîsînim, lê ez çawan şîrê dinivîsînim? Şîra ke ez îro dinivîsînim, ne şîra ku min berî niha bi deh-panzdeh salan dinivîsand. Şîra ku ez niha dinivîsînim, tecrubeyên zêdetir tê de hene, naverokeke dewlemendtir tê de heye. Wek nimûne min "Derbendî Pepûne" nivîsî, ev berhema min qesîdeyêke diramî ye ku ji du sed û bîst û pênc rûpelan pêk tê. Du sed û bîst û pênc rûpel ne bi tenê şîr e; roman tê de heye, çîrok tê de heye, serpêhatî tê de heye, lê belê bi zimanê şîrê ye. Gava ez dixwazim bi zimanê nesîr binivîsînim, her tim dibe şîr, ji ber vê yekê ez nikarim bi nesîrê binivîsînim. Zimanê nesîr zêdetir zimanê aqil û mantiq e, lê zimanê şîrê ne weha ye. Her çiqas ez carinan dixwazim nesîrê binivîsînim, ez dişan dadigerim ser şîrê. Lê, ev ji şairekî bo şairekî din, ji edîbekî bo edîbekî din tê guhertin. Bêguman şîr hene ku roman û çîrok jî ni-

vîsandine û biserketî jî bûne. Hin şîr jî hene ku her şîr mane. Min jî carinan xwestiye ku ez romanekê binivîsînim, lê her tim xwesteka min ber bi nivîsandina şîra dirêj a dramî, an jî ber bi nivîsandina destanê çûye.

– *Digel perçeyên din jî, tu bi gelemperî rewşa edebiyata kurdî û bi taybetî jî rewşa şîra kurdî çawan dibînî?*

– Pîvana şîr û edebiyata kurdî, an jî ya dinyayî bi serbestiya wan miletan ve girêdayî ye. Mirov nikare serbestî û ziman ji hev cûda bike. Rewşa Kurdistanê ya jeopolîtîkî û dabeşbûna Kurdistanê, kiriye ku rewşa şîr û edebiyata kurdî bi giştî wekî rewşa siyaseta kurdî û rewşa civaka kurdî be. Bo nimûne, ji bo ku li bakurê Kurdistanê, rojek ji rojan meseleya zimanê kurdî, serbest nebûye, azad nebûye, pê nehatiye xwendin û nivîsandin, pê kovar û rojname nehatine derxistin, pê pirtûk nehatine derxistin, bûye seba nederketina edebiyateke bi hêz, şîreke bi hêz. Rast e, niha li Ewropayê hin kovar û rojname derdikevin, hin kes şîran dinivîsînin, lê ev ne weke rewşa başûrê Kurdistanê ye. Ji ber ku li başûrê Kurdistanê, ne ji niha ve, ji salên bîstî û he-ta niha her tim zimanê kurdî bi awayekî serbest bû. Yanî ger li Kurdistanê başûr rewşa siyasî carinan xerab bûbe jî, bi zimanê kurdî her tim tiştin derketine, yanî ziman qedexe nebûye; rojnameyek du rojname, kovarek du kovar û pirtûk derketine. Ev ji Kurdistanê bakur pir guheriye, ku qet mecala xwendin û nivîsandina kurdî lê nebûye. Li Kurdistanê Îranê bi zimanê kurdî xwendin nebûye, bi tenê di mudetêke yek-



salene de, di dema komara Mehabadê de bûye. Lê di van demên dawî de kovarek bi navê *Sîrwe* li wir derdikeve. Vê rewşa han kiriye ku ezmanê şîra kurdî, ezmanê edebiyata kurdî ezmanekî teng be, ezmanekî biçûk be, ezmanekî tengeber be, edebiyatvan û şairên baş dernakevin. Meseleya ziman weke mesela erdê ye. Ger erdek nebe, tu ê çawan karê xwe bikî, çandiniya xwe bikî. Ziman jî weke erdê ye. Ev ferqiyeta siyasî û civakî, ferqiyeteke edebî jî aniye holê. Bo nimûne li jêrê Kurdistanê şîr gelekî bi pêş ketiye, gelek şairên mezin derxistiye. Ez bawer dikim ger li Kurdistana bakur azadiyek hebûya, qedexebûna li ser zimanê kurdî tunebûya, me ê bikarîbûya bi hêsanî ji wî beşî jî şairên mezin, romannivîsên mezin, edebiyatvanên mezin bidîta. Gava mirov vê rewşê bi bîr tîne, mirov tavilê rêdigihê ku edebiyat û şîra kurdî bi azadî û serbestiya kurdan ve girêdayî ye. Ger azadî tunebe, edebiyata kurdî jî nabe, ger serbestî tunebe, şîra kurdî jî nabe. Ev hemû bi hev ve girêdayî ne. Bedaxewe hin şîrên ku bi kurdancî hatine nivîsandin û min xwendine, şîrên pir lawaz in, pir sivik in, ne şîrên vê serdema me ne. Ev celeb şîr li şîrên milî diçin, ne şîrên hunerî ne. Şîra dinyayê ya îro li cihêkî din e. Şîrên bi vî babetî li başûrê Kurdistanê dibe ku di salên bîstî, sihî, çilî de dihatin nivîsandin. Li Kurdistana Îranê rewşa şîra kurdî baştir e. Şairên weke Hêmin û Hejar û nivîskarê wek Zibêhî derketine. Herçiqas şîrên van şairên me bi dizî, yanî bi nihênî hatine belavkirin jî, lê tesîreke baş li nav cîlê xwendevanan kirine. Herweha ji şairên ku piştî Hêmin û Hejar

e, ku Siware ye, Siwarê Irxanî Zade yek ji wan şairên herî baş e bi raya min. Lê beda-xewe wî zû wefat kir. Ez bawer dikim temenê wî li dor sî salî bû gava wefat kir. Ew gelekî nêzikî edebiyata Ewrûpayî bû, bi zimanên ewrûpayî dizanî. Herçî şairên Kurdistana Sûriyeyê ne, piraniya wan bi erebî dinivîsînin. Lê mijar û naveroka şîrên wan hemû kurdî ne. Wan şair û edîbên gelekî mezin derxistine, lê ew bi kurdî nizanin, bi kurdî nenivîsandine. Bo nimûne *Selîm Berekat* heye. Bi baweriya min *Selîm Berekat* îro yek ji edebiyatvanên dinyayê yê mezin e. Selîm Berekat digel şîrê roman jî nivîsandîye, lê hemû romanên wî, navên kesên tê de, navê teyr û teba, navên deşt û çiyana hemû bi kurdî ne, mijara romanên wî dîroka kurdî ye, lê ew naçar maye ku bi zimanê erebî binivîsîne. Ji xwe ev yek ji problemên me yê girîng in. Ev problemeke me ye ku divê em gelekî bi cidî li ser rawestîna û munaqeşe bikin. Gelo em ê kurdên ku bi zimanin din dinivîsînin mîna edîbên kurd qebûl bikin an na? Ev problem dişibe problema ku ereban li ser edebiyat û edebiyatvanên Cezayir, Tûnis û Mixrib munaqeşe dikirin e. Ji ber ku piraniya edebiyatvanên van welatan ne bi zimanê erebî lê bi zimanê fransîzî dinivîsandin. Em çawan li van binihêrin? Bi a min edebiyat ziman e, ger berhemek bi kurdî nehatibe nivîsandin mirov ê nikaribe wê mîna berhemeke bi kurdî an jî edebiyata kurdî bihesibîne. Ji ber ku ev rastiyeke e, îro çî li Sûriyê û çî jî li Tirkîyeyê gelek şair û nivîskarên baş hene, pir baş dinivîsînin, lê mixabin ji ber ku ew bi kurdî nanivîsînin, ew nabe edebiyata

kurdî.

– *Wek kovara Nûdemê me ji mêj ve dest avêtîye vê pirsê. Pirsra gelo kî nivîskarê kurd e kî ne nivîskarê kurd e. Ev demek e di rojnâme-yên rojane de jî ev pirs tê munaqêşe kirin. Piraniya yên bi kurdî dinivîsînîn dibêjin yên ku bi tirkî dinivîsînîn ne edebiyatvanên kurd in, yên ku bi tirkî dinivîsînîn û kurdayetiyê jî dikin, her xwe mîna edebiyatvanên kurd dibînin. Tu ê bi kurdî di vê derheqê de çi bibêji? Ma rast e ku ziman nasnava berhemeke edebî ye?*

– Ez bawer dikim ew niv û niv in. Yanî nivî edebiyatvanên ereb nivî yên kurd, nivî edebiyatvanên tirk, nivî yên kurd in. Lê bi raya min pirsra girîng ev e; gava mirov bibêje şairê kurd, divê şîrên wî bi kurdî bin, bi kurdî hatibin nivîsandin. Lê yên ku bi tirkî an jî bi erebî dinivîsînîn, qey nake ku mijara berhemên wan li ser kurdan bin, an jî hin navên kurdî di berhemên xwe de bi kar bînin, ew dîsan jî nabe edebiyata kurdî. Wek nimûne em bibêjin Yaşar Kemal, Selîm Berekat, Mihêdîn Zengene ev hemû nivîskarên mezin in, lê bi zimanên ku nivîsandine, dibe malê pirtûkxaneyê erebî, malê pirtûkxaneyê tirkî, ew naçin pirtûkxaneyê kurdî. Mesele kî edebiyatvanê kurd e, kî ne edebiyatvanê kurd e, ew ziman tesbît dike, ne ku hîsên nivîskar çawa ye. Şertê bingehîn ziman e.

– *Nayê bîra min ku edebiyatvanên kurdan xelatên navneteweyî girtine, ez bawer dikim tu yê pêşî yî. Wek tê zanîn te di sala 1987'an de ji aliyê PEN'a Swêdê ve xelata Toxolîskî girt. Ev ji bo te hîseke çawan bû û çi tesîr li şairî û şexsiyeta te kir?*

– Xelata Toxolîskî, ji salê carekê ji aliyê kluba PEN'a Swêdî ve tê belav kirin. Divê xelatgir, edebiyatvanekî li sirgûnê be, yanî eksîl be. Min di sala 1987'an de ew xelat girt û ew xelat berdeham tête belavkirin. Xelata Tokoloskî tesîreke mezin a edebî li min nekir, lê xelata Toxoloskî ne bi tenê ji Şêrko Bêkes re bû, xelata Toxoloskî, ji bo şîra kurdî, ji bo edebiyat û zimanê kurdî, ji bo danasîna edebiyata kurdî bi ya cîhanê re ye. Ya girîng bi vê xelatê ew e ku xelk dibihîzin ku bi zimanê kurdî şîrên baş tê nivîsandin, îcar ev şair Şêrko Bêkes e an jî yekî din e, ne zêde girîng e. Ev li ber şîra kurdî deriyekî vedike, li ber ziman û edebiyata kurdî deriyekî vedike. Bi a min xelata Toxoloskî yekem pênasîn e ku şîra kurdî dike şîrikê şîra dinyayî. Bivê nevê, vê xelatê ji bo min jî deriyek vekir, kir ku ez gelek şair û nivîsakarên swêdî nas bikim, ew min dawetî civînên xwe dikin û bi wê riye jî îmkane min çêdibin ku ez bikaribim şîra kurdî, edebiyata kurdî bêtir bi wan bidim nasîn. Hêvîdar im ku wê îmkane wilo ji bo edebiyatvanên kurd yên din jî çêbibin û bi vî awayê dê kurd di qada navneteweyî de bêne naskirin û bibin xwedî gotin.

– *Tu di edebiyatê de rola xelatan çawan dibîni?*

– Bêguman xelat ji kevin ve awirdanek e da tiştên qenc û bi qîmet wenda nebin, neyên ji bîr kirin. Xelat ji bo mirovatîyê, ji bo aşî û xoşewîstîyê ye. Edebîyat jî beşek ji vê ye ku pêwîst e li ber çavan were girtin. Bo nimûne gava *Gabriel Garcia Marquez* xelata Nobel wergirt, ne ku ew xalat bi tenê ji bo şexsê Marquez e, ew xelat herweha ji

bo edebiyata Emerîka Latîni bi giştî ye. Ew xelat dibe sebeb ku edebiyata Emerîka Latîni bêtir li dinyayê belav bibe.

– *Nebûna xelateke edebiyata kurdî ne kêmasiyeke e? An jî xelateke edebiyata kurdî wê ji bo geşkirin û bipêşdaxistina edebiyata kurdî roleke mezin û berbiçav neleyize?*

– Belê, ger yekîtiyeke me ya nivîskaran hebe, nivîskarên hemû perçeyan bi bîr û baweriyên siyasî yên cûda tê de hebin û ev xelat bi durustî ji aliyê yekîtiyê ve were belvakirin, bêguman wê roleke gelekî baş bileyize.

– *Piştî ku te xelata Toxoloskî wergirt û çend salan li Swêdê rûniştî, paşê bi gubertînen li welêt û avakirina hukûmeteke federel, te jî mîna parlement û paşê jî mîna wezîrê kulturê di hukûmetê de cih girt. Qet dihate bîra te ku tu ê rojekê li Kurdistanê bibî wezîrê kulturê? Piştî ku tu bûyî wezîr, tu bawer dikî ku te berpirsiyariyên xwe bi cih anî?*

– Bêguman na. Min qet bawer nedikir ku ez ê rojek ji rojan Kurdistaneke azad bibînim. Gava ez di nava refên pêşmergeyan de bûm, ez gelek caran nêzikî mirinê bûme. Loma me bawer nedikir ku wê guherîneke weha mezin li herêmê bibe, kurdê xwe bi xwe xwe îdare bikin, wê parlamentoyeke me çêbibe û hukûmeteke parlamentoyê hebe, bêguman na, me bîr nedibîr. Lê, em ji bo pêşerojê û nivêşê dahatû difikirîn.

Gava li welêt ev guhetin çêbûn, ji bo ez jî berpirsiyariya xwe bi cih bînim, ez çûme welêt. Bi hîlbijartinên demokratîk yên giştî ez pêşî mîna parlementer hatim hîlbijartin, paşê jî bûme wezîr. Ji bo ku cara yekem ez bi navê kurdan bûme wezîr hîseke xweş e,

lê li ba min şairekî ji wezîrekî pir pir mezin-tir e. Piştî wezîrtiya du salan, ji ber nedemokratîkbûna parlamentoyê min îstifa kir û dîsan vegeyriyam Swêdê.

– *Tu vegeyriya Swêdê û niha jî her li Swêdê dijî. Ji bo îlhama afirandinê Swêd an jî Kurdistan?... Jiyana li biyanîstanê çi tesîrên erîni û neyîni li te dike?*

– Bêguman ez bi tenê çûbûm Kurdistanê, jin û zarokên min li Swêdê mabûn. Gava min ji wezîrtiyê îstifa kir, tu kar ji min re nema, tu tişt tunebû ku min pê debara xwe bikira, loma ez vegeyriyam Swêdê, ba jin û zarokên xwe. Tu ya rastî bixwazî, ez niha hîs nakim ku ez li Swêdê me, ez wilo hîs dikim ku ez li Kurdistanê me. Yek ji problemên ew e ku ez heta niha nikarim tevî jiyana Swêdê bibim. Ez nikarim hevalekî Swêdî peyda bikim, ez nikarim tam têkevim nava kultur û adetên swêdiyan. Ne ji ber ku ev kultura swêdiyan xerab e, na, pir tiştên wan yên baş hene, gelek tiştên wan yên pêşketî hene; ew bi sedan sal di pêşiya me de ne. Lê heta niha xewnên ku ez dibînin jî hemû li Kurdistanê ne, ez xewnên zarokên xwe dibînim, xewnên welatê xwe û hevvelatîyên xwe dibînim. Ji ber vê yekê şîrên min jî her perçeyek ji welat e. Ew li ser welat, li ser heval û hogirên min yên li welat, li ser tecrubeyên kevin, li ser bîranîn û av û hewa welat ava dibin. Tesîra Swêdê çi bigire li ser şîrên min tune. Ji ber ku min hê tiştêkî bi vî welatî ve girêdayî be nenivîsandiye. Hemû tiştên ez dinivîsînim bi welat û paşeroja min ya li welat ve girêdayî ne. Bêguman biyanîti, xerîbî ji bo şaîran carinan dibin çavkaniyên

baş. Ji ber ku biyanîti dîke ku mirov pira-  
niya çawan li ser xewn û xeyalan bijîn. Ev jî  
ji bo şîrê tiştêkî pir baş e. Gava ez li vir bi  
tenê dimînim, ez di xewnerojka xwe de di-  
çim Kurdistanê, diçim nava refên pêşmer-  
geyan, diçim gund û bajarên Kurdistanê,  
diçim zarokti û xortaniya xwe. Ev jî dîke  
ku ez bîranînên xwe bi gotinan bihûnim.

– *Tu pevgerêdana edebiyat û siyaseta çawan dinivîstî? Nêrîna te li ser termên "Huner ji bo huner, an jî huner ji bo partiyê û civakê çi ye?"*

– Gava em dibêjin siyaseta, ger armanc  
fîkrên siyasî be, li vê dinyayê tiştêkî tune  
ku ne siyasî be. Hemû têkiliyên civakî, tê-  
kiliyên mirovan, jiyana bi xwe siyaseta e. Ger  
armanceke me ya guherandinê hebe, tê wê  
maneyê ku em siyaseta dikin. Lê divê mi-  
rov siyaseta û îdeolojiyê jî hev veqetîne. Di-  
vê mirov ferqa îdeolojiya ji bo grûbekê an  
jî ji bo partiyekê û ya siyaseta giştî bibîne.  
Bêguman edebiyata ji bo grûbê û partiyên jî  
hebû û wê her hebe jî. Bi bawerîya min ya  
giring ew e ku edebiyatavan çawan dinivî-  
stîne. Ew bi grûbekê ve, bi partiyekê ve girê-  
dayî ne, ne girêdayî ne, zêde ne giring e, ya  
giring şeweyê nivîsandina nivîskar e. Bo ni-  
mûne şair hebûne ku ji bo meseleya siyasî  
nivîsandine, lê şîrên pir baş nivîsandine.  
Herweha şair hene ku qet ne siyasî ne, lê şî-  
rên pir xerab nivîsandine. Herçî em kurd  
in, em çî bi partiyên ve girêdayî bin çî ne  
girêdayî bin, em hemû siyaseta dikin. Em  
di romanên xwe de, di çîrokên xwe de, di  
şîrên xwe de behsa kurd û Kurdistanê di-  
kin, behsa azadiya kurdan dikin, behsa pê-  
şeroja Kurdistanê dikin, ev hemû siyaseta e.

Lê, ev jî şîra propoganda û sloganên cihê  
ye. Di vir de tiştê giring ne nivîsandina ji  
bo kê û ji bo çî ye, lê nivîsandineke çawa  
ye. Ez li ser keçekê, li ser çemekî, li ser şehî-  
dekî, li ser bajarekî dinivîstînim, lê ez çawan  
dinivîstînim, bi ya min ya giring ew e. Min  
ji bo gelek şehîdan şîra nivîsandine, lê ya gi-  
ring ew e min ew çawan nivîsandine.

Lê tiştêkî din jî heye, divê şair ne bi emir  
û fermanan şîran binivîstîne. Şair çawan his  
dîke, dixwaze çawan binivîstîne, divê ew wi-  
lo binivîstîne. Divê jî şair re sînora neyên da-  
nîn. Ger ew dixwaze ji bo partiya xwe bini-  
vîstîne, bila binivîstîne, dixwaze ji bo evîne  
binivîstîne, bila binivîstîne, dixwaze li ser  
xwezayê binivîstîne, bila binivîstîne, dîsan jî  
ya giring ew bi çî awayî û çawan dinivîstîne.  
Pîvan ne mijar, lê kalîteya şîrê ye. ■

## Avahiya Rojê\*

Êvar im ez  
dilop dilop  
dikevim ser rojavahiya xerîbiya xwe  
Ey avahiya rojê!  
Neçe ji ber ku  
ta sibe êvarê tu vegeŕî  
li pey te  
yek bi yek  
digirîn peyvên min  
ey avahiya rojê!

## Şêrko Bêkes

## Êş

Ez êşeke bejin bilind im  
bêyî ku herim ser milê xemeke din  
birîn li ku be min dibîne  
hejar li ku bin ez dibînim.

## Derb

Li cem min îro  
serê şîr û serê bizmar  
weke hev in.  
Dema nukilê tûj yên herdûyan  
bi kûr ve diçin  
li ser şîr derba êşê  
li ser bizmar derba çakûç.

## Hêvî

Eger evîna te baran be  
va li ber rawestime.  
Eger evîna te agir be  
va li navê rûniştme.  
Ey evîna Kurdistanana min!  
Helbesta min dibê  
ta baran û agir hebe  
ez jî her heme.

Şêrko Bêkes


\* Ji "Ji Nava Şîrên Min" bi wergera Rûken Bağdu Keskin û Bedran Hebîb, Weşanên Avestayê.

# Hevpeyvîn bi KEMAL BURKAY re

**Nûdem:** *Gava navê Kemal Burkay tê gotin, pêşî siyasetvaniya wî û paşê jî şairiya wî tê bîra mirov. Lê mîna tê zanîn, te heya niha jî şairekî profesyonel bêtir pirtûkên şîran derxistine. Mîna siyasetvanekî profesyonel, tu çawan wexta nivîsandina ewqas şîr dibînî?*

**Kemal Burkay:** Ez him jî şîr hez dikim, him jî ew bo min rê û olaxek e bo çêkerekirina bîr û baweriyên xwe. Di vî warî da siyaset bo min çî ye, şîr jî ev e.

Bi raya min, meriv çiqas bi karên din, wek bi siyasete mijûl be jî, bo mijûliyên wek şîr dîsa waxt dibe. Bes dil û daxwaz hebe.. Bo hemû tiştan, heya bo siyasete



H  
E  
V  
P  
E  
Y  
V  
Î  
N

bi xwe jî usa ye. Zeman bi tena xwe ne bes e. Ger ew daxwaz, ew şewat ne be, çiqas waxtê merivan hebe jî pere nake.

Rast e, siyaset karek e, divê bê kirin. Divê tu waxta xwe vala derbaz nekî, berpirsiyariyên xwe bi cî bînî. Bi raya min ez karê xwe yê rêxistinî di waxtê da dikim; mijûliya min li ser şîer nabe astengek li pêş wan. Her usa jî meriv nikare tim, rojê bîst û çar saet bi siyasetê mijûl be. Meriv diweste û guhartin jî divê. Meriv dikare bimeşe, bi hevalekî ra suhbet bike. Meriv dikare li filmekî binêre, yan roman û çîrokekî bixwîne. Meriv dikare bi hunereke xweşik, wek muzîk, resim û şîer mijûl be.

Helbet şîer jî merivan diwestîne, û gelek caran qasî babeteke siyasî û felsefî diwestîne. Divê tu bala xwe li ser kom bikî, kûr bifikirî, bidî û bistînî. Şîer gelek caran wek zayînê ye û zayîn bê êş û zehmet nabe. Lê westana karê siyasî û ya şîer cure cure ne. Çawa ku meriv ji xwarina goşt û sawar bêzar be jî, dikare li ser baqlewêkî bixwe.

Lê di vî warî da sal ne wek hev in. Hin salên min, heya hin demên salê bo şîer bi bîhn û bereket e; têr diçinim, berhev dikim. Lê hin caran jî dem û sal hişk in, bê ber in. Ger tu bêjî çima, bersîvek hazir li ba min tune; ew ji bo min jî wek pirs e.

– *Tu dikarî ji kerema xwe re hinekî bi fi-rehî behsa pevgerêdana siyaset û edebiyatê bikî?*

– Di welatê me da, gelek kes şîer û siyasetê wek du tiştên dijî hev dibînin. Helbet ne tenê şîer, bi awayekî giştî, edebiyatê, hemû hunerên xweşik û siyasetê.. Ji ber ku, li welatên şundamayî wek Tîrkiye û Kurdis-

tanê siyaset gelek qirêj bûye. Pir kes siyasetê bo pere û post dikin. Navê merivên siyasî wek derewîn, durû û xweperest derketiye. Dema xelk dibîne, yekî siyasî bi hunerên xweşik mijûl dibe, yan jî, yekî hunermend karê siyasî dike, ecêb dimîne. Dibêje, ev herdu tişt çawa bi hevra dimeşin?

Lê, siyaseta ku em dikin ne bi wî rengî ye. Şerê me dijî zulmê, bo azadiyê ye. Em bi xwe bindest in û refê me jî ya bindest û belengazan e. Ev siyaset merivan nake xwedî pere û post. Ev siyaset ne hêsan e; bi êş e, bi zor û zehmet e, bi xeter e. Lê ev siyaset, her usa jî pak û delal e. Hozanên gel, hunermendên baş, ger di rêxistineke siyasî da nebin jî, azadî û aşitiyê, û sazûmaneke delal dixwazin û bo van tiştan dibêjin, dinivîsin û berheman didin. Hingê, çima hozaniyeke han û siyaseteke han bi hevra ne meşe?

Di dinyayê da gelek nimûne hene ku mirovan karên edebî û siyasî bi hevra meşandin. Helbet hin bi giranî edîp bûn, yan jî usa hatin naskirin. Wek Gorkî, Lorika, Brecht, Neruda û Nazim. Gorkî bolşevîk bû û di nav bahoza şoreşê da cî girt. Lorika ji bo bîr û baweriyên xwe yê siyasî bi destê faşîstan hat kuştin. Brecht sosyalîstekî dilsoz bû, berhemên wî bo guhartina civakê ne. Berhem û jiyana Neruda û Nazim jî usa bûn. Li Tîrkiyê kîjan hozan û nivîskar ji siyasetê dûr maye? Demekî di komîta rêvebirê Partiya Karkerên Tîrkiye da (TIP) Yaşar Kemal, Samîm Kocagöz, Can Yücel, Şükran Kurdakul û ez hebûm.

Di nav hozan û edîbên Kurdan da meriv dikare navê gelek kesan bide. Cîgerxwîn ji

vê yekê ra nimuneyekî baş e. Heya dawiyê li nav siyasetê û tevî karê rêxistinî bû.

Hin caran siyaseta derdikeve pêşiyê. Rêberêkî wek Mao, Ho Şî Mîn, her usa jî şair bûn. Lê şairiya wan li himber karên wan ên siyasî gelek di siyê da ma.

Lê Pîr Sultan? Em wî bi kîjan alî binasin, ji serokiya serhildaneke gelî, yan ji hozaniya wî?

Meriv dikare ji dema berê û ji dema nu pir nimûneyan bide.

Siyaset helbet mijûliyê xurt dixwaze û waxt digre. Her usa jî, bo edebiyatê gelek tiştan hazir dike. Hin caran dar li hev sî dikin û hin nahêlin yê din mezin bin; lê hin caran jî, dar di saya hev da mezin û bilind dibin.. Carcaran difikirim: Gelo, ger siyaseta ne bana, dikaribûm ewqas şîer binivîsim?.

Bi kurtahtî pêwendiyên siyaseta û edebiyatê xurt in. Siyaset, bi rûyekî xwe, bo guhartina dinyayê ye. Xasima, siyaseta şoreşger. Edebiyat jî dinyayeke delal dixwaze, him jî, bi efrandinên xwe dinyayê delal dike. Merivên edîp dema têkilî siyaseta bin, du tişt dibe: Yan qirêjîya siyaseta di ser wan da jî digre, yan jî ew siyaseta delal dikin..

– *Pirtûka te ya pêşî bi navê Prangalar di sala 1967'an de bi tirkî li Tirkiyeyê derket. Piştî wê jî te gelek şîrên bi tirkî nivîsandin. Lê belê, te paşê dest bi nivîsandina şîrên bi kurdî kir. Gelo ji bo çî te girîngiya nivîsandina şîrên bi kurdî dît? ya ku tu ajot ser nivîsandina şîrên bi kurdî çî bû?*

– Kurdî zimanê min ê zarotiyê, ango zimanê dê ye. Lê malûm e, me firsend ne dît di waxtê da hînî xwendin û nivîsandina kurdî bin, edeba Kurdî nas bikin. Me di

meklebên Tirkan da xwend. Di zemanê me da li Kurdistana Bakûr kitêb, kovar û rojnamên Kurdî bi dest ne diketin.

Piştî salên şestî, di hin kovar û rojnaman da, ku bi destê Kurdan dihatine derxistin, bi Kurdî jî yek-du şîer, yan kurtenivîs derketin. Piştra elîfba M. Emîn Bozarslan derket.

Ez di sala 1972'yan da derketim der welat û hatim Ewrûpa. Heya vegeerê du sal li Ewrûpa mam û di wê demê da min li vir kovar û kitêbên kurdî dît. Min xwe da ber hînbûna xwendin û nivîsandina Kurdî. Romana Erab Şemo, Destana Memê Alan û nivîsên Kamran Bedîrxan tesîrek mezin li ser min kirin. Bi Kurdiyê zelal û xweş bûn.

Min nivîs û şîerên Kurdî yê pêşî wê demê nivîsandin. Min ev kar ji xwe ra wek berpirsiyarî dît. Wek Kurdekî doza azadî û rizgariyê dikim, divê zimanê dayîk jî baş bi kar bînim. Wek kesekî ku şîer dinivîsim, çima Kurdî nebe? Min Kurdî bi kar anî û hînî delalî û dewlemendiya ziman bûm.

– *Dewlemendbûna şîra kurdî ya klasîk diyar e. Gelo mirov dikare ji bo şîra kurdî ye nûdem jî eynî tiştî bibêje? Şîra kurdî îro di çî rewş û qonaxê da ye?*

– Şîera Kurdî ya klasîkî berhemê hezar salî ye. Şîera Kurdî ya nûdem hîn teze ye. Êro asteng li pêş edeba Kurdî pir in. Yê herî mezin ew e ku, Kurd hîn ne azad in û di hemû parçan da şerê man û nemanê dikin. Bo pêşveçûna çand û edebê, bo pêşveçûna hunerên xweşik azadî û aşitî divê. Da ku ziman serbest be; xwendegeh, radyo, têlevîzyon, tîr kitêb û rojname hebin; xelk he-



mû hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe be û yekitiya ziman pêk bê. Da ku firsend çêbe û ji nav mîlyonan mirovên jîr û jêhatî, mirovên xwedî huner bikaribin xwe nîşandin. Da ku kitêb, kovar û rojname bêne xwendin, resim bêne frotin û nivîskar û hunermend jî hewes bikin, giranî bidin karê xwe. Ango divê bazar vebe.

Îro gelek kes şîer dinivîsînin. Lê him bazar teng e, him jî şîer bi cure cure zaravan û devokan têne nivîsandin. Mixabin yekitiya zman tune û meriv nikare bigihîje tama gotinê.

Tiştêkî eyan e, di hemû deman da nivîskar gelek bûn. Lê ji sedsalan, ji nav gelek nava kêman kesan heya îro hatiye. Îro jî, ku bo nivîsandin û çapkirinê firsend gor zemanê berê gelek zêde ye û nivîskar pir in, helbet, hemû berhem di warê edebî da giranbuha nabin. Ji wan gelek kêman wê bimînin sibê. Divê ji ser sal û dem derbaz bin ku bê dîtîn, çi diçe, çi li ser bêjîngê dimîne.

Bi raya min, îro jî di edeba Kurdî da şairên hêja û berhemên hêja hene. Lê hêyf, ew bazar tune. Hin caran miştêrî heye, mal tune; hin caran jî mal heye miştêrî tune..

Her usa jî, bihar teze hat, ewê berhemên xwe bide û bigihîne.

– *Şîr ji bo te çi ye?*

– Şîer bo min zimanê delalîyê ye. Meriv bi gotinên şîer delalîyê dide nasîn. Hin kes vî karî bi firçe û reng dîkin, hin kes bi şiklê tîmsalan, cure bi cure.

Delalî di jiyana hemû mirovan da heye. Ew şîweyêkî hezkirinê ye. Delalî hin caran jinek e, hin caran gulek e, roj û baran e.. Daristanek, çemek, behrek te heyran û hij-

mekar dîke. Meriv dixwaze vê delalîyê bîne ser ziman; bi reng, bi şikl, bi gotin bêje. Şîer, wek hemû hunerên xweşik parvakin e. Tu delalîyê nîşanê xelkê didî, dixwazî bi wan ra parva bikî.

Hîsên delalîyê di her mirovekî da heye. Lê herkesek xwe nade ber vî karî. Delalîyên çiyar li ser hemû mirovan, pir-hindik testêrî dîke. Lê her kesek nabe çiyavan, vî tiştî ji xwe ra nake mijûlî.

Şîer bo min, her usa jî, haletek e ji bo eşkerekirina bîr û bawerîyan. Meriv dikare hîsên xwe, bîr û bawerîyên xwe bi bendekî jî eşkere bike, bi çîrok yan şîerekê jî.. Hin caran tesîra du xetên şîerekê ji bendekî dirêj mezintir e. Di çarîneke teze da usa dibêjim:

Hevalo, şîer bo min şûr û mertal, tevger û al e  
Şîer bo min kilam e, stran e, yar û delal e  
Merhemê birînan e, çilke roniyê şeverşan  
Xem û şîn, şahî û evîn, hawar, hêvî û heval e

Ma tenê bo min usa ye? Di hemû berhemên edebî da, di hemû berhemên hunerên xweşik da, wek şîer, çîrok, roman, resim, tîmsal, mîmarî, muzîk û yên dinê; di van hemûyan da tevî hîs, raman jî heye; meriv bi riya van tiştan bîr û bawerîyên xwe jî dibêjin. Mirov bi riya van tiştan di derheqa xwe da, di derheqa dorber û jiyana xwe da dibêjin.

Helbet, bo herkesêkî hîs cuda ye, bîr û bawerî cuda ye. Ji ber ku jiyana cuda ye. Bona vê yekê, delalî bo herkesêkî ne yek e..

Ew guftugo û lec ku dibêjin, huner bo hunerê ye, yan jî huner bo civatê ye. Ew ji

bo min leceke bê mane ye. Ji ber ku jiyana mirovan jiyaneke civakî ye. Ew bi vê civakê heye, di nav wê da şikil digre û bi wê ra dide û distîne. Berhemên hunermendî, her usa jî berhemên civakî ne. Lê merivê hunermend e ku can û şikil dide wan û wan dike xweşik. Ger berhem xweşik nebe, -bo huner, yan bo civakê- bi çi navî dibe bila bibe, hîç e.

Berek, ya kulîlkek li merivan xweş tê, meriv li ser wê dibêje; lê meriv dikare li ser şoreşê jî tiştên delal bêje.

– *Mîna tê zanîn di van demên dawî de muneqeşeya şîra kurdî û şairên kurd têtê kirin. Tu rola zimên di edebiyatê de çawan dibînî û berhemên edebî ku ji aliyê kurdan ve bi Tirkî hatine nivîsandin, aûdî kîjan pirtûkxaneyê dibînî?*

– Şiêr yan jî berhemên din ên edebî, bi kîjan zimanî hatine nivîsandin malê wî zimani ne. Şiêr û romanên ku Kurdan bi Tirkî, Farisî, Erebî, yan jî bi zimanên dinê nivîsandine, meriv nikare bêje ku ew malê Kurdî ne.

Lê ger ew kes Kurd in û xwe Kurd dihesibînin, pêwendiyên xwe bi çand û tevgera gelê xwe wînda nekirine, divê em wan di nav “nivîskarên Kurd” da bihejmêrin. Nivîsên wan bi Kurdî nebe jî, tesîra çand û ruhiyeta Kurdan di berhemên wan da jî xuya dike û pir caran armanc û daxwazên netewî tînine ser ziman. Ango para gelê kurd di wan berhemên da heye.

Li welatên Afrîqa û Amêrika Latîn gelek millet Fransî û Spanyolî bi kar tînin. Lê nivîskarên van welatan ne yê Fransa û Spanya ne, yê wan in.. Heya Tirkan, romanên

Xalîde Edîp ku bi zimanê Fransî nivîsandin bûn li ser pirtûkxana xwe hesibandin. ■

## FEDÎ\*

Ji dengê zikê birçî  
Ax fedî dike  
Ji jana birînê  
Hesin fedî dike

Li kuçe û kolanan  
Bêmal û bêwar in  
Şev fedî dike

Birçî û xasî  
Li rê û dirban  
Li serê çiyar in  
Berf fedî dike

Ji dûmana zer  
Weşin wek pêlan  
Çivîk û zarok bûn  
Mirin fedî dike

Adar 94

Kemal Burkay

\* Ji "Berf Fedî Dike" Weşanên Deng

# Sînorê Girfî

Ç  
I  
R  
O  
K



Haviz Qazî

Tîroşka elindê ji nû dest pê kir riya xwe bi şeqîne di nav ewrên zivistana reş û tarî de vekir. Di şeveke pir dirêj, bê evîn û stare de, bi hezaran kurd ji dojecha cengê baz dan. Li bin tavên barana berdewam, di nav çiyana de borandin. Berê xwe dane sînori, da xwe ji êrîşên helikoptera xelas bikin, ji çekê vebirand û wêrankirinê bi dûr bikevin û ji lepên leşkerên faşîst û hov rizgar bibin.

Wê şeva bi tirs û bi sehim, şûn tiliyên xwe di nav çav û rûmetên mihacira de kêşa bûn. Xetên kûr ji nîşanên westiyane û şepirzebûnê dinexşandî û eşkere bûn. Dema didan nav ava barana di kort û çalan de, ew di nav teqîn û heriyê de dibûrîn. Di bin barên giran de an jî di bin hilgirtina zarokan de nale-nal ji wan dihat.

Jin, zarok û kalan nikaribûn di kawdanên wê roja nexweş de bi rê ve biçin. Tirs, serma û baranê ew bêhêz û bêtaqet kiribûn û pişt li wan tewandibû. Bi rastî dîmenek diltezîn û çavgirîn bû. Êş, jan û kovanên derûn û dilan di azirandin, cergên kevirîn dihelandin. Pênûsên nivîskaran ji livînê dirawestandin û nedikarîn wê rêveçûnê pesin û şirove bikin. Xudanên dev û zimanan lal dibûn; kenkene û fêrisên derhênerên sînema cihanê li hemberî vê karesata bê wêne heyirî û ecêbmayî diman.

Derbasbûna sînorî wek xwezî û mirazek pirr ezîz bû. Hemiyana xewn pê ve didîtin. Lewra guh nedidan kişandina zehmetî û ezîyetê. Di wê rêveçûna ne xweş de, hindî ji wan dihat, pêngavên xwe xurt dikirin, da bigehin armanca xwe.

Dawiya armanca wan li asoyê xuya bû û nêzîkî sînora bûn. Dil li wan geş bû û xwîn hate laşên wan. Hêzeke şidyayî hate dest û piyan, lê gava wan rêzên dirêj yên esker û cendirmeyan dîtin, xwezî û hêviyên wan zû bûn xewn. Esker û cendirmeyan berê çekên xwe dane mihaciran û ew aqehdar kirin ku kes nêzîkî xeta sînorî nebit.

Rêveçûn rawesta, hinik ji rûspiyan ber bi rêgiran çûn, bi navê mirovatiya eşkence û azar day, hêvî û lavlav jê kirin ku, rê bidin mihaciran ji sînora derbas bibin û xwe ji mirinê xelas bikin. Lê ba û bahurê ew qise û hêvî digel xwe birin. Kes ji mezinan guh nedane wan hêvî û tikayan, bi hêceta nehatina çî fermanan ji paytextê, ku rê bidin xelkê ku ji sînorî derbas bibin. Hindî wêvetir bû, rewşa dinê têk diçû û bêtir nexweş dibû. Sir û sermayek qerisî, baranek şidyayî û berdewam. Giriyan zarokên birçî, ketina dehan kesên bêgûneh di nav heriyê de ruh diser de çûyî. Hemî bi carekê li ser feleka xedar ya ku ew dawiya reş û cergîbîr li vê devera xirr û vala li ser eniya wan nivîsî ye, nifir û lanetan dibarînin.


Saet li dû saetê borîn û ew bendewarên hejar li jêr baranê rawestayîyî, dilê kafiran bi halê wan dişewitî, melûl û stûxar, li hember çekdarên rêgir, rezil û sefil rawestayî bûn. Mîlên saetê dirêj bibûn nîva rojê, dema hindek ji rûspiyan pêşniyaz kirî: Bi çî rengê heye, divê xelk li sînora bidin û bişeqnîn, heta eger ew şeqandin bibe sedema kuştina hindek kesên jin jî, bi gulebarana esker û cendirmên amade ji bo reşandina agirê çekên xwe. Dan û standinê domand û demeke dirêj kêşa. Heku dîtin çî rê li ber wan nemaye ji bilî derbaz bûnê, da zaro, jin, kalan û bêhêzan li wê derê binax nekin, biryara derbazbûnê dan... Derbazbûna dused hezar kurdên mihacir ji sînorî destpêkir. Yekser cendirma agirê çekên xwe arastey sîngê xelkê bê çek, jinên, zarokên berşîr û kalên rahejyay kirin. Bi dehan kes ketin ser xetê sînorî û di xwîna xwe de gevîzin, lê ew agir û gulebaran nekarî xelkê bêdeng û dilşikestî rawestîne. Nêzîkî bîst deqîqan gulebaran berdewam bû, lê heku mezinên eskerî dîtî qesabxaneka mirovan ya bi sehim wê çêbikin, ferman dan esker da agirbaranê nekin û bi paş de vegerin...

Wê demê xelkê termên kuştî û birîndaran ji erdê rakirin û gişt bi hev re ji pesarê bilind derbasî sînorî bûn û ber bi newalê ve çûn. Ji dûr ve gundekî sînorî yê hejar kete ber çavan, xaniyên nizim bi teqne ava kirî, nêzîkî sîh kolkên mîna axur û gonên dewara bûn.

Piştî ku cendirman nehiştin ew xwe nêzîkî gund bikin, wan cihên xwe di nava herî û çiravê de çêkirin û di bin barana bêdawî de li benda hêviyekê man.

Mihaciran xwe teslîmî qedere kirin û biryara çarenûsa xwe ya berze, di destên felekê de hêlan...! ■

## Metodeke zanyarî ya edebiyatê



Şerefxan Cizîrî

Li ser edebiyat û metodên edebî, em gotûbêjên zanyarî Lû kûr nakin. Sohbet û gotûbejên me, bi pîranî li ser tiştên şeklî û biçûk kom dibin. Di warê edebiyatê de ev biçûkbûn û bişeklîbûn, piraniya caran probleman bêtir tevlîhev dike. Li şûna ku em ê pêşde biçin, em di eynî warî de derziyan dihejmêrin. Li şûna ku em bedewbûna daristanê bibînin, em yeko yeko li ser bedewbûna darekê diaxivin. Di warê zanyarî û gotûbêjiyê de problemên me yên metodîk hene. Gotûbêjên me weke zilindarê ne. Hûn dizanin zilindar çi ye? Zilindar tiştêkî ji tehlîyê tehlîtir e! Ev rastiya tiştêkî pirr zelal e ji bona me.

Li aliyê din; pirr gotinên pêşiyê kurdan hene ku, mirov dikare di warê metodolojîk de, ji wana tecrûbeyên pirr baş derxîne. Ez dixwazim li vir du gotinên bav û kalan weke mînak bidim; "Ji libek tirî mahserak nayê lidarxistin", "Ji şelîman mirov nikare peqlawê çêke". Di van gotinan de problemên metodolojî tenê ziman. Heger firaxê ku mirov pê kar dike çewt bin, mirov nikare bigihîje armancên xwe. Bi rastî û bi kurtî; Ji şelîma peqlawe çênabe, ji libek tirî jî mahserak li dar nakeve. Bi kurtî mirov dikare bîne ziman

ku, di civata kurdan de pirr mirov, ji libek tîrî mahserayekê li dar dixin û bi kûzan (kûpan) jî, jê dimsê derdixînin! Ji xwe ewê ku, ji şeliman peqlawê jî çêkirine, di civata me ya îro de pirr baş dewlemend bûne!

Divê civata kurdan bi hemû awayî hewl bide ku, ew bibe xwediyê kultura avakirina zanyarî û teorî. Dema ku avakirina zanyarî û teorî, ne bi metodên hostan û materialên rast bimeşe, wê çaxê civata kurdan dibê xwediyê bingehê xerabe. Di warê zanyariyê de divê akûmûlasyona me roj bi roj zêdetir bibe. Yanî bi kurtî û bixweşi, heger kurdan di warê zanyarî û teorî de kevîrek danîn derekê, divê hemû entellektûlên kurdan daxwaz bikin ku ew jî kevîrekî deynin ser vî kevîrî. Lê mixabin, pîraniya caran kevîrê ku li ser hev in jî, ji aliyê hinek mirovan de têne hilweşandin û li şûna van jî tiştekî nû nayê avakirin.

Bi vê bêmetodiyê û bi vê zexeliya manewî, tucaran avakirina teorî, metod û rexnekirina tekstên edebî, bi awayekî baş nikare pêşda biçe. Ji bo ku nivîskarên kurd bikaribin rexneyên zanyarî û edebî li hevdu bigirin, divê beriya hemû tiştî ev rexneyan, bingehên xwe ji ekolên zanyarî û edebî bigirin. Gotin, mînak, raman û aletên analîzkirina tekstên edebî, divê piştî xwe bide zanyariya edebiyatê, dîroka edebiyatê û zanyariya lengûvîstîkî. Dîroka edebiyata çîhanê di vî warî de tije lêkolîn û xebat e. Ji aliyekî de ev sîfre tekûzkiirî û amadekiirî ye. Karê kurdan di vir de, pirr hêsanî bûye. Mirov dikare vê zanyarî û edebiyatê, bi

awayekî berbiçav bixwe xizmeta edebiyat, kultur û zanyariya kurdî. Lê pîraniya entellektuelên kurdan bûne weke tiralên Baxdayê, ew êdî bi xwe re nabinîn ku xwarinê jî bixwin. Ew ji rexne û gazinan re pirr xurt in. Ew ji gemarê bi taybetî gazinan dikin, lê belê devê deriyên xwe jî paqij nakin. Li şûna ku mirov her gav gazinan ji tarîtiyê bike, divê ji îro û pê de mirov hewl bide ku îcar mûmekê pêxîne...

Di dîroka edebiyatê de, metodên edebî xwediyê derbasbûneke zanyarî û pirr dewlemend in. Mirov ji bo mînak dikare li vir çend metodan bihejmêre; Pozîtîvîzîm, marksîzm, formalîzm, strukturalîzm, modernîzm, psîkoanalîzm, hermenevtîk, humanîzm ûhw. Hemû metod xwediyê dîtînen bi taybetî ne. Bi hezaran berhem di warê nakokiyên metodîk de hatine nivîsandin. Hinek metod pirr dûrî hev in, hinek jî pirr nêzikî hevdu ne. Hinek metod raste rast li dijî hevdu ne, hinek jî hevdu timam dikin û li hev siwar dibin. Ji bo mînak ez bêjim; mirov bi hêsanî dikare behsa marksîzmeke strukturalîst, humanîzmeke modern, formalîzmeke pozîtîvîst, û hw. bike. Yanî bi pirranî metodên edebî û zanyarî, dikarin bibin alîkarê hevdu, dikarin dîtin û ramanên nû li hevdu zêde bikin û dikarin, ji sedî sed jî li dijî hevdu bin.

Ez di vê nivîsarê de dixwazim behsa strukturalîzmê, an jî strukturalîzmeke marksîstî bikim. Helbet metodê strukturalîstî, metodên pirr fireh in. Mirov nikare di nivîseke wuha de bi kurtî, hemû babetên

strukturalîstiyê bi başî bîne ziman. Lê ez li vir daxwaz dikim ku di vê kurtenivîsê de, strukturalîzma ku li Ewropa Rojhilat hatiye formûlekirin, bidim nasandin. Cewhera ku di pîrr aliyên de di vê metoda strukturalîstî de hatiye ziman, ez di vê kurtenivîsê de dixwazim raxînim ber çavên xwendevanan.

## Baş e, strukturalîzma çi ye?

Li gora profesorê Zanyariya edebiyatê Kurt Aspelin, mirov bi kurtî dikare strukturalîzmê wuha îzah bike; "di bin navê strukturalîzmê de, zanyaran her a îro behsa gelek babetên xebatan kirine". Mirov dikare dibin vî navî de zanyariya sosyalantropolojî mînak bide. Di vî beşê zanyarî de li ser mîtoolojiyê lêkolîn hatine kirin û navê helî naskirî jî di vê xeta zanyariyê de ne derketine meydana. Di vê xebatê de nivîskarê pîrr bi nav û deng Claude Lévi-Strauss e. Pîrr caran felsefeya Louis Althusser ya marksîstî jî, bi navê strukturalîzmê hatiye binavkirin. Xebata Fredinand de Saussure ya ku li ser ziman û lengûvîstîk hatiye kirin, ev jî bi navê strukturalîzmê hatiye nasandin. Her wuha li Sovyetîstana kevn, bi navê "Tîpolojîya Modela Kulturana", dîsa ji hêla metodên zanyariyê de xebatên strukturalîstî hatine çekirin. Dîsa li Germanîstanê, grûbeke zanyar xebat li ser "gramera helbestan" çekirine û daxwaz kirine ku vê teorî û xebatê formalîze bikin. Ev xebat jî bi navê strukturalîzmê tê binavkirin. Di warê zanyariya teorî de, pîrr caran gotina strukturalîstî weke îdeolojiyê geştî tê bikaranîn. Mirov di-

kare bêje ku, li Frensa jî strukturalîzma her gav weke îdeolojîk li hemberî marksîzma û eksîstensîyalîzmê hatiye bibîranin...

Pîrr hewl dan hatine kirin ku strukturalîzmê weke zanyariya tekstên edebiyatê bidin rûnstandin. Beriya hemû tiştî strukturalîsttan daxwaz kirine ku hunera edebiyatê derxînin pêş û cihêkî bi taybetî bidin tekstên edebî û hunerî. Wan helwêdanên ku bersiva vê pîrsa jêrîn bidin; Çima hinek tekst dibin tekstên edebî? Weke tê zanîn rapora li ser çalakiyên komelayekê jî, weke tekstê tene binavkirin. Lê em hemû baş dizanin ku rapora çalakiyên komelayekê nabe tekstên edebî. Yanî bi kurtî mirov divê karibe pîrr bi hêsanî, bersiva pîrsa edebiyat û huner çi ye? bide.

Ji bona ku zanyar karibin bersiva vê pîrsê bidin, li Rûsyayê ekola formalîst hewl da ku metodên formalîst û referensên sosyolojîk bi hevdu re bidin hûnandin. Ekola formalîst beriya hemû tiştan giraniya xwe da ser teknolojîya huner û edebiyatê. Wan daxwaz dikirin ku hunera huner, yanî babetê ku nivîskar û hunermend pê karê xwe dimeşand, derxînin meydana. Dîsa wan li ser fabrikasyona huner, yanî huner weke pêvajoya maddî analîz dikirin. Li aliyê din jî, ekola formalîst behsa tesîrên ku bi hişmendî di huner de hene, derxîne pêş û van qiyemetan şirove dikirin. Ev metodê formalîst, dixwest ku di bingehe xwe de, çarçuvakê ji xebata edebî û hunerî re bibînin. Ji ber vê yekê jî wan digotin "berhema estetîk", "avaniya tekstên edebî" û "teknolojîya na-

veroka tekstên edebî” ûhw. Armanc bi kurtî ev bû; paqijkirina tekstên edebî ji derdora xweyî sosyolojîk û avakirina (îzolekirina) ”edebiyateke paqij” e.

Yek ji van edebiyatzanê rusî ku di vî warî de xebatên balkeş kirine Roman Jakobsson e. Roman Jakobsson li ser hîmê ekola formalîst, daxwaz kir ku hinek tiştên nû biafirîne. Armanca wî ew bû ku; formalîzm û strukturalîzmê nêzikî hevdû bike. Di xebata xwe ya bi navê Helbest û Lengûvîstîk (Poetik û lingivîstîk) de, Jakobsson behsa zimanê helbestan û zimanê komunikasyonê dike. Zimanê komunikasyonê, yanî zimanê rojane û zimanê helbestan nikare bibe weke hevdû. Divê di zimanê helbestê de, agahdarî û mane hergav ji zimanê rojane bêtir be. Jakobsson pirseke wuha dike; ”Ya ku mesajeke bi gotinî dike huner, çi ye?” Ji bo mirov bikaribe bersiveke baş bide, divê cudabûna zimanê helbestan û zimanê rojane gelekî zelal bibe. Di zimanê rojane de danûstandin wuha dimeşe; ewê ku mesajê bi rê dike (xwedî mesaj) - mesaj bi xwe- û ewê ku mesajê digre (mesajgir). Di danûstandinên rojane de ev her sê xal weke hevdû girîng in. Lê di zimanê helbestvanîyê de mesaj, hergav dibe navenda komunikasyonê. Di tekstên helbestan de, hergav pirbinîbûn û piralîbûn heye. Helbest nikare tenê li ser biniyekî ava bibe. Di helbestê de agahdarî û mane piralî ne. Pîrr mirov divê karibe xwe di helbestan de, di tekstên edebî de, di stranekê de nas bike, xwe bibîne û xwe bi mesaja tekstê re bike

yek. Di mesaja ku di helbestan û tekstên edebî de hene, hergav divê pîrralîbûn hebe. Bi kurtî mirov dikare bejê ku tekstên ku ji hêla mesaj de hêsani be, nikare bibe hune-reke pêşketî.

Di xebata strukturalîstî de navê Mikael Bachtin jî gelek derbas dibe. Bachtin beriya hemû tiştan rexne li formalîzmê girt û got ku avaniya hunerî, nikare ji derdora xwe were îzolekirin. Li gora Mikael Bachtin divê huner weke diyalogekê û komunikasyonekê were pejirandin. Di pêvajoya dîrokî de hergav mesajek heye, ev mesaj nikare ji derdora xwe ya îdeolojîk û sosyal were qetandin. Bachtin dibêje ku formalîst dixwazînin hunerê bikin ”weke tişteki bêmane, yanî weke tiştên ku di fetîşîzma mal de heye”. Lê belê edebiyat û huner ne weke malekî ku li bazareke kapîtalîstî tê kirin û firotin e. Weke tê zanîn malekî li bazareke kapîtalîstî, malekî serbixwe ye. Ev mal bi xwe, bi malên din re xwe dide terenpekirin. Lê di rastiya xwe de ewê ku mal bi hevdû re didin guherandin, mirov bi xwe ne. Mirov bi mirovan ve têne guherandin, lê ev yeka ji me re weke ku mal bi mal tê guherandin xuya dike. Mirov tu çaran nikare huner û edebiyatê, bi vî awayî fahm bike.

Li gora Bachtin divê metodên edebiyatê li ser bingehên Fahmkirinê - Tercûmekirinê - Îzahkirinê bêne rûniştandin. Mirov divê him tekst û him jî kontekstê (tevgirêdanê) baş fahmbike û wan analîz bike. Bi kurtî civatê di edebiyat û hunerê de, huner û edebiyatê jî di civatê de, mirov divê kari-



be nas bike. Bi vî metodê zanyarî Bachtin, xebateke pîrr hêja li ser nivîskariya Dostoyevskî kiriye.

Yek ji van navên ku dibin ekola strukturalîstî de, pîrr caran derbas dibe zanyar Jurij Lotman e. Lotman ku zanyarê edebiyatê ye, bingehê xwe li ser hîmê formalîzma rusî ku 1910 -1920 hatibû pêşdaxistin ava dike û pîrr caran vê pîrsê ji xwe dike; Çima hewcedarî bi huner heyê? Weke ku tê zanîn hemû civat xwediyê huner in. Ev huner dikare pîrr pêşketî be û ev dikare jî pîrr lipaşmayî be. Lê tu civatên bê huner, heta nuha peyda nebûne. Hemû civat xwediyê huner in. Tenê ev tiştê han yê berçav nîşanî mirovan dide ku di civatê de pîrs û hewcedariya huner ne problemeke hêsanî ye. Lotman di pirtûka xwe ya ku bi navê "Teksta Helbestî" de hatiye nivisandin wuha pîrs dike; Çima helbestek tenê dikare ji pirtûkek prosa bêtir, îfade û manê bîne ziman? Huner divê karibe pîrr mana li piştê xwe bike û ji aliyê manan de jî dewlemend be. Weke tê zanîn; tekstên hunerî di avaniya xwe de dikarin gelek înfomasyona temor bikin û bi xwe re vê yekê hilînin.

Mirov dikare wuha bibejê; tu tekst, tu gotin û tu huner nikare tenê weke tekst, tenê weke gotin û tenê weke huner bê fahmkirin. Pîrr caran di felsefa Emmanuell Kant de behsa " tişt di xwe de " tê kirin. Yanî, "tekst di xwe de", an jî "gotin di xwe de" dikare pîrr caran bê mana îdealîzm û mîstîsîzm bi hevdu re. Em vîna baş dizanin. Tekst û gotin bi vî metodî, ji mercên xwe

yê civakî, kulturî û polîtîk tene îzolekirin. Lê di rastiya xwe de hemû tişt di nava danûstandike pîrr berbiçav de derdikevin meydanê. Mirov dikare pîrr bi hêsanî tiştan bi awayekî gîştî, bi dijayetiya van û bi danûstandinên van re nas bike. Li vê derê mirov dikare wuha bibêje, di huner û edebiyatê de realîzm divê hîn bêtir bê firehkirin û tixûbên wê hîna mezintir bibin. Huner û edebiyat tenê nikare bibe "mirêka rastiye". Mirêk nikare hemû maneyên ku huner û edebiyat dixwaze îfade bike, bîne ziman û ronahî bike. Heger ev yeka ewqas hêsanî ba, ewê fotografi hunera helî mezin û realist ba. Lê em hemû baş dizanin ku huner û edebiyat di derheqa rastiye de, xwe tenê kare îfade bike, di derheqa rastiye de, ew tenê mirovan dikare agahdar dike û dixwaze ku rastiye bîne ziman.

Huner û edebiyat divê him bişibe û him jî neşibe objeya xwe. Ew divê objeya xwe bi xwe re hilîne, lê nabe ku ew bibe objeya xwe bi xwe. Huner û edebiyat divê bibe modela rastiye, lê ew nikare bibe rastî bi xwe. Em hemû dizanin ku rastî tişteke û modela rastiye jî tiştêkî din e... ■

# Ciwan Haco; Avakirê Kurdish Rock

**Nûdem:** *Tê gotin ku mirov hînê hunerê nabe, lê mirov hunermend tê dinyayê. Tu ji vê yekê re çi dibêji?*


**Ciwan Haco:** Bi baweriya min huner di dereca yekem de komeleyek hest e û hest jî ew tiştin ku nayêne hînbûn. Behremendî (talant) bê goman nabe nesîbê her mirovî, loma jî mirov dikare bêje ku mirovê hunermend gava tê dinyayê di cewherê wî yan wê de rayê hunermendiyê heye. Kî dizane belkî niha zanyarên teknolojiya gênan (genteknologi) dikarin bizanibin ka kî ê bibê hunermend û kî ê nabe?! Lê em hemû jî dizanin ku behremendî dereceyên wê jî hene, hin kes biserdikevin û tiştên hêja diafirînin û hin jî li paş dimînin. Her çawa be, behremendî nagihije pêpelûka hunermendîya baş eger bandûra hişmendî û zanîne lê çênebe, eger neyête şahîkkirin û bipêşve nekeve.

– *Muzîk ji bo te çi ye, tê çi maneyê?*

– Muzîk ji bo min îro pişe û wateya hebûnê ye. Ez xwe pê xwedî dikim û bi xêra

wê maneyekê ji jiyane re dibînim. Lê belê eger pirs ew be gelo muzîk çi ye, ez ê hinekî bi şûn ve vegerim. Muzîk mîna fênomenekê civakî her û her û bi dezgehên olî ve girêdayî bû. Di civakên prîmîtîv de jî herweha hişk bi teqşên (ritual) cihêreng ve girêdayî bû. Paşê di civakên derebegî de, ji bilî wezîfeya ayînî, muzîk bû xwedî wezîfeyekê bêhtir dinyayê û motîvên ji olê der di muzîkê de peyda bûn û navê vî şeweyê muzîkê ku ta roja îro pir belav e, muzîka gelêrî ye, ku bi xêra dengbêjan jîndar maye. Li welatê me ji sedê salan ve û belkî jî ji hezarê salan ve, ev rengê muzîkê serdest e û her weke xwe maye. Li welatên xelkê û yê cîran ji hemdema navîn ve muzîkvanên kuhne, yanî komponîst, peyda bûne û îro li piraniya dinyayê muzîk amojgeheke (institution) bi serê xwe ye. Loma muzîk berî her tiştî fênomenekê civakî ye û rewşa wêran ya muzîka kurdî ji rewşa wêran ya civata kurdî tê.

– *Tu muzîka xwe çawan çêdiki? Tu li ser*



*Ciwan Haco (Foto: Nûdem)*

*notayê dixebitî an mîna gelek hunermendên kurd bê nota dixebitî?*

– Ez carcaran notayê bikartînim, lê baweriya min bêtir bi îlhamê heye, yanî eger bû û awazek hate hişê min, bere pir kurd be jî, ez yekser tomar dikim û li ser bingeha wê kurteawazê stranê dihûnim. Gelek caran jî bi tevayî, ez û sazbandên ku bi min re lêdixin, bi hev re dixebitin û rengê stranê yê dawî didinê.

– *Girîngiya notayê di muzîkê de çi ye?*

– Girîngiya notayê bi ya min ew e ku muzîk li ser kaxezê were qeydkirin û bi vî awayî her kes li her devera cîhanê bikaribe bixwîne û lêbixe. Ev nirxa bêhtir di muzîka orkestralî û koralî de tê xuyakirin, ji ber ku parçeyên muzîkê pir dirêj in û wekî din jî hejmara sazbandan yan jî dengbêjan pir zehf e. Di muzîka min de ev pir ne girîng

e, lê ez dîsa jî dibînim gaveke bi pêş de ye dema muzîkvan bi notayê bixebite.

– *Di stran û awazên kurdî yên klasîk de dewlemendiyeke xurt xuya dike. Gelo hêza vê dewlemendiye jî ku tê?*

– Dewlemendiya muzîka kurdî ya klasîkî li ba piraniya kurdan hatiye pejirandin û hinek rastî di vê îdiayê de heye. Pirrengiyeke ku nayê înkarkirin di zargotina kurdî de heye û ev jî cihê serbilindahiyê ye. Lê belê tişteki diyar e ku muzîka kurdî di warê miqamên muzîkê de ji muzîka cîranên xwe, çi ereb, tirk, yan farisan dewlemendtir e. Pirrengîti jî bi baweriya min nêzik bi siruştaya Kurdistanê ve girêdayî ye. Çiya û şaxên bilind, newal û geliyên kûr hiştine ku komeleyên biçûk û belav li seranserê welêt, ta ra-deyekê, bi awayekî jî hevqut û otonom bi-jîn. Pirrengîti di muzîkê de, mîna gelek ali-

yên din yê jiyânê, ji vê tê.

– *Lê te xwe ji tradisyona muzîka kurdî ya klasîk qut kiriye. Çima?*

– Ev îdiayeke ne rast e. Bê goman muzîka min ne tradisyonî ye, yan jî kevneşopî ye mîna hin dibêjin, lê belê min xwe ji muzîka kurdî qut nekiriye. Ez li Kurdistanê mezin bûme û li ser muzîka kurdî hatime perwerdekirin û zargotina kurdî di xwîna min de ye û nikarim xwe jê bişom. Tona bingehî di muzîka min de her kurdî ye, wekî din jî êlémentên folklorî di muzîka min de pir in û diyar in, çî newhirandin yan jî qîr kirin. Wekî din jî stranên xurû gelêrî, mîna "Ziravê" ya Miradko, dibêjim.

– *Edebiyata modern, hunera modern, muzîka modern bi piranî ji civatên modern der-tên û xîtabî mirovên civatên modern dikin. Ger em ji muzîka te bi rê bikevin, em ê bikaribin bibêjin ku ev celebê jiyana modern di civata kurdan de jî peyda bûye?*

– Bê goman, erê. Îro belkî zêdeyî ji sedî heftêyê kurdan li bajaran dijîn, çî li Kurdistanê û çî li metropolên dagîrkeran. Nêzikî nîv mîlyon kurd jî li Ewropa û Emerîkayê dijîn. Jiyana modern bi xêra teknolojiya taze gihîştîye ta bi gundan jî. Wekî din jî xwendin di salên dawî de pir belav bûye û hejmara kurdên xwedî tehsîla akademî her diçe zêde dibe. Tevî vê qasê, eger jiyana modern di nava kurdan de hewqasî ne belav bûbe jî, sedema wê rewşa konevaniya ku taqeta gelê kurd û potansiyela wê ya modern difetisîne. Lê nîşanê jiyana modern li ba kurdan di her warê de xwe didine der, di muzîkê de, di sînemayê de, di warê ragihandinê de (MED TV), di warê çape-

meniyê de kovara we jî nîşaneke vî tiştî ye. Lê pêwîst e em ji bîr nekin ku em li gora xelkê hîn pir lipaşmayî ne.

– *Lê belê motîvên civatên modern ne şer û pevçûn, kuştin û koçkirin e; problemên îndîvid, psîkolojiya civatê, evîn, erotîzm û hwd e. Çima motîvên di vî babetî de di muzîka kurdî ya îroyîn de kême?*

– Ev tişt rast e. Muzîk mîna şeweyekî xwederbirînê (te'birê), helbet wê problemê civakê ji xwe re weke motîv bigire. Problemên ku te li jor anîne ziman, problemên civakên îndustriyalîst in. Civaka me jî mîna civakeke li ser rîya moderntiyê pirsgirêkên wê yê bi vî hawî hene, lê ne bi dijwariya wan civakan. Li welatê me dagîrkerî sedema her tiştî ye, em wisa bawer in ku rizgarbûna Kurdistanê dê hemû probleman çareser bike. Îndîvid di vê merhelê de ne hewqasî di navenda mitalan de ye û ev jî tê famkirin. Ger tu îro bala xwe bidî Bosnayê tu ê bibînî ku rewşa welatê wan gişt hema motîva tenha ye ku hunermendê wan pê mijûl dibin, digel ku Bosna berê ne wisa bû û hunermendên wan mîna yê her civakên modern mijûlî pirsgirêkên din bûn.

Wekî din jî heja ye bêjim ku motîvên muzîka roavayî ne tenê ewên te li jor gotî ne, muzîkvanên Rock li Emerîkayê serêşayîyeke mezin ji hukûmetên welêt re çêkirin derbara pîrsa şerê li dijî Vietnamê; îro jî birçîtî, feqîrî li dinyayê û rewşa hawîrdorê têmayên germîn bona muzîkvanên roavayî ne.

– *Gava mirov klasîfikasyonêke muzîka te bike, mirov ê muzîka te têxe kîjan kategori-*

ye?

– Ev pirseke ku pir ji min tê pirsîn û bersiva wê ne hêsan e. Di muzîka min de elementên ji gelek texlîtê muzîkê hene, mîna blues, rock, jazz û hwd. Û weke min gotî muzîka min di hîmê xwe de kurdî ye û ji her cûreyên muzîka kurdî element tê de hene. Li Ewrûpa van salên dawîn di nav komeleyên mahcir de, nemaze li Brîtanyayê, tevgerêke muzîkê bi hêz peyda bûye. Bi vê re terma "ethnic rock" hatiye meydanê û di dinyaya muzîkê de cihê xwe girtiye. Muzîka min jî bi gelek awayan dişibe vê texlît muzîkê. Bi baweriya min terma "kurdish rock", yanî rocka kurdî, wê navekî di cihê xwe de be.

– *Muzîka Emerîka Latînî, ya erebî, ya franstî, ya ewrûpayî bi giştî navneteweyî bûye; gelo sebebên ku heta niha muzîka kurdî navneteweyî nebûye, çi ne?*

– Navnetewîbûna çî muzîkê û çî hunerên din pirseke piralî ye. Ew hem aborî ye, hem konevanî ye, hem zimanî ye, hem teknolojî ye, hem dîrokî ye û hem jî hunerî ye. Eger muzîka ewrûpayî îro navneteweyî ye, ew ji giranî û girîngiya Ewrûpa di qada dinyayê de tê. Çawa îro Roava hewl dide uslûbê jiyana xwe, nîrx û baweriyên xwe bi cîhanê tevî bide qebûlkirin mîna norma herî rast û baş e û ta radeyekê bi ser ketiye, wisa jî hewl dide çanda xwe, di nav de muzîk, bi eynî şeweyî bide pejirandin. Bona vî tiştî ev welat her wesîleyan bi kar tînin, carnan bi xweşî û temakirinê û carnan bi tehdît. Lê helbet evê bi ser biketa eger muzîka wan nexwedî nîrxekî hunerî baya. Ev nayê înkarkirin. Mebest ew e ku navneteweyî-

bûn şertên wê hene ku li ba kurdan hal hazir peyda nabin. Yek dezgeheke kurdan ya navneteweyî nîn e, di dinyayê de kurd hatine naskirin ku ne xwedî çandêke kevnar û berfireh in, muzîka kurdî şeweya wê ji her alî ve nizm e, muzîk nebûye îndustriyêke qayim, em hindik in û ji dinyayê îzole bûne.

– *Divê têkiliyên huner û polîtîkayê çawa bin? Tu hunera ji bo polîtîkaya rojane çawan dibînî?*

– Bi baweriya min huner û polîtîka ji hev nayên cudakirin. Tesîra polîtîkayê li ser jiyana mirovan ya rojane heye, û loma jî tesîra wê li ser hunerê jî pir mezin e. Li wela-tê me tenê ji ber ku dengbêj bi kurdî stran dibêje tê girtin û kuştin. Hunermendî, eger bi kurdî be, ji aliyê dagîrkeran ve mîna çalakiyêke polîtîkî tê nîrxandin.

Huner dê tu caran meda xwe nestîne eger ne azad be. Loma huner gereke dereceya yekem bona azadiya xwe li ber xwe bide. Azadiya huner jî bi ya netewê ve girêdayî ye. Lê kêfêrara huner bona azadiyê û jiyaneke bi rûmet bi rizgarbûna welat dawî lê nayê, ew kêfêrateke bê dawî ye. Huner xwederbirîna wijdanê gel e û wijdanê gel bi polîtîka rojane nalive. Polîtîka rojane pîşê siyasatmedaran e, ne yê hunermendan e. ■

## LI AZADIYÊ BIGERE

Li azadiyê bigere  
Azadî bi xwe nayê  
Her tiştên xwe  
li vir bihêle  
Ew te bêmane girê didin  
Dîsa pêrgî dinyayê bibe  
mîna biyaniyekî  
û çavên xwe ji nû ve veke  
Li tirêna pêşî  
ya ku diçe başûr siwar be  
Li tirêna Sîngapor  
Metirse  
Gava tirên bi rê bikeve  
tu ê ji nû ve werî dinyayê

### Sharock Kamyab




**Sharock Kamyab** li Îranê hatiye dinyayê, lê ji mêj ve ye li Swêdê dijî û herweha bi swêdî dinivîsîne. Wî heta niha çend pirtûkên çîrok û şî-îran nivîsandine û ji aliyê rexnegirên swêdiyan ve mîna surealîstekî înternasyonalîst î jîr tete pesinandin.

Me ev şîira wî ya kurt bi destûra wî wergerande kurdî.

# Werger û Wergervanî

L  
Ê  
K  
O  
L  
Î  
N



Derwêş M. Ferho

Werger zêdetir ji hemî demên bihurî di rojê rojê de ye” destpêka lêkolîna *Raymond van den Broeck* e di pirtûka wî ku di sala 1992’an de li Beljîka hatiye weşandin.

Li gora wî divê wergervan di her destpêkê de bizanibe ku wezîfa wî, ji hemî kar û xebata civakî-çandî zêdetir, wî tûştî problêman dike. Ji bo vê sedemê divê ew di gelek waran de xwedî perspektîfeke fereh û dîrokî be. Ne ku her kesê xwedî zanîneke fereh û dîrokî ewê ji her wergervanê din baştir bibe, lê ewê bi wê yekê di xebata xwe de gelekî rehetî bibîne.

Baweriya ku wergerê mimkin nabîne, di nêrîneke kûr de bêaqilî xuya dike. “Çawa meriv dikare bi dijwarî bêje tiştek ne mimkin e ku beşekî mezin ji dîroka Çanda Rojava li ser wî tiştî bingeh stendiye, hemî bîrkirina Rojava pê perwerde bûye.”

“Eger Rûmênan nivîskarên Yewnanî bi rêya wergeran asîmîle nekiribane, wêjeya (edebiyata) wan ti carî nedigihane vê derecê. Eger aqilmendên sedsalên Çardeh-panzdehan alîkarî ji wergeran nestendibana, sentêza bîrkirina xaçparêziya kevn û mîrateya Yewnanî nedigihane armanca dawîn. Bêyî wergerên girîng ji klasîkên dîrokî di dema

ronesans û humanîzmê de, dibe ku wêjeyên neteweyên Ewropî di demeke cahiliya zarokî de bimane. Eger nişana Hironymus ji bo ku nivîsarên Încîlê wergerêne zimanê roja xwe (Latînî), li cem reformîstên sedsala 16'an xwesteka wergerê xurt nekiribana, ewê ziman û wêjeyên elmanî, îngilîzî û holandî qet ti carî negihabana rewşa îro"

Wergervanên çandeyên Rojava di vê çarçewê de xwedî bîr û baweriyekê optimîst bûn: "ew bi xebata xwe bawer bûn." Ji bo vê baweriyê ye jî ku ew di xebata xwe de bi pirranî bi ser ketin. Ev nayê wê gotinê ku wan di xebata xwe de qet problêmên mezin nedîtîn. Bê goman wergervanên mezin jî gelek diwarî dîtine. Lê dîsan wan di daxwaza ku bawerî, wêje û çanda welatê xwe bi berhemên perwerdeyiya xerîb zengîn bikin de, qet neketin şikan. Ew bi fêdeya xebata xwe ya wergerê xwedî baweriyek mezin bûn.

### **Çavnêriyek li dîroka werger û wergervaniya Rojava Zemanê Berê û Sedsalên Navîn**

"Li Rojava li ser dîroka wergervaniyê bêje qet tiştek nayê zanîn. Destpêka wergerên nivîskî li Rojava di dema Roma antîk de dest pê dîke. Di nîveka sedsala 3'an berî Îsa Livius Andronicus Odyssee ya Homerus wergerande Latînî. Ew werger negihaye he-ta roja îro û meriv nizane ew çawa bû." Romayîyan di aliyê çandê de Yewnanî ji xwe mezintir didîtîn û dixwestin bi rêya wergeran ji zengîniya çanda Yewnaniyan fêde bikin. Dema wan dest pê kir zanînen li ser xweda yên Yewnaniyan ji xwe re kirin hebûnek gelerî, pêwîstiya drama Yewnanî

jî, ku bi wê zanîna xweda ve pirr girêdayiye, wergerînin. Naevius û Ennius (nêzî 240 b.Î.) di wî warî de pirr xurt bûn. Herweha bi saya wergeran bû ku Roma ew zanîn û pêşketina mezin ya Yewnaniyan (ziman, filozofî, bijîjkî û zanînen xwezayî-tebîetî) qezancî çanda xwe kirin.

Lê wergerên girîng yên teorîk bi Marcus Tullius Cicero re (106 - 43 b.Î.) dest pê dîkin. Li cem xebata xwe ya mantiq û filozofî xebata wergeran jî dîkir. Wî Protagoras ya Plato, Uconomicon ya Xenophon, axaftînen Aeschines û Demosthenes wergerandin. Di pirtûka bi navê *Optimo Genere Oratorium* de ew li ser vê xebata xwe weha dibêje:

"... Û min ew ne mîna wergervan lê mîna zanyarek, ango fikrên wan û awayê ku wan form da ye xebata xwe weka xwe ma, bi gotinên di nav zimanê me li vira têne bi kar anîn wergerandin. Ji ber vê sedemê min pêwîst nedît wan gotin bi gotin wergerînim. Min stîl û hêza gotina zimanê wan rast kir."

Ji bo Cicero wergerandina ji zimanê Yewnanî tedişbên stîlê bû. "*Ji sedema ku wergervan li ser zimanên din jî dixebitin di zimanê xwe yê zikmakî de bê xurttir dibe.*" Nabê ku wergervan wergerê li ser esasê gotin bi gotinê bike. Werger ew e ku daxwaza nivîsarê di zimanê hedef de bi gotinên xisûsî yê wî zimanî bi temamî bide.

Quintilianus (Institutio oratoria) û Plinius (Epistulae) di rêya Cicero de xebata xwe berdewam kirin.

Di zemanê berê de werger zêdetir ji teoriyê problêmek pratîk bû. Awayê ku filozof Seneca (4 b.Î. - 65 p.Î.) li hember krîtî-



ka li ser wergervaniyê heye derdikeve vê problêmê baş dide xuya kirin. Bi awakî giştî ew dibêje ku “di daxwaza ma’nedana zimanekî de hin gotin, herçend nêzî hev bin jî, bi ma’neyên cihê têne bikaranîn.” Di her halê de di zemanê berê de baweriya cihêbûn di navbera gotin û ma’neya gotinan de, di navbera forma ziman û naveroka ziman de hebû.

Bi vê baweriyê re ji zemanê berê diqulibîne nav sedsalên navîn. Vê baweriyê demeke dirêj di sedsalên navîn de jî dewam kir. Filozof û zanyarê dêrê (kilîsê) Aurelius Augustinus (354 - 430) yek ji wan kesa ye. Ew ji Plato hîn bû ku berberî di navbera wicût û ruh de heye, ji xacparêziyê baweriya ku wicût xirab lê rûh baş e. Ew jî mîna Cicero difikirî ku di wergerê de ne wergera gotinê lê ya ma’neya nivîsarê girîng e.

Eusebius Hironymus (347 - 420), wergervanê xebatên aqilmendên dêra Yewnanî û Încîla Îbrani-Yewnanî, ku di eynî demê de jiyaye di eynî baweriyê de ye. “Di wergerê de wergerandina gotinê weka ku heye berhemeke bê ma’ne ye, tehlûka guherandina naveroka nivîsarê ji eslê xwe dikare wergervan bê rûmet bike.” Baweriya wî ku ya prensîba Cicero bû ev e: “ne gotin bi gotin lê temamiya hevokê (rêz).”

Paş Hironymus ev munaqêşe li ser werger û wergervanan demeke dirêj disekine. Lê dîsa tevgerê wergervaniyê ku peyda bû û ji bo dîroka çanda Rojava gelekî girîng bû. Ji dawiya sedsala heftan û paş re Bexdad navenda rewşenbîriyê bû. Zanayên Ereba gelek ji tekstên ilmî û filozofî ji Hindiya kevn, Farisî û bi awakî pirranî ji Yewnanî diwergerandin. Bi xêra wan wergeran

ew nivîsar ne bes ji bo Ereba baş dibû lê herweha ew ji bo çihana Rojava jî dihatin parastin. Paş re gelek tişt ji bo zimanê Îbrani jî hatin wergerandin. Zanayê Cihû Maimonides (sedsala 12) serkêşê van wergervanan bû.

Di sedsalên Navîn de navendiya duwemîn ya girîng di warê wergervaniyê de bajarê Spanya Toledo bû. Medeniyetên çihana xacparêz, Cihû û Ereba li wira têkelî nav hev dibûn. Di bin serkêşiya Raymond, keşîşê Toledo (1125 - 1151) xebateke wergervaniyê dest pê kir. Ev xebat di dema xwendegha wergervaniyê ya bi navê Alfons de Wijze (Alfonsê Zana 1252 - 1284) de giha dereca xwe ya herî bilind. Di bin berpirsiyariya wî de Spanyoliyan, Îngilîzan, Frensiyan, Îtalyanan, Flamanan û gelek ji neteweyên din nivîsarên ilmî û filozofî ji Ereba diwergerandine Latîni, hin caran Kastiliyanî û Katalanî.

Di sedsalên navîn de gelek werger çêbûn, lê hema hema qet agahdarî ji aliyê teorîk ve nebû. Bawerî ew bû ku xebata wergervaniyê meşgûliyetêke bi qezanc di çarçeweya danûstendinên di navbera çandan de ye. Ango wergera nivîsaran hacetek bû ku meriv wan fahm bike. Di aliyê din de gelek wergervanan wergervanî di baweriyêke ku ji ya îro gelekî cihêtir e bûn. “Nivîskaran gelek ji nivîsarên nivîskarên gelên din diwergerandin zimanê xwe, form û naverok li gora xwe daxwaza xwe diguhertin û bi navê xwe belav dikirin.” Gotina mafê nivîs û nivîskaran di wê demê de tiştekî xerîb bû. Mafê ti kesî nebû ku li esl û fêslê nivîsaran bipirse.

Di navbera 1305 -1308 de Convivo, ber-

hema giranbiha ya zana û helbestvanê bi nav û deng di dema xwe de pêk hat. Ew yek ji wan kesa ye ku di baweriyêke xisûstî de bû. Ango baweriyaya wî ew bû ku ne mimkin e nivîsarek bi eynî ma'ne û nave-rokê ji bo zimanekî din bê wergerandin. Eger meriv nivîsarekê ji zimanekî wergerê-ne zimanekî din û ji zimanê duwemîn eynî nivîsarê wergerêne zimanekî din ev kamba-xî mezintir dibe.

Wergervaniya di sedsalên 15 û 16 de bi tevgera humanîst ya xwedî daxwaza bidest-xistin û hebûna hemî nivîsarên berê yê giranbiha tê xuyayê. Di wê demê de kesekî pirsra fêde û mimkinîyata wergervaniyê ne dikir. Humanîstên mezin mîna Desiderius Erasmus (ji Rotterdam) bi hemdemiyên xwe re di baweriyaya "eger wergervan xwedî zanyariyêke filolojîk (zanyariya zimanan) be ew dikare nivîsaran ji zimanên din wergerîne.

Leonardo Bruni jî (Interpratione Recta, 1420) di wê baweriyêde bû ku ji bo werger-vanekî zanîna esasî û bê şaşî ya her du zi-manan pêwîst e heta ew wergerekê bikare bikê. Ew jî hin çaran ne bes e. Hin kes ji nivîsara ku dixwînin fahm dikin (intelligere), lê wî tiştê ku fahm kirin nikarin bi zi-manê din îfade bikin (explicare). Mîna ku pîrr kes resimekî dikarin bi ma'ne bikin lê ew bi xwe nikarin resiman çê bikin. Ew ji Erasmus jî zêdetir diçû û digot "divê wer-gervan di warê ziman û wêjeya her du zi-manan de aktîf û bi berhem be, ku wergerê-n baş bêne kirin".

Tiştêkî girîng ku meriv bêje jî ew e, jîma-ra xwendevanan di van sedsalan de bi awa-kî xurt zêde bû. Berê kesên li dora dêr û

xendegehan dixwendin. Lê di vê demê de civaka xwendevanan ji her aliyê civakê xu-ya dike. Ev rastî bû sedema ku êdî nivîsa-rên xerîb bi xebata humanîst-ronesans de bi zimanê gel hetin wergerandin.

Joachim du Belay, Fransîz, (Defence et Illustration de la Langue Françoyse, 1549) de baweriyaya xwe li ser werger û wergervani-yê diyar dike. Ew di wê baweriyê de ye ku wergervan qet û qet nikare naverok, form û daxwaza nivîskarê nivîsarê wergerêne zima-nekî din. Lê ew dîsa jî terefdarê wergerê-n nivîsar û xebatê-n zimanê-n cihê ye. Di hember wî de Estienne Dolet, humanîst, wergervan û xwedî çapxane (La maniÈre de bien traduire d'une langue en aultre, 1540) jî bo wergeran pozîtîf diflkire. Ew dibêje ku ji bo wergerê zanîna her du zima-nan pêwîst e, ne wergera gotin bi gotin, ji stendina gotinê-n Yewnanî û Latînî dûrke-tin û wergereke xwezayî (tebîî) jî bo zima-nekî meriv xweş tê bighê. Dema ev tişt pê-ka hatin werger jî bi ser dikeve.

Estienne Pasquier (1529-1615), hiqûqzan, dîrokzan û wergervan bi awayekî din difi-kire. Ew dibêje ku werger ti carî daxwaz û naveroka nivîsarê-n kevn nikarin weka ku heye wergerînin. Sedem jî ew e ku nivîsar berê bi salan hatiye nivîsandin, bîr û bawe-rî, şert û rewş, hevî û hebûn ya wê demê û dema ku daxwaza werger heye ne mîna hev in. Lê wî bi xwe jî fêda wergervaniyê înkâr ne dikir. ■

Agahdarî: \*Pirtûka **Raymond van den Broeck**, profeso-rê beşê wergervaniyê Zanîngeha Antwerpen, "Ji Sînorê Wergeran Dûrtir" bûye kaniyek girîng ji vê nivîsarê re.

## HER GAV

Alî Bîçer

ev çend roj in  
nameya te nayê  
dilê min diguvişê  
ez nabînim  
kesin ku  
pê re rûnim û bipeyivim  
do sibê  
rojnamevanekî din hatiye kuştin  
îşev  
heyv jî dereng ma  
lê belê  
çendek e ez li hêviyê bûm  
dî nav tariyê de  
niha çavê min  
her li derî  
guhê min li dengê lingan  
ê aliyê din ê dîwêr  
ku carina nêzîk dibin  
carina dûr dikevin  
helbet ev bihtengî  
dê weha her û her  
dewam neke  
mîna ku tu dê  
her gav derî vekî  
û bikevî nav xewnên min  
piştî jiyînê

12. Tebax: 93

## GOTINÊN SIRGÛNKIRÎ

Alî Bîçer

porê te zevî, bi demên avî hişinbûyî  
ji nişkê ve berbanga te li min dide  
tahma destên te hê li ser lêvên min  
zimanê kesên ku dibînin, nîn e  
para me dibe bêdengî  
siwarên çaxa navîn, seglavî  
mirinê tînin bajarên mezopotamyayê  
hîn bêtir, hîn bêtir, ez bedena te rakidikêşim ber sînga xwe  
mîna şitileke nazdar tu dibişkivî di laşê min de  
em te dijîn  
çavên me welatê tîrêjan  
gotin sirgûnkirî  
li ber serê miriyên xwe em li evîne difikirin  
stranên şînan ên pîrejinan rûyê me dihûnin

*11. Adar. 94 Ermenek*

Wergera ji tirkî: Mehmed Uzun

# Tirs

## Kekê Xêlit

Ç  
î  
R  
O  
K

**B**erfo digirî. Dengê wê ji eyangê tê. Ji ber ku hûrê para wê hindik bû ew digirî. Hûrî vê carê yê mihan bû. Bavê min tim hûrê dewêr tîne. Diya min pênc cêtiyan dide min, sê cêtiyan jî dide Berfo. Ji ber ku ez kur im, para min zêde ye. Dêya min dibêje “Xwedê jinan bê mêt meke. Pêşiya jinên bê mêt nayê girtinê” Ez kur im. Ez siya serê wan im. Bes ez tirsonek im. Bavê min ji bo min dibêje; “ew li xalê xwe çûye.” Bes bavê min jî ditirse. Evdo dê û maka bavo da ser hevdu, lê wî tu tiştek negot. Bi tenê ricifî, lêvên wî lerizîn û xwîn lê miçiqî.

Berfo hê digirî. Bavo tasa wê kişande ber xwe.

“Divê ew bê cezakin” bi devê tijî cêtiyê hûr got.

“Ii lolo tu ê çi bikî?” dayê got.

“Tu hiş be. Gişt te rû daye vê matoşqê”

“Ii lolo çima dê çi bibe. Zar e, digirî”

“Hiş be matoşqa qîza matoşqa. Tu ji min re qîza na, orispiyan mezin dikî” bavo got û tasa Berfo valayî ser tasa xwe kir.

Dêya min bazda derve. Niha dengê giryê Berfo û yê dêya min yên xeniqî tevlihev dibin.

Em bê girî nabin. Heroj di mala me de girî heye. Em hemû digirîn. Ez bi tenê giryê bavê xwe nabînim. Ez yeqîn dikim dema ew bi şev lihêfê dikişîne ser serê xwe, da ku me bixapîne, di bin siya xurexurê de digirî. Lê tu kes nikare weke Fezîleyê bigirî. Ew bi dengê qalind û xeniqî digiriya û di vevê navberê de fena dareke li ber bê dihejiya jî.

Min û wê, me li hevdu nedikir. Min rojekê dît ku li hinda mirîşka min a melisî rûniştiye û hêkkirina wê dipê.

“Çi ye, tu çima li vir rûniştiyî?” min gotê. Bi rûyekî bişirîn li min nihê-  
rî. Bi dengekî li bergerîn.

“Şemo, qurban Şemo” got.

Min lê vegerand:

“Şemo qurban Şemo” çî ye? Tu ê pê çî bikî?

“Helbet ez ê pê tişteki bikim. Qurban Şemo!”

Ji ber fikra ku kete mejiyê min û biryara ku min da ez gêj bûm, pêş çavên min reşevhatin.

“Nee çima ez nizanîm...”

Eniya wê qurçimî.

“Çi?”

“Tu ê pê kiremê bistînî ne! Tu ê xwe pê bedew bikî, çima ez nizanîm. Dilê te ketiye kurê xwediyê dikanê. Te serê me berjêr kiriye di nav gel de. Em şerm dikin ku em li rûyê xelqê binihêrin.”

Te digot qey dubişkekê lê xistiye, rûyê wê qimitî û ricafekê pê girt. Dema ew ji cîhê xwe vehundirî min jî çilp û bazda. Dengêki seyri tijî xezeb ku zêdetir dişibiya xîrîniyekê ji devê wê derket. Heş ji serê min çûbû, min hew tişteki didît. Tam li kartika stûyê min ket û lingên min ji erdê hatin birîn.

Ji xeweke kûr, bi êş û di nav gotinên şerekî de hişyar bûm.

“... Çêleka çil boxe. Niyeta te ew e ku tu kurê min bikujî ne wisa! Ma-toşqe, hebûna mêran giraniyê bi te dike hi? Bi sî cizî quran kim, ez ê yeke wisa bînim serê te ku tu kesî ne dîtiye ne jî bihîstiye...”

Dengêki bi girî, ku bi îskîniyên ji cergan derdiketin dihat birînê, ew di-ber-sivand.

“...Bike... Min bikujin, min bi dar de bikin. Ez jî nema dixwazin bi-jîm. Bi ehd be, şerd be, ez ê xwe bikujim. Debara min nabe êdî...”

Û Fezîl çû.

Çendekî beriya niha cingene hatin li fêza mala me çadir vegirtin. Dêya min got, “Cingene zarokan direvînin, bi xwe re dibin.”

...Gelo welê ye? Ku min bizanibûya welê nîne, min ê mirîşka xwe ya reş ji Fezîleyê re bişanda. Fezîle çû dûr. Cingene jî ji dûr tîn û diçine dûr. Gelo wan ê ev daxwaza min bi cîh bianiya?

Dema yê Qeyserî û bavê Siltanê hatin mala me, Fezîleyê cilên xwe guhîrandin û ew û Siltan hatin odeyê. Xêlekê sekinî, bavê Siltanê îşaret da keça xwe û derket derve. Dîsa xêlek sekinî bav û keç pevra ketin hundir. Siltanê da ku derkeve derve, îşaret da Fezîleyê, bavê wê jî çû li ba yê Qey-

serî rûnişt. Awirên yê Qeyserî li ser Fezîleyê bûn û ew teqîb dikirin. Dema ew di derî re derket, di kortalên çavên wî de min bi tenê spîkên çavên wî dîtîn. Wî çaxî dilê min bi lez lêxist û bihna min çikiya.

Fezîle û Siltanê li eyangê, li kêleka tendûrê, li piya bûm. Siltan diaxîfî. Fezîle jî noqî ramanên kûr û tarî bûbû.

“...Ev ji bo te şanseki baş e keçê. Bifikir, tu ê herî ser maleke hazir. Mêrik dewlemend e. Bavê min dibêje. Ew hevalên hevdu ne. Ma tu baweriya xwe bi bavê min nayîni?...”

“Heşa... bes.. ewk...”

“Bes çi?”

“Lê zar...”

“Ii la mal avabûyê. Ma tu ji du sêwiyên piçûk ditirsi? Keçê binihêr, daxwaza te ew e ku tu di malê de bextreş bimîni? An çiraniya min tu ji tirkbûna wî ditirsi? Ku mesele ev be ez ê ji te re bibêjim tu bê mêjî yî. Welleh jî, billêh jî. Dê jiyaneke bê kax û bê çeneg bargiraniyê bi te bike ne welê...”

Bi dengê nexweşan axîfî Fezîle.

“Na qîzê. Welleh na, ne wîlo... Lê dûrbûnê çawa be? Qeyser gelekî dûre.”

“Ii la mal avabûye....”

Siltanê bi çokeke mezin dîsa dest pê kir.

Çavên dêya min di kortalan de çûbûn xwarê. Ew fena Fezîleyê di nav bêgaviyeke bêhawe mezin de xeniqî bû.

Bavê min, yê Qeyserî û bavê Siltanê li pêşiyê dimeşyan. Fezîle li dû wan diçû. Li dû Fezîleyê dêya min. Li dû wê Siltanê, li dû Siltanê ez, li dû min Berfo û li dû Berfoyê jî seyê me... Em li dû hev rêz bûbûn. Berfo ji bo Fezîleyê welê bi hewar digiriya ku, te digot qey Fezîle dêya wê ye. Dêya min fena ku tiştê ji bîr kiriye û bi daxwaza bi bîr anîna wî tiştî serê carê li dû xwe dizivirî. Fezîle, serê wê di ber wê de, bê ku bizivire li me binihêre, diçû. Ax, min çiqasî dixwest ku ew li me binihêre... Ew li me binihêre û em di cîhên xwe de ji nişkê ve bibin kevir û welê hişk bê lebat bimînin. Bes wê li me nenihêrî. Em çûn, çûn, çûn...

Di dawiya dawîn de em li cîhên xwe sekinîn û heya ku Fezîle ji menzîla awirên me derket, em wîlo rewstiyayî man. Û heya demekê bê heş mîna pezên gêj, li wê çolê çûn û hatinê.

Fezîle çû...

Siltanê digot ku ew bazinê zêrîn, yê ku Şêx bi ser de xwendibû nînbû-

ya wê Fezîle neçûbûya.

Rojekê li taxa me hate gotinê ku karkerekî Fezîle di Kerxaneyê de ditiye. Dema me ev nûçe bihîst dest û ling li me hemûyan cemidîn. Min dest pê kir ez giriyam. Min welê zar dikir ku dê min jî bavêjin kerxaneyê, hingê min got mêr nakevin kerxaneyê, bi tenê jin dikevin wê.

Ez dîsa giriyam, vêca ji bo Fezîleyê.

Di ser çûyîna Fezîleyê re çendek çû ne çû, rojekê bavê Siltanê hat.

“Beko” got wî ji bavê min re “Ez ê qîza xwe bibim. Heya mêrê wê ji leşkeriyê hat dê li ba min bimîne.”

“Li çima birao?” dêya min got “Çima parî nanê ku ew li ba me bixwe tune? Bûka me namûsa me ye. Dê li ba me bimîne”

Bavê Siltanê, bêî ku li dêya min binihêre bavê min nîşan da.

“Ev kî ye?”

“Çawa ew kî ye!” dêya min got. Çavên wê dilîstin.

“Ez ji te re dibêjim ev kî ye? Çi te ye?”

“Merivê mala me ye” dêya min got.

“Hah, ango mêrê te ye ne wilo. Hingê devê xwe vemeke. Bihêle bila ew biaxife.”

Bavê min diricifî, lêvên wî dilerizîn. Vê ca xwîn yekser lê miçiqî bû.

Te digot qey bavê Siltanê seyekî şivana ye, em jî seyên kolana nin û ji tirsan li ber wî boçikên xwe li ba dikin. Rusasekê bi me giritibû; dest û ling li me sar bûbûn. Şeqşeqa kevirên tizbiya bavê Siltanê bû. Siltanê tevdarika xwe kiribû, bê aram bû. Serê carê di derî re serê xwe dirêjî hundir dikir.

“De bavo. Hê tamam nîne.”

Faynekê sorî tengî zirav li xwe kiribû.

Memikên wê yên gilover ber bi pêş de derketi bûn. Goreyên naylon yên zirav û dirêj pê kiribûn. Di bin goreyan de qîçên wê yên çil spî xuya dikirin. Orispî...

Dêya min got “Siltan jî çû. Ew êdî hew tê.”

Reso leşker e. Haya wî ji tişteki tune. Ew ê tezkereya xwe bistîne û bê. Û wê di malê de Fezîleyê û jina xwe nebîne. Hingê dê bi porê dêya min bigire û dê wê di erdê re bixişîne. Dê jê re bibêje “Dêlika nav malan” He’çiya babê min e, ji sedî sed dê bê kuştinê.

Reso ye her tiştî pêpes bike û dê li ser zikê wî bigere.

Ji lewre ez ditirsim. Ez gelekî ditirsim. Dema ez bi şev dikevim nav nivînan, lihêfê dikişnim ser serê xwe û wê li xwe dipêçim. Vêca xwêdan didim û bêhna min diçike. Hîngê tiliya xwe dikim bin lêva lihêfê, qulikekê çêdikim û di wir re bêhnê didim û distînim. ■



# HÊ DÊRSIM

H. Sefkan


Hîn jî hene  
Xwe nas nakin.  
Ji bîr kirine  
Sêpiyên vegertî  
li kêleka Çemê Mûnzûr.  
Bûkên xwe di çiyayên "Duzgun" de wer dikirin  
"Mîrin çêtir e ji ketina destên guran"  
Digotin û dimirin,  
biskbihineyên me.  
Ji bîr kirin  
Şehîdên zikmakî  
Kindirên di bin riyên spî re hatibûn girêdan  
Dixeniqîn 70 saliyên me.  
Keçên ji guliyên xwe ve hatibûn daliqandin  
Hîn jî hene  
dibêjin  
"em bira ne"  
-Bîrayên guran e-  
Hey Dêrsim...  
Giran giran.  
Stran bi stran.  
Bi ser tariya şevan de meşîyan.  
Ne vegirtin  
sîngên bi pirç,

li hemberî boyan.  
Mîna şûjînan çikiyan di canê me de  
Mîna şûran birîn kir sîngên me  
ji dûr  
Stran bi stran,  
giran giran  
em hatin.  
Mezlûm bi Mezlûm em meşîyan  
Hîn jî hene  
xwe nas nakin dibêjin  
"em bira ne"  
Bi çavên guran dibînin  
Bi guhên wan dibihîzin  
û  
Bi gurî dipeyivin  
Ne bes bin rojên çûyî  
70 salên reş...  
Bela bêhna kizûrî  
Şewata per-perîkên çiyayên te  
Bikeve bêvila wan,  
Belkî bişewite,  
xirt bikin,  
û cihê bibin ji birayên nemerd  
Erê...  
Giran giran  
Stran bi stran  
me nehişt  
Dêrsim bibe Tuncelî

# Yilmaz Guney

(1937-1984)

## II



**Mihemed  
Dehsiwar**

### Di Filimên Yilmaz de Mofîfên Kurdî

Polîs Yilmaz di sala 1968-an de digire û dişîne eskeriyê, Mûşê; cîhê diya wî, welatê bav û kalan. Lê ew li wir jî vala nasekine û karê xwe didomîne. Ew di sala 1969-an de filimê “Gurên Birçî” dikşîne. Di vî filimî de berê xwe di-de jiyana Kurdan û di filim de motîvên kurdî bikar tîne. Lewra jî ev filim ji teref dewletê ve tê qedexekirin. “Seyîtxan”, efsaneya Bedirxan e û “Lawje” jî temamî bi motîvên kurdî hatiye xemilandin. “Hêvî”, perçeyek ji jiyana malbata wî û bi milyonan malbatên Kurd e. “Êş” dijîtî û nakokiyên nav Kurdan tîne ziman û “Kerî” jî rewşa civakî ya Kurdan tîne ber çavan. Navekî filim jî “Şivan û Berîvan” e û navên qaremanên filim jî ev in.

Ew hê di sala 68-an de li jiyana xwe ya berê û li berhemên xwe rexne dike. Dîtinên wî yê kurdîyê di van deman de dest pê dike û êdî piştî van salan Kurdistanê bi nav dike. Lê Yilmaz nasnameya xwe yî Kurdîyê, baştirîn di girtîxaneyan de fêr dibe û li kurdîya xwe xwedî derdikeve. Hesreta wî dibe fêrbûna zimanê kurdî. Xwe hêdî hêdî fêrî kurdî dike û li ser kultur û mûsîka kurdî lêkolîn dike. Bi kur ve dişû, ji devê wî kilam û loriyên kurdî derdikevin. Di sala 1978-an de, di kovara “Güney” de wiha dibêje:

“Min di jiyana xwe ya berê de gelek şaşîtiyan kiriye; ew ji kêmasî û netêrbûna min dihatin. Wê heyamê min nizanîbû çî, bi çî awayî bikira. Lê bi taybetî, Selîmiyeyê hişê

min anî serê min. Çi li vir, çi li Enqereyê û Qeyseriyê li ser ka ez dê ji gelê xwe re çawa bêtir bi fêde bibûma, ketim lêkolînê û min ji xwe re wiha got:

– Her tiştê ku ne li ser bingeha rastiyê be, dê li ber dojecha rastiyê bi mihe û xira bibe!”

Yilmaz, di derheqa avakirina rêxistinên Kurdan û li ser rewşa şoreşgerên Tirk jî wiha digot:

“Ger îro şoreşgerên Kurd dixwazin rêxistinên xwe bi xwe ava bikin, ev ne kêmasî û şaşîtiya wan e, lê ya şoreşgerên Tirk bi xwe ye. Şoreşgerên Tirk, tucaran bawerî nedane Kurdan. Ev jî dide xuyakirin ku proletarya-ya Tirk, di bin tesîra revîzyonîzm, şovenîzm û reformîzmê de ye.” (Guncy - Tebax 1978)

Yilmaz van dîtînen xwe di pêş de hîn ferhtir û ronîtir dike û dibe yek ji wan Kurdên ku Enstîtuya Kurdî li Parîsê dadmezirînin. Yilmaz bêyî ku dijîtiya rêxistinên Kurd bike, ji bo lihevnêzîkbûn û yekîtiya wan karekî bê hempa kir. Wî, beşdarbûn û birêvebirina vî karî, ji xwe re vatîniyeke neteweyî dihesiband. Tevî vê jî tu caran neke- te nîqaşên nav rêxistinên Kurd. Her weke ku em dê di pêş de jî li ser vê pirsê hîn dirêjtir bisekinin, wî beşdarbûna damezrandina dezgeheke wiha giring û meşandina kar û barên wê, ji xwe re wezîfeyê herî pîroz qebûl kir û di pîrsa Kurd û Kurdistanê de bû xwedî perspektîveke vekirî.

“Rê” bi temamî rewş û jiyana Kurdên belengaz, birayetî, pismametî, kuştin û gellaciya cendermeyê Tirk tîne ber çavan. Her wiha di filîm de navê Kurdistanê jî cara ye-

kem tê ser perdeyê û ber çavên temaşevan. Yilmaz bi vî filîmî, Kurdistanê ji Turkiyeyê ji hêla coğrafîk ve jî veqetandibû û xweser kiribû. Ev guhartinên nuh, ne tenê dewleta dagirker, her wiha dostên wî yên herî nêz jî aciz kiribû. Çawa çêdibû qala Kurdistanê dikir? Hem jî di “sînemaya Tirk” de! Bira rewşa “Kurdên bidûvik” bi-anîna ber çav, bira rewşa karkeran bianîna zimên, bira qala komunîstiyê bikirana; lê ev Kurdistan çi bû û ji kur derdiket! Na! Yilmaz êdî xiriftî bû û hatibû leystika “bölücü”yan ! Pîraniya komunîstên Tirk jî dest bi neyartîya Yilmaz kirin û xwestin wî ji ber kurdîtiya wî piçûk bixînin.

Lê Yilmaz ji ya xwe nehat xwarê; pêwîst bû rewşa Kurdan û Kurdistanê bi awayekî bihatina famkirin û çareserkerin. Weke hûnermendekî şoreşger, wezîfeya wî bû rewşa Kurdan bianîna ber çavan û alternatîfên rizgariyê têxistina nîqaşê. Em dê di dawîya nivîsa xwe de werin ser vê pirsê û dîsa derbasî jiyana wî bibin.

Yilmaz di sala 1970-yê de bi keçeke ku bavê wê pîrr maldar bû re dizewice. Fatoş Suleymangîl (Pişt re Fatoş Guncy), şagirtê koleja Amerîkayê bû û rojekê bi teşvîka hevaleke xwe diçe cîhê ku Yilmaz lê filîm dikîne. Herdu hev nas dikin û tevî ku Yilmaz bi temenê xwe ji wê gelek mezintire jî, di nav wan de tîkiliyêke hîssî dest pê dike. Pişt re tevî ku dêûbavê wê nerazîne jî, ew bi hev re dizewicin.

Piştî salekê ji wan re lawek çêdibe, navê wî Yilmaz Guncy<sup>(2)</sup> datînin. Evîndariya wan roj bi roj zêdetir dibe û wê dema ku li cem hev dimînin, bi hev re gelek mesûd di-

jîn. Fatoş di qîzîniya xwe de jî ji keçên hemdemê xwe yên zengîn, burjuva û jixwehezkerî cudatir bû. Piştî ku Yilmaz dinase û bêtir nêzî hev dibin, pîrsa Kurdan û rewşa bîndestî û şerpezetiya wan jî fêr dibe. Ew di demên herî zor de, di rewşên herî xeter de, ji mêrê xwe re dibe desteka herî mezin. Yilmaz jî ji ber piştgirîya jina xwe, ji ber edeb û xanimiya wê, pirr serbilind e.

Mêr û jin, tevî evîn û hesretê jî, zêde hev nabînin. Ji hêlekê ve karê Yilmaz, ji hêla din ve jî heps û zîndanên dewleta Tirk, dibûn sedemên hesreta hevdîtina wan. Yilmaz di girtîxaneyê de, di bin zîndanên kûr de jî, jina xwe tenê nedihîşt; ji wê re her roj name dinivîsand û rê dikir. Nameyên hesret û evîniyê, yên dilsozî û hêviyên pêşerojê; yên bawerî û teseliyê. Wekî din jî, ji bo kurê xwe, çîrokên bi navê “Ji Kurê Min re Çîrok” dinivîsand û ji kovaran re dişiyand da ku bîna çapkirin. Fatoşa bedew û bievîn jî, agirê hesreta xwe piçek be jî, bi van name û çîrokan ditefand.

Piştî zewacê bi du salan, Yilmaz ev car bi tawanbariya endamê THKP-C-yê, ji teref polîs ve tê girtin. Belê Yilmaz alîkarî û piştgirîya Deniz Gezmiş û hevalên wî, Mahîr Çayan û hevalên wî eşkere dikir. Wekî din jî kî biçûna cem wî û alîkarî bixwesta, bi şertê ku li dijî dewleta koledar bûna, Yilmaz alîkariya wan dikir û vê jî venediştart. Lê Yilmaz ne endamê vê Partiyê yan jî partîyeke din bû. Ji xwe Yilmaz di girtîxaneyê de, rexneyên tûj û giran anî ser şaşîti û kêmasiyên van Partiyên û rêberên wan û bi vê jî îspat kir ku ew ne endamê wan bû.

Dadgeha leşkerî ji ber endametî û alîkari-

ya wî ya bi van Partiyên re, heft sal cezayê giran da Yilmaz. Yilmaz di girtîxaneyê leşkerî ya Selîmiyeyê de du sal û sê meh raza. Di vir de serpehatiyên xwe, di pirtûka “Hucreyê Min” de nivîsand û da çapkirin. Piştî du sal û sê mehan, bi efûya 74-an jî hepsê derket. Yilmaz dîsa azad bû lê carekê ketibû deftera dewletê û polisên wê; ew dê wisa bi rehetî rizgar nebûya. Dadgehên leşkerî hê ew di hepsê de bû, ji bo curbecur axaftin û nivîsên wî, jê re nêzî 20 salan ceza dixwest.

## Dîsa Girtîxane

Ne dewleta barbar û koledar û ne jî feleka xayin dev ji Yilmaz bernedidan. Sê meh piştî azadiya xwe, Yilmaz li Yumurtalikê filîmê “Şik” (Endîşç) dikişîne û şevê jî bo filîm dixwaze demançeya xwe biceribîne û têxe kasetê. Lê hakimekî serxweş destûrê nade û pişt re li wan dibe bela.

Hakimê Yumurtalikê Sefa Mutlu, faşistekî serxweş bû û wê şevê li restauranta ku Yilmaz û hevalên xwe lê kêf û şahî dikirin, mêvan bû. Kêfxweşî û eleqeya ku ji Yilmaz re dihat nîşandan, ew gelek aciz dikir û dihefsidand. “Ger ew qralê sînemayê be, ez jî yê Yumurtalikê me” digot û dev diavêt Yilmaz û civata wî. Çaxê Yilmaz li ser nesiheta serokê belediyeya Edeneyê, Ege Bagatur diçe ku destûra çekteqandinê jî hakim bigre; ew hê pirtir hêrs dibe û dîsa dev davêje civata wî. Yilmaz mirovekî ku niheqî û heqaretan qet qebûl nedikir, tevî vê jî deng nabe xwe û dengê xwe nake. Çawa hebe ew serxweş bû û Yilmaz nedixwest xire-cir derkeve.

Karkerên restaurantê hakimê serxweş dibin mala wî, lê ew dîsa vedigere restaurantê û şerê xwe berdewam dike. Dibîne ku deng ji kesî dernakeve, ev car dev diavêje jina Yılmaz, Fatoşê. Yılmaz dikaribû tehemulî gelek tiştan bikira; lê çaxê gotin hatibû ser jin û namûsa wî, hiş li serî nemabû. Ji cîhê xwe radibe, diçe cem hakimê provakator û çend şeqamên xweş lê dixê. Hakim dikeve erdê û dest diavêje demaçeya xwe. Yılmaz dibîne ku ew destê xwe diavêje demaçeya xwe û ew jî demaçeya xwe ji ber xwe dikêşîne. Lê hevalên Yılmaz, bi wî digirin da ku kuştinek çênebe. Lê êdî kin ji kalan derketibû û Yılmaz nikaribû xwe bigirta. Demaçe diteqe û hakimê faşîst, fişkekê di orta çavê xwe de dixwo. Gelek şahid dibêjin ku demaçeya Yılmaz bê hemdê wî, bi şaşîti di nav destan de teqiyabû.

Ji xwe dewleta barbar jî li tişteki wiha digeriya; bi vî awayî dikaribû Yılmaz ji ber kuştina hakimeki dewletê, bêxe zîndanên û wî bi gelê wî bida jibîrkirin. Dewlet bi her hêz û îmkânên xwe ve, berê xwe dide Yılmaz û wî ji ber sûceki "adî" dixê bin çavan. Rojname û medyaya Tirk jî Yılmaz mîna qatileki "adî" pêşkêş dikin. Yılmaz bê mahkeme û bê parastin mehkûm dibe. Piştî ku di sala 1975-an de MC (hukumeta faşîst) tê ser hukim, êrişên dewletê û medyayê pirr xedartir dibin. Bi vî hukûmeta nuh re, şertên girtîxaneyan girantir bûbûn; hakimên faşîst jî bo ku Yılmaz ji malbata wî û dostên wî dûr bixin, ew li curbecur girtîxaneyan didin gerandin..

Piştî du salan, dadgeha Enqereyê "ji bo kuştina hakimê li ser wezîfeyê", 19 sal ceza-

yê giran dide Yılmaz. Yılmaz li ser biryara dadgehê, di dawiya mahkemeyê de, di ber-sîva xwe yî dawîn de wiha dibêje:

– Ez dizanim dadgeha we, vî cezayê ne ji bo bûyera Yumurtalikê û kuştina hakimeki serxweş dide min. Ev dadgeh û cezayê ku hatiye dayîn, siyasî ye! Ev ne neheqiya pêşîn ku li min hatiye kirin û wê ne ya dawîn be jî. Lê bira baş bête zanîn ku dê tekoşîna me berdewam be! Dê tekoşîna me di nav gel de, li serê çîyan û di nav kolanan de, bi teherên nûjen dom bike!

Yılmaz meriveki wisa bû ku di her şertan de, ji heqê xwe derdiket. Jiyana wî ya girtîxaneyan jî pirr tekûz û organîzekirî bû. Wî biavêtina kîjan hepsê, şertê îdareyê hêdî-hêdî diguhirand û li gora dilê xwe û baweriya xwe sererast dikir. Di tevaya girtîxaneyên ku ew lê mabû (Îmralî, Îsparta, Îzmît, Qeyserî, Nevşehîr, Istanbul -Toptaşî û Selîmiye- û Enqere), serokên girtîxaneyan çiqas hişk û li dijî wî bûna jî, mecbûr diman ku xwe li gora wî amade bikin. Cîhê ku ew lê bû; tadeyî û zordarî, mezinahî û piçûkantî li wir ne diman. Jiyana birayetî û wekhevîyê, dibû qanûnên yekem. Timî li cem feqîr û belengazan cîh digirt; piraniya mesrefên hepsiyan, wî bi alîkariya hevalên xwe amade dikir. Çi pere û îmkânên wî hebûna, dixist oxira hepsiyan. Ger pereyên wî tunebûna jî, ji hevalên xwe yê derve alîkarî dixwest.

Zîndanên tirkan, jê re mîna dibistanan bûn; ji bilî organîzekirina girtîxaneyê, tevaya wextê dida xwendin û nivîsandinê. Razana wî, tenê çar-pênc seet bû; weki din bi berbanga sibê re çî rojname û kovar hebû-

na, dixwend û di serê xwe de notan digirt. Piştê wê, bersîva nameyên ku jê re dihatin, dinivîsand. Mehê nêzikî du hezar, carina jî pênc hezar name jê re dihatin. Yilmaz van nameyan tev dixwend û bersîva piraniya van dida. Pişt re bi girtiyan re diket sohbe-tê û dawî jî dest bi nivîsên xwe dikir. Bi xê-ra wî, gelek girtiyên nexwendî, fêrî xwendî-n û nivîsandinê, fêrî xwendina pirtûk û romanên bûn.

Yilmaz ne bi tenê di hundir de dihat hez-kin; li derva jî ji bilî bi milyonan Kurd û Tirk, xwedî dost û hevalên hêja û giranbi-ha bû. Tevaya dost û hevalbendên dewleta Tirk, ji Yilmaz ne xweş bûn û bi her awayî dijminatîya wî dikirin. Faşîst û nîjadperes-tên Tirk, polîs û medyaya Tirk di gel dew-leta xwe, li ber fersenda êrîşên dijwarbûn. Lewma jî Yilmaz li kur dibûna bira bibûna, xwedî demançe bû û çend heb jî parêzge-rên wî li dora wî bûn. Gelek caran jî haya wî ji van parêzgeran tune bû; ew ji derva ve, ji teref dostên wî yên mîna Îdrîsê Kurd ve dihatin şiyandin.

Îdrîsê Kurd (Kurd Îdrîs), mêrxasekî hêja û dostê Yilmaz ê herî nêz bû. Ew bi xwe ji Qersê bû û ji ber feqîrtî û belengaziya xwe hatibû li Stenbolê bicîh bûbû. Ew jî mîna gelek Kurdên Stenbolê, bi hemalîyê dest bi kar dike. Piştî ku der-dora xwe dinase û hi-nek pere dikevin destên wî, qehwexaneyê-kê vedike. Ew ji berê ve zilamekî mêrxas e û ji tu kesan û ji tu tiştan natirse. Li hem-ber neheqî û zordestiyê bê însaf bû û ew jî mîna Yilmaz pîrr bi girûr bû. Bi kurdîtiya xwe serbilind bû û dostê Kurdên ketî û be-lengaz bû. Kîjan Kurd biketina tengasiyê,

alîkariya wî ji xwe re weke qanûn dihesi-band û lewra jî di nav Kurdan de, bi mêr-xasî û camêriya xwe dihat nasîn.

Îdrîsê Kurd pişt re qumarxane vedike û karê xwe pîrr mezin dike. Dû re qulûban vedike û lewra jî dewlet û medyaya Tirk, navê “Mafya” û “Baba” pê ve dikin. Di eslê xwe de “Mafya” û “Baba” yên herî mezin, bi wezîr û serokwezîran re rûdiniştin; xwe-diyê pere, qesir û qonaxan bûn. Dewleta Tirk, general û wezîrên hukûmetê, ji wan re kar dikirin û li ber destên wan mîna xu-laman diçûn û dihatin. Îcar kesên mîna Îd-rîs, li hember neheqî û zordestiyê, xwe û kesên mîna xwe diparastin; nanê xwe û der-dora xwe, ji “devê şêr” bi zor derdixis-tin. “Bavê” feqîr û belengazan bûn. Lewra jî dewletê ji çend mehan carekê û di her cuntaya leşkerî de, ew dixistin zîndanên.

Pêwendiyên Yilmaz û Îdrîsê Kurd, pîrr xweş bûn. Mîna birayên hev, li hev miqate bûn û hev di parastin. Îdrîs rewşa Yilmaz baş dizanibû; ji bo ku belayeke “kor” neyê serê wî, ew bi kur ve biçûya, ji bo parastina wî, çend zilamên xwe dida dû wî. Bi vê hiş-yarî û dilsoziya xwe Îdrîs, Yilmaz ji gelek xeterên mezin û rewşên xerab filitandiyê. Ji nav cemaeta Îdrîsê Kurd, mirovên bi nav û deng ên mîna Dundar Kiliç, Guven Şengil, Yusuf Koç, Ehmedê Kurd, Îskender Çolak û gelek kesên din jî dostên Yilmaz bûn.

## Yilmaz li Parîsê

Yilmaz Guney di 12-yê Çiriya Pêşîn, sala 1981-an de derbasî giraveke Yewnan dibe. Ji wir bi alîkariya dost û hevalên xwe, derbasî Swîsrayê dibe; lê hukûmeta Swîsrayê ji ber

têkiliyên aborî yê bi Turkiyeyê re, serlêdana wî ya siyasî qebûl nake. Ji wir derbasî Frensayê dibe û li wir dibe penaberê siyasî.

Piştî ku derdikeve Ewrûpayê, pirr digere; ew bi kur ve diçe, mîna qiralan tê himêzkirin û hezkirin. Serokên dewletên herî mezin, wî weke mêvanekî herî giring qebûl dikin û dibin mazûrvanên Yilmaz. Serokkomarê Frensayê Mitterand, ji bo wî bixêrhatineke mezin amade dike û bi hatina wî, kêfxweşiya xwe diyar dike. Bi sedhezaran Kurdên li Ewrûpayê, bi derketina wî, bi dîtin û guhdarîkirina wî kêfxweş dibin. Ewrûpa, bi hatina wî, mîna stêrekê geş dibe.

Lê bi derketina wî re, dewleta Tirk jî ketibû rewşeke ecêb û gelek xerab. Mahkemeyên wî, hîn ew li welêt bû berdewam dikirin û dadgehên Tirk ji bo wî zêdeyî sed salan cezayên giran dihat xwestin. Piştî ku ew derkete dervayî welêt, dadgehên leşkerî bi lez û bez pêşî zêdeyî 20 salan ceza dane wî û pişt re jî ew ji hevvelatîyê avêtin. Di ser de jî ji dewleta Frensayê daxwaza paşvedana Yilmaz dikirin. Piştî ku ew daxwaz nehat qebûl kirin, hukûmeta Tirk, hukûmetên Frensa û Yewnan bi du nameyan protesto kir.

Ji hêla din ve jî medya û rojnameyên Tirk êrîşan dibirin ser Yilmaz. Piştî ku filîmê "Rê" di sala 1982-an de li Cannesê xelata zêr girt, ew êrîş û xêrnexwazî hîn zêdetir bûn. Li gorî wan Yilmaz êdî "leystika dijminên dewleta Tirk bû" û eşkere ketibû sefa "bölücü" û "teröristan". Tevî vê jî cunteya leşkerî, bi derketina wî re, ji "komünistekî kürççi" xilas bûbû. Êdî Yilmaz Guneyê "kürççi" û "komünist" nikaribû zêde zerarê

bide dewletê. Tevî vê baweriyê jî, dewleta Tirk, ferman dabû medyayê da ku Yilmaz "piçûk" bixînin û li dijî wî kampanyayeke mezin li dar xin.

Ya rastî, Yilmaz ne dixwest ji welêt derkeve. Cihê wî, di nav gelê wî de bû û hîn gelek karên wî nivçe mabûn. Piştî ku cuntaya faşîst hatibû ser hukim, rewşa wî û siheta wî roj bi roj xerabtir, dawayên li ser wî roj bi roj zêdetir û girantir bûbûn. Her axaftin û nivîsa wî, filîmên wî yê berê û yê ku nuh dihatin amadekirin, dibûn sedemê mahkemeyên nuh. Bê şik Yilmaz baş dizanibû ger ku cezayê xwe tewa jî bike, dewletê ew ji zîndanê bernedida. Wekî din jî, di zîndanên dewletê de nexweşiyeka kanserê. Li Turkiyeyê jî dermanê wî tune bû û çareserkirina vê nexweşîyê bê îmkân bû. Lewma jî biryar da ku ji bo demeke kin derkeve dervayî welêt. Bi vî awayî de hem nexweşiya xwe derman bikira û hem jî piştî ku rewşa welêt biguhirîya, vejeriya welêt; axa bav û kalan.

Yilmaz li vir jî vala nasekine; ew ji hêlekê ve projeyên filîmên nuh amade dike, ji hêla din ve jî di bin baskê Enstîtuya Kurd de, ji bo Kurdistanê û yekîtiya Kurdan xebat dike. Lê hesreta welêt, her tim di dilê wî de cihê yekem digre. Piştî filîmê "Dîwar", nexweşîna wî girantir dibe; kanser xwe roj bi roj li hundirê wî digerîne û ew ji taqetê dixê. Tevî vê nexweşîna xwe ya giran jî, hazirîya projeya xwe ya herî mezin; hazirîya filîmê li ser dîrok û rewşa îroyîn a Kurdistanê dike.

Çi mixabin piştî 1984-an pirr ji taqetê dikeve û piraniya wextê xwe, li nexweşxane-



yên veşartî derbas dike. Ew ji mirinê qet natirse û bi ber mirinê nakeve; lê bi ber wê dikeve ku dê nikaribe projeya xwe ya herî giring û mezin biserxîne.

Egît û mêrxasê Kurd, kelema çavê dewleta Tirk, mêrê mêrxasan Yilmaz Guney, di 9-ê Îlona sala 1984-an de, li nexweşxaneyê Parîsê, ya navneteweyî, çavên xwe yî delal digire û me di xemgîniyeke kûr de dihêle. Li ser wesiyeta wî, cenazeyê wî li Enstîtuya Kurd a Parîsê amadeyî ziyareta mêvanan dibê. Çar roj şûnde, di roja 13-yê Îlonê de, cenazeyê wî ji Enstîtuya Kurdî dibin goristana Komuna Parîsê ku bi sedan kesên bi nav û deng li wirê hatine veşartin. Di pey cenaze de bi deh hezaran Kurd û ji curbecur neteweyan beşdar, xemgîniya xwe diyar kirin û Yilmaz bi oxira dawî ve şiyandin.

Êdî ew ne di nav me de bû; ew li dervayî welêt û ji gelê xwe dûr, mîna kevokeke macir ji nav me qetiya bû. Lawê Kurd, hunermend hêja û dostê mirovantiyê, dostê dostê xwe û dijminê dijmin, bi riya Enstîtuya Kurdî re ji hemû gelên bindest û belengaz re vê mesajê şiyandibû: "Rastî neynika mirov e, tu car ji rastiye neyên xwarê! Ger di vê de serê we jî biçê!"

Yilmaz tenê 47 sal jiya. Ji van, wî 11 sal di zîndan û girtîxaneyan de, du sal eskeriya tirkana a mecbûrî, şeş meh li nefiyê û sê salên dawîn jî li dervayî welêt derbas kir. Tevî vê jî di van salên kin de bi sedan berhemên hêja amade kir. Hejmara tevaya filîmên ku ew tê de leyistiye, senaryoyên wan nivîseye û rejîsoriya wan kiriye 113 ne. Pênc romanên wî bi navê "Ew Stûxarî Mirin", "Salpa", "Sanik" (Tawanbar), "Hucreya

Min", "Cam Pencere" û "Em Du Nanan Dixwazin" hatine çapkirin. Wekî din jî pî-tûkeke wî ya çîrokana bi navê "Ji Kurê Min re Çîrok" hatiye çapkirin û li ser dîtînên wî yê siyasî gelek nivîs û meqaleyên wî, di kovar û rojnameyan de hatine çapkirin.

Jiyana Yilmaz bi xwe weke romanekê ye; mîna şerîda filîmekî berhemdar e û gelek dewlemend e. Meriv naxwaze dev ji xwendin û temaşekirina wê berde. Li ser jiyana wî û dîtînên wî gelek nivîs, pirtûk û filîmên dokumenter derketine. Gelek ji wan xwestine Yilmaz bikin Tirk û berhemên wî têxin xîzmeta Tirkana û kultura tirkî. Hinekan jî xwestine ku Yilmaz, ji dewleta Tirk re "kedî" bikin û ji lewra jî dîtîn û baweriyên wî, bi teherêkî çewt dane pêşkêşkirin.

Herî dostekî wî yê nêz Nihat Behramê şaîr û nivîskar, serpêhatiyên xwe yê bi Yilmaz re, fîrot rojnameya "Milliyet" ê û heqaret û nebûkariyên mezin bi Yilmaz kir. Gelek nivîskarên çep û demokrat (?), xwestin bi nivîs û dîtînên xwe yê nîjadperest, Yilmaz "kedî" bikin û wî bikin perçeyek ji çepîtiya Tirkana û di gel vê yê dewleta Tirk. Hinekan xwestin tenê hêla wî ya sînemayê û hunermendiya wî bibînin û kurdîtiya wî bidin jibîrkirin. Hinekan jî xwestin wî tenê mîna komunîstekî pêşkêş bikin.

Ji hêleke din de dewleta Tirk û medyaya paşverû û nîjadperest, êrîşên mezin birin ser Yilmaz. Hem dewleta Tirk û nîjadperestên Tirk û hem jî sosyalîst, ronakbîr û demokratên (?) Tirk, mîna piraniya caran, li hember Yilmaz jî bûbûn yek qor û berê xwe bi dijarî dabûn wî. Dîtina wan a herî hevbeş ew bû ku Yilmaz piştî derketibû

Ewrûpayê, hatibû leystika Kurdên “bölücü” û bûbû “maşeya” wan. Li gorî ronakbîr û demokratên (?) Tirk, pêwîst nedikir ku Yilmaz vî aliyê xwe derxistina holê û hêla xwe ya hunermendiyê têxe binê siya kurdîtiyê. Ev dîtîna ji îddîa ji bilî şaşîti û nîjadperestiyê, du serî bû û nakokiyêke mezin himbêz dikir. Ji hêlekê ve Yilmaz bûbû “xayin”, ji hêla din ve jî hunermendekî Tirk bû. Li gorî wan bira Yilmaz Kurd bûna, lê pêwîst bû ku wî hêza xwe bida ser hunermendiyê, ne ser kurdîtiyê.

Eşkere ye ku Tevgera Kurd jî Yilmaz baş fêm nekiriye yan jî giring nedîtiye ku li ser wî binivîse û ji ber vê jî meydanê ji nîjadperestên Tirk re vala hiştiye. Ji hêla Tevgera Kurd ve xwedîlênerderketina Yilmaz, bûye ku êrişên mezin hatine ser Yilmaz û ew bi salan mîna “çepê tirkî” hatiye nasîn û pêşkêşkirin.

Îcar Yilmaz bi xwe ji salên 70-yî û vir ve, ji bo rizgarî û serxwebûna Kurdan kar û xebat kiriye. Li gorî wî heta ku Kurd serbixwe nebûna, yekîtiya Turkiye û Kurdistanê bêmane û ne di cîh de bû. Ev dîtîna baweriyên wî, di gelek gotar û nivîsên wî de, bi gelek wesîleyan hatine ziman û nivîsîn.

Yilmaz di şertên Turkiyeyê de, li gora qanûnên dewletê nikarîbû Kurd û Kurdistanê êskere bîne zimên. Her çiqas di gelek filîm û nivîsarên xwe de tema û motîvên Kurd bikar anîbe jî, giranî -mîna pîraniya rêxistinên Kurd- daye zimanê “ezop” ê. Tevî vê jî gelek filîm û nivîsên wî, ne tenê ji bo “komunîzmê”, lê bi taybetî ji bo kurdîtiyê hatine qedexekirin û di derheqê wan

de bi sedan dawê hatine vekirin. Weke ku me li jorê jî got, di filîmên wî de motîfên kurdî bi her awayî û bê tirs hatine bikaranîn. Çaxê ew derket dervayî welêt, di bikaranîna terma Kurdistanê de li Ewrûpayê qedexetî tune bû û Yilmaz jî di her wesîleyê de vê termê bikar anî. Ev derbasî filîmên wî jî bû.

### Axafina wî ya dawî

Yilmaz ne mirovekî cahil û nezan bû. Ger meriv li jiyana wî û berhemên wî binêre, harmoniyêke xweş tê ber çavên meriv. Ew ji destpêkê heta dawî Kurd bû, giraniya xebata wî li ser rewşa Kurdan bû û weke mêrxas û lehengekî Kurd ji nav me çetiya. Wî evîn û hesreta xwe, dîtîna û baweriyên xwe yê di derheqê Kurd û Kurdistanê de, çend meh berî mirina xwe, di Newroza sala 1984-an de li Parîsê wiha digot:

*“Hevalên hêja, dostên min, mêvanên giranbûha... Hûn bi xêr hatin cejna Kurdan!*

*Weke hûn dizanin, Newroz sembola berxwedana gelê Kurd a li hember zilm û zordariyê, sembola berxwedan û serhildanê ye. Ez dizanim ku dilê tevaya beşdarên vê cejnê, bi vê maneyê lêdixe. Dê dilên zarokên we jî li hember zilm û koledariyê, ji bo azadî û serxwebûnê lê bixe. Heta îro, ji bo van armancan gelek qurban hatine dayîn û dê hê jî bînin dayîn. Em dizanin ku serkeftin, bê qurban nayê girtin. Divê ku em xwîn û girînê bidin ber çavên xwe.*

*Em dipîrsin: Gelo kê dikare vî dilê hewçend bi rik û bi biryar, bêdeng bike? Êş, sitembarî, xizantî, xwîn û rindikên çavan, ne qedera gelê Kurd e. Em vê qedere nas nakin!*

Em naxwazin bibin zarokên welatekî ku ji her çar aliyên ve hatiye dagirkirin; em dixwazin bibin zarokên welatê Kurd ê serbixwe, demokrat û yekbûyî, bibin zarokên Kurdistanê!

Em dixwazin dinyaya xwe, axa xwe bi destên xwe çêbikin û wê ji nuh ve ava bikin. Em dixwazin li welatê xwe, di bin alaya xwe de azad û serbixwe bijîn!

Em ji bîr nakin ku menfaetê gelên Kurd, Tirk, Erebe û Eceman di damezrandina welatên bihêz de ye. Lê em dîsa dizanin ku ger yekîtiya gelan ne bi dil be û ev şert neyên amadekirin, ev yekîtiyê xeyal e!

Îro armanca wan kesên ku li çaralîyên Kurdistanê, li ser çiyê, di deşt û kolanên de, di zîndanên faşîstan de li hember dagirkeran şer dikin û dimirin jî ev e. Em silavên xwe yê germ pêşkêşî wan dikin. Ew şehîdên ku di vê rê de şehîd dibin, wê tim di dilê me de bin. Çi serbilindî û bextewariye ku ew di riya serhildan û berxwedanê de bûn meşaleyên agirê serxwebûnê.

.....  
Hevalino! Enstîtu, tovê serxwebûnê û berhema tekoşîna neteweyê Kurd e. Hê pirtir pêşkeftin û bihêzbûna wê, bi xebata we ve girêdayî ye. Em dê li li dora wê bicivin û ji bo ku di riya daye ber xwe de biser keve, li gora qeweta xwe piştgiriya wê bikin.

Em dê zanibin ku tekoşîna serxwebûnê, pîrhêl e. Carina du rêzên ku rastiyê tînin zimên, dîtinek an jî awaza straneke ku dilê gel bilind dike, carina jî mizraba ku li tîla tembûrê dixê, ji bombeya atomê bi tesîrtir e.

Ji ber vê jî divê em di her aliyên jiyana de şerkerên serkeftî bin û wan bigihîjînin. Divê

em tembûra xwe baş lêxin, stranên pîrr baş bistrên. Divê em çîrokên baş, zîrên hêja û romanên xurt binivîsin. Divê em zanyarên xurt, diplomat û teknîsyenên baş perwerde bikin. Divê destên me hem pênuşê û makîneyan û hem jî çekan baş bigirin. Divê carina tembûra me bibe çek û çeka me jî bibe tembûr. Em baş dizanin ger em stranên herî baş û peyvên herî rast, di cîhê wê de bikarbînin, ew dê bibin mîna fîşekan.

Çiyayên me, deşt û daristanên me li hêviya me ne. Em naxwazin tevaya temenê xwe li xerîbiyê, jiyana xwe bi kilamên xerîbiyê derbas bikin. Gelê me, bi mîrxasiya xwe, destanan daye nivîsandin û bi ezm û hêza xwe, dikare hemû astengî û zorîyên li pêşiya xwe jî ortê rake.

Şoresger û demokratên Tirk, Ecem û Erebe bi parastina ku neteweyê Kurd çarenûsa xwe bi destê xwe tayin bike, perçeyek jî tekoşîna me ye. Biratiya kedkarên bindest, çekeke ji ya me yî herî bi qewet e.

Bira dost û dijmin baş bizanibin ku em dê biser kevin... Bê şik bi ser kevin! Mirina weke şervanekî azadiyê, ji jiyana koletiyê pîrr bi rûmettir e!

Bijî Kurdistanê serbixwe, demokrat û yekbûyî!

Bijî Enstîtuya Kurdî! "

Ev gotinên wî yê dawî bûn ku di civateke wiha mezin de diyar dikir. Dîtinên Yilmaz di vir de pîrr vekirî û eşkere ne. Serxwebûn û azadiya neteweyê Kurd, mîna pîraniya Kurdan, daxwaza wî bû jî. Hem filîmê "Rê" û hem jî axaftinên wî yê li Ewropayê, şiqameke mezin li şovenîst û nîjadperestên Tirk dixê û her wiha bersîveke gi-

ring dide Kurdên ku di derheqa wî de keti-  
bûn şikê û bi salan xwe jê bi dûr xistibûn. Ev  
her wiha dokumaneke dîrokî ye ku tu şik di  
mêrxasî, egîdî û kurdîtiya wî de nahêle.

Yılmaz namire û dê nemire. Ew dê her tim  
dilê gelê Kurd, di dilê welatperwerên Kurd  
de bijî. 11 sal jî, 111 sal jî di ser aljiyanbûna wî  
de derbas bibe, ew dê mîna Melayê Cezîrî,  
Ehmedê Xanê, Cegerxwîn, Şêx Seîdê Pîran,  
Seyid Riza, Îhsan Nûrî, Xalid Begê Cibran,  
Qadî Mihemed, Mistefa Barzanî û bi heza-  
ran şehîdên Kurd, di dilê neteweyê Kurd de  
bijî. Dê filîm û berhemên wî, dîtîna û tekoşî-  
na wî bi hezaran sal li ber çavê gelê Kurd, di  
mejûyê gelê Kurd de bijîn! ■

\* Mahpus Yılmaz Güney (Girtî Yılmaz Güney) Hasan Kı-  
yafet

\* Kürt Gözüyle Yılmaz Güney (Bi çavên Kurd Yılmaz Gü-  
ney) Mahmut Baksî

\* Kovarên Güney; 7,8,9

\* Romanên Yılmaz. (Boynu Bükük Öldüler, Salpa, Sanık,  
Hücrem, Cam Pencere, İki Ekmek İstiyoruz, Oğluma hika-  
yeler)

\* Filimên Yılmaz (Hêvî, Kerî, Baba, Rê, Dîwar û hwd.)

\* Nivîsên Yılmaz ên ku di kovar û rojnameyên curbecur de  
hatine nivîsin.

\* Filimê dokumenter ê ku di televizyona A-TV de hatibû  
weşandin.

\* Nivîsa Nihat Behram a ku di rojnameya "Milliyet" ê de  
derketibû.

### Çavkanî:


\* Yılmaz Güney Efsanesi (Efsaneyaya Yılmaz Güney), Ahmet  
Kahraman

\* İnsan Yılmaz Güney (Mirov Yılmaz Güney) M. Şeymus  
Güzel

# Cîhana "YÊ MEKSÎKÎ"

Şefik Kaya

Derengê şevê bû. Wextê razanê ji zû ve hatibû. Hejmara kovara Nûdemê ya 12'an di dest min de û di odeya razanê de ez û xewa xwe li hevdu li mahneyan digerin. Lê tev vê jî min dixwest ku ez çavêki biavîjim sernivîsaran û paşê xwe di bin lihêfê xim û razêm. Di destpêkê de armanca min ne ew bû, ku ez wê şevê dev ji xewa xwe berdim û wê bixwînim. Ez rûpel bi rûpel di nav re çûm. Armanca min bi tenê temaşekirin bû, lê ne xwendin bû. Ez gihîştim rûpelê heftêyî. Di vî rûpelî de, wêneyek ku dirûvê sofîyan dida, hebû. Min hebekî bala xwe da rî û simbêlên wî, bê ka yên wî jî mîna rî û simbêlên sofîyên me, ji duxana çixare û qelûnê zer bûne, yan na. Beriya ku ez di nava rî û simbêlan de wenda bûbûma, min xatir ji sofî jî xwest û ez derbasî rûpelê din bûm. Çavên min bi



"YÊ MEKSÎKÎ" ketin. Min hinek jê xwend, da ez fêm bikim, bê çi ye. Lê, wisan xuya bû ku dilê yê Yê Meksîkî tunebû ku min rehet berde. Masûlkên laşê min wek kurka li avê xistî, bêhêz mabûn û alaya berxwedanê ji zû ve daxistibûn. Min hinekî din jî xwend; ev kovar bû mîna qanîkek benîştê cûtî û bi destên min ve zeliqî. Min kir û nekir, xwe jê xelas nekir. Ez dudilî bûm. Ez

li ber masûlkên xwe geriyam, da ku min jê xelas bikin. Lê masûlkan bi min re dostanî nekirin. Di dema ku herî ji min re lazim bûn de, ez bi tiki tenê hiştim. Ez "di navbera Xelîl û Celîl de mam". Ez xwe nêzî Yê Meksîkî dikim, hinekî jê dixwînim, xewa min direve, ez bi xewê re dibişirim, xwe nêzî wê dikim, Yê Meksîkî awiran dide min, madê xwe dike û dixeyide. Ez ji Yê Meksîkî eciz bûm, min got: "Tu çi mirovekî bêsebir î, ma tu nikarî heta sibehê îdare bikî? Tu bi kerema xwe bela xwe ji min veke. Ma tu nabînî ku ez westiyayî me?". Lê di vê maweyê de, min çend paragrafên din jî xwendibûn. Hêvî ew bû, ku ez vî camêrê nenas bêxeyd qayil bikim û bi vî awayî xewa xwe ji nava lepên wî xelas bikim. Ez û Yê Meksîkî di ber hevdu de didin; Kurdîstaniyê me bi lez hate alîkariya yê bi-

yanî. Herduyan bi hevdû re wê xewa xweş û şêrîn vecinî-qandin, tirsandin û heribandin. Haya min jê nema, bê ka min çawan çaya xwe hazir kiriye. Rewş û hevaltiya wan di da nişandan ku berê haya wan herduyan ji hevdû hebû. Kurdîstaniyê me rahiştibû çekên Yê Meksîkî û xwe dabû pêş. Ez nizanim, bê yê ku wê şevê serê min xiste nava vê belayê, Yê Meksîkî bû, yan Kurdîstaniyê bû. Lê ez bi xwe, şikê ji yê Kurdîstaniyê dikim. Kurdîstaniyê ez kiribûm mîna siya yê Meksîkî. Yê Meksîkî çû kur, ez li pey bûm. Min bala xwe dayê, ku bi dizî nabe; “dewxwestin û kasikveşartin nabe”. Ji ber vê, min xwe eşkere kir û ez gihîştim wî. Em êdî bûbûn hevalên hevdû. Armanca wî bûbû ya min jî. Ez jî bûbûm alîgirê benda wî. Xewa min ya jar heribî bû, çûbû.

Min di dilê xwe de got:

“Hevwelatiyo, ma wek te ye? Tu xelkê ji xewa wan dikî û tu bi xwe, belkî di xewna xwe de, li ser ewran difirî”.

Yê Meksîkî, bala xwe dayê ku ew bi kur ve diçe, ez jî bi wî re me. Lênihêrî ku çare tune, ji ber vê yekê, dest pê kir û armanca xwe ji min re got. Camêr xwediyê armanceke pîroz bû.

Lê, madê wî yê tîrş û mirûzê wî yê tim kirî, ez di tirsan-

dim. Xebata wî ya ji bo armanceke pîroz, mad û mirûzê wî bi min xweş kiribû. Wê armancê ez jî tima kiribûm. Ez pê re çûm gelek deveran, ketim her belayên wî. Bêdengêkî di nava xwe de mezin û ji bo armanceke bilind têkoşîn dikir. Bêwestan bû û tim dixebitî. Ferman bêdudilî, bi bawerî bi cîh dianî.

Yê Kurdîstaniyê ez pê re şandim karên cuda cuda. Min jî nema dizanibû bê ez bi ku ve diçim. Min carekê dit ku tew ez di nava benan de û li rînga bokşê me. Ez bi wî re ketime her belayê. Peşgîra wî di destê min de, min xwêdana eniya wî paqij dikir; serkeftina wî ya min bû. Ew serkeftin bû destpêka guhertina dîrokekê ku yê Kurdîstaniyê jî şirikê wî bû. Kurdîstaniyê, bi hêza hunera xwe, ez şandim cîhana Yê Meksîkî. Yê Meksîkî jî ez qonax bi qonax li şoreşa Kurdîstaniyê gerandim.

Yê Kurdîstaniyê, ez şandim cîhana “Yê Meksîkî”, cîhana xem û xeyalan; cîhana bi hêviyê hilmîştî...

Bazara guhastina bîr û bawerî, hest û vîyanên kevin bi yê nuh, bazara guhastina tîrşê bi bizavê... Cîhana têkoşîn, xebat, mirovperwerî, bizav û bêdengiyê... Cîhanek li dijî cîhana tîrş û xofê; xwînmijî talanbiriye... Baweriya ji bo jiya-

neke mirovî. Ew cîhana ku qedrekî bilind dide jiyane, da ku ademîzade bi dilxweşî, bê tîrş, di aşiyana xwe de bijî.

Kurdîstaniyê me li hespekî boz siwar bûye, xurcezîna xwe ji zanîn û hunermendiyê dagirtiye; pênuşa xwe wek zilfeqar daye destê xwe, bi bizava rewşenbîrekî kurdîstaniyê berê xwe daye wê cîhana nenas û bi kubariya şervanekî hunerê, bi serkeftinê jê vegeyriyaye. Deriyê cîhanekê nenas ji me re vekiriyê, hicrikan bi rengê dîwana mîr xemilandiye û quncikên tarî ronahî kiriye. Ew bi reng û motîfên wî hatine neqîşandin; rê û rêçik hatine vekirin. Wî kevir û sitirî ji rê dane alî; heval, hogir, hevrê û hevvelatiyên xwe difermîne vê cîhanê. Wek neqşebendekî kal, xwe ji neqşê xwe dûr dike û lê temaşê dike.

Min navê Yê Meksîkî bihîstibû. Lê ya rastî, ev cîhan ji min re biyan bû. Min bi tenê nav û navnîşana vê cîhanê dizanibû. Çi bû, bi saya yê Kurdîstaniyê bû, wî em bi hevdû dane nas kirin. Gera min a li cîhana Yê Meksîkî bi saya serê Kurdîstaniyê me bû. Wî em bi hevdû dane nas kirin û dû re hêdî, hêdî xwe ji me bi dûr ve xist û em bi tenê hiştin. Hevwelatiyê min, di vê rêwingiya ku ez bi kêf û xweşî jê vegeyriyam de, ez bi tenê hişti-

bûm. Ez û yekî nenas hêdî, hêdî dibûne dost. Lê biryara vê hevalî û dostaniya me, ne min û ne jî Yê Meksîkî dabû; ferman, fermana Kurdîstaniyê me bû. Wî kir ku ez bidim pey vî rêberê bi tenê; yê ku hîn bawerî nedabû heval û hevriyên xwe; yê ku hevriyên wî hîn ew li ser textê biqediran nedabûne rûniştandin. Lê hêdî hêdî, gav bi gav ber bi textê mêrxasan ve diçû.

Wî ez birim dîwana mirovperweran, li civatên mêrxasan gerand, em çûn cem serokên gelperwer. Em bûn mêvanê kesên ku amade bûn ji bo jiyana xwe bikin goriya jiyana kesên nenas. Rewşa wan, bîr û baweriyên mirov xurttir dikirin. Hevalbendî û hevretîya min û ya Yê Meksîkî qewitir dibû. Dema min wî di wê têkoşînê de, bi tenê dît, ez jî bi hemû hêza xwe ve bêhtir bûme hevalbendê wî û min jî xwe da tengala vî dilê bi evîne ve hilmiştî.

Ew yekî bê hest, wek ferşê binê deryayê sarî cemîdî û bi xof xuya dikir. Vê rewşê jî ez diûrsandim. Lê gava wî deriyê dilê xwe ji min re da alî û ez li cîhana wî ya hundurîn geriyam, ez li tabloyeke ku di ruyê wî de tu carî nedihat dîtin rast hatim.

Min ew di nivê rê de nehişt.

Mirov digot qey Kurdîsta-

niyê me derketiye seyda kevo-kan, dahfika xwe daniye; hev-welatîyên xwe bêçare dihêle, xwençeyên rêwingiya cîhana Yê Meksîkî digerland, da ku gelek kes biçin, li wê cîhanê bigerin. Wî ew huner ji kur anîbû û bi keda çend salan bi dest xistibû, ez nizamim. Lê ez dizanim ku ew kilît, ew huner ji gelek kesan re lazim e. Gelek kes dixwazin deriyê xizneyên nevekirî vekin. Hunera ku mîna fanosêkê di destê te de ye ronahiya xwe dide dorhêlê. Hêvî ew e ku ronahiya fanosa te geştir bibe!

Ez hêvîdar im ku ev berhe-ma te, dê ne wek tayê bi tiki tenê bimîne, tu ê vê xebata ji bo çand û zimanê me her û her berdewam bikî; di pêşerojê de deriyê gelek cîhanên din jî li me vekî.

Bêşik ev rewşenbîriya nivîs-karên Kurd mirov dilşad dike, hêvî û baweriyeye xurt dide mirov. Xebatên weha hêja dê wê tirs û xofa li ser pêşeroja zimanê Kurdî kêmîtir bikin.

Tiştê girîng ew e, ku nivîsar ji zimanê orjînal bêne wergerandin. Wê çaxê dê kêmasî kêmîtir bibin. Ez hêvî dikim ku tu dê xwe ji îro û pê ve li ser wergerên ji zimanên orjînal konsantre bikî û bi vî awayî kêmasiyên di vî warî de serî hil didin, kêmîtir bikî. Lê tev vê jî divê ez li xwe mukur bêm

ku ev hunermendiya te, ev pisporiya te ya di warê bi Kurdîkirina nivîsaran de, hêjayî pesinandinê ye.

Min Yê Meksîkî bi tu zimanên din nexwediye. Kurdiya wî ewqas bi ta'm e ku demekê ez lê ketim şikê bê gelo bi rastî werger e, an raste rast bi Kurdî hatiye nivîsandin.

Ji nivîsarê weha xuya dibe ku, J. London hest, bîr, bawerî û ramanên Yê Meksîkî bi hunermendiyeke bilind aniye zimên. Mustafa Aydoğan, te bi xwe jî bi ev dinyaya hundurîn a yê Meksîkî bi Kurdiyeke xweş û şêrîn pêşkêş kiriye. Bi min weha xweş hat ku min got; qey neqşebendê vê dîmenê ne yekî biyanî ye, lê Kurdek e.

Her paragrafa ku min dixwend, ez mecbûrî xwendina paragrafa pey xwe dikirim. Meksîkiyê ku cara pêşîn di nava rûpelên kovara NÛDEMê de haubû ziyareta min û dû re bi Johnnyê Xwêdana Eniyê û bi Zaroka Şevê re di formê pirtûkeke delal -ku di nava weşanên Nûdemê de hatiye weşandin-, xwe li min girtibû, bi hêza pêhlewaneke ez li dû xwe kişandim û ez weha bawer im ku hejmara xwendevanên ku bikaribe li dû wî neçe, dê pîrr kêmbê. ■

# Cîhana Weşanan

## BÎRA QEDERÊ

Li berga dawî ya romana Mehmed Uzun, Bira Qederê, ku ji aliyê Weşanên Avestayê ve hatiye weşandin, ev danasîn cih girîtiye: Roman ji şanzdeh fotografan pêk tê, piştî mirinê êdî fotograf dipeyivin. Fotografên Celadet, malbata Bedirxaniyan. Stembol destpêka sedsalê, seraya Osmanî, pira Galata, herdu şerên cîhanê, rojên surgunê li welatê xerîbiyê, Xoybûn, li bajarê Şamê Hawara kurdî çend di-men in ji romanê.

Bira Qederê bi form û teknîka xwe, avakirin û naveroka xwe di romana kurdî de radeyeke nû ye"

## SÎPAN Û JÎNÊ

Ev pirtûk ji aliyê Konê Reş ve hatiye nivîsandin. Bi naveroka xwe helbestên zarokan e, bi formeke piçûk hatiye amadekirin, tê de yazdeh beş hene û 55 rûpel e. Navnîşaneke diyar ji li ser tune ye.

## YÊN PERÎŞAN

Ev roman ji aliyê Azad Bavê Şahîn ve hatiye nivîsandin. Bi temamiya xwe 153 rûpel e û navnîşaneke diyar ji li ser tune ye.

## HELBESTA HEVÇERX

### YA KURDÎ, BERG III

Amadekarê pirtûkê Xelîl Du-hokî, hin nimûne ji helbestvanên Kurd ên ku bi kurmançî dinivîsinin wergirtine û mijara wan bi vê pirtûkê raxistiyê holê. Tê de navê 59 helbestvanan, her yekê helbestek û wêneyê wan cih girtine. Bi temamiya 202 rûpel e û di 1995'an de li Swêdê hatiye çapkirin, li ser navnîşaneke diyar ji tune ye.

## DÊRSÎM

Pirtûk ji aliyê Adil Duran ve wek destan (helbest) hatiye nivîsandin û ji aliyê *Weşanên Çanda Nûjen* ve li Swêdê di 1996'an de hatiye çapkirin. Di pirtûkê de çend wêne ji hene û bi temamiya xwe 105 rûpel e.

Navnîşan: Tensta Alle 43/2 tr. 16364 Spånga/Stockholm.

## EVÎNDAR

Pirtûk ji aliyê Loqman Polat ve hatiye nivîsandin. Tê de 17 serpêhatî hene û bi temamiya xwe 100 rûpel e. Herweha ji aliyê *Weşanên Çanda Nûjen* ve li Swêdê di 1996'an de ji hatiye çapkirin.

Navnîşan: Tensta Alle 43/2 tr. 16364 Spånga/Stockholm.

## PILINDIR

Ev pirtûka rengeçîrok ji aliyê Pîr Rustemî ve hatiye nivîsandin, tê de 11 beş hene, bi temamiya 95 rûpel e û navnîşaneke diyar ji li ser tune ye.

## DAXWAZNAME

Ev pirtûka helbestan ji aliyê seydayê M. Ahmed Namî ve hatiye nivîsandin. Tê de 23 beş hene, bi temamiya xwe 93 rûpel e û li serê navnîşaneke diyar ji tune.

## ÇÎRÛSKÊN XEWNEKE BAZDAYÎ

Ev pirtûka Helbest-2, ji aliyê Tengezarê Marînî ve hatiye nivîsandin û tê de 25 beş hene, bi temamiya 79 rûpel e û navnîşaneke diyar li ser tune ye.

## KILÎT

Ev pirtûka Helbestan ji aliyê Tengezarê Marînî ve hatiye nivîsandin û tê de 24 beşên babetçihê cih girtine. Bi temamiya 53 rûpel e û di nav weşanên Kovara Zanîn/Sûriye-Qamîşlo de derketiye.



## DENGÊ CEGERXWÎN

Vekolîn û serhevdevanê pirtûkê Bavê Zozan, pirtûka xwe bi şan û pîroztiya mamostê Cegerxwîn ve xemilandiye û hin helbestên wî tê de weşandine. Li ser rûyê pirtûkê wêneyê Cegerxwîn jî cih girtiye. Pirtûk bi temamiya xwe 53 rûpel e, di nav weşanên *Gurzek Gul-1* de derketiye û navnîşaneke diyar li ser tuneye.

## XWÎNA KEWAN û SIWA-RÊ REWREWKÊ

Ev pirtûka helbestên babetcihê ji aliyê Royarê Amedî ve hatiye nivîsandin. Tê de 17 beş hene, bi temamî 53 rûpel e, portreyekî Yilman Guney jî digel kevoka aştiyê li ser rûyê wê cih girtine û navnîşaneke diyar li ser tuneye.

## CIVATA KULÎLKAN

Ev pirtûk bi naveroka xwe "Şano + Helbest" e ku ji aliyê M. Hemo û X. Remo ve ji bo zarûkan hatiye nivîsandin û stiranên tê de ji aliyê Arif Silêman ve hatine notekirin. Derhênana hunerî ji aliyê Hesso ve û bergê pêşî ji aliyê Reşad Yûsif ve hatine çêkirin.

Ev *diyarîya zarokan* bi temamiya xwe 48 rûpel e, tê de 10 beş hene û li serê navnîşan nehatiye nivîsandin.

## PELATÎNK

Ev pirtûk ji aliyê Hans Christiaan Anders ve bi zimanê danî-

markî hatiye nivîsandin û Rojan Hazim jî wergerandiye kurdî. Li ser rûyê pirtûkê wêneyê pîrpirokekê û li rûpela pêncan jî yê nivîskar cih girtine.

Pirtûk bi temamiya xwe 84 rûpel e, di paşiya wê de ferhengokê jî cih girtiye û ji aliyê Weşanxaneya Xanî & Bateyî ve hatiye çapkirin.

Postboks: 39, 2660 Brøndby Strand, Danmark.

## Günlük Notlar Celadet Ali Bedirhan 1922-1925

Ev pirtûka ku notên rojane yê Celadet Bedir-Xan pêşkêşî me dike, ji aliyê Malmîsanîj ve hatiye amadekirin.

Ev pirtûka 73 rûpelî, çendî ku bi gewdê xwe sivik e, lê giranbihatiya wê ev e ku rewşa mir Celadet bi tarixan diyar dike ku wî çî şerperzî û tuneyî diti-ne! Bêguman hêja ye ku em tev wê bixwînin.

Navnîşan: Hyppingeplan 21, 2 tr, 163 62 Spånga/Stockholm.

## BABLO NERUDAY'LA SÖYLEŞİ

Ev pirtûka helbestên bi zimanê tirkî, ji aliyê Aytekin Karaçoban ve hatiye nivîsandin û ji aliyê weşanxaneya Mezopotamyayê ve jî li Elmanyayê çap bûye. Pirtûk 99 rûpel e û wek pirs û bersiv hatiye honandin.

Box: 4036, S-141 04 Huddin-

ge, Stockholm/Sweden.

## DESTÊ MIN LI DESTÊ TE DIGERE

Ev pirtûka helbestan ji aliyê Mehmet Tannikulu ve hatiye nivîsandin û ji aliyê weşanxaneya Mezopotamyayê ve jî li Elmanyayê çap bûye. Di pirtûkê de 56 helbest hene, bi temamî 82 rûpel e û li ser rûyê wê wêneyê destekî ku li destan digere jî cih girtiye.

Box: 4036, S-141 04 Huddinge, Stockholm/Sweden.

## ÇÎROKÊN HELBIJARTÎ

Ev pirtûk pêşî bi zimanê tirkî ji aliyê Aziz Nesîn ve hatiye nivîsandin û Keça Kurd jî ew wergerandiye zimanê kurdî. Pirtûk 102 rûpel e, navê Lubnanê li serê cih girtiye, lê navnîşana wê ne diyar e.


## MADA-ZERDEŞT

Ev pirtûka kurteçîrokên ji aliyê Bavê Helebçe ve hatiye nivîsandin, tê de yazdeh beş hene û bi temamî 78 rûpel e. Devera çapkirinê ne diyar e û li ser navnîşan jî tuneye.

## BERF FEDÎ DIKE

Berf Fedî dike berhevoekeke şîran e ku ji aliyê Kemal Burkay ve hatiye nivîsandin û di nava Weşanên Deng ve hatiye weşandin. Tema şûrên Burkay azadî, serbestî, jîyan û evîn e. Pirtûk 120 rûpelan pêk hatiye.

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



**G**er hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê.

Ji bo Swêd salek 190 Sek, welatên din 50 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

---

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiye ji we re bişînin.

Xorto wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştê de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirî-car, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtî, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye.

*Celadet Alî Bedir-Xan*